



kurtejiyana helbestvanan bi amadekirina
Mihemed Jiyana

Sala 2012 di nav Weşanxaneyê Dîwanê de li Stembolê hatiye çapkirin.

Ziman, edalet, evîn û geşbînî

“Zimanê min yê dilsoz, min xizmeta te kiriye, bi şevan kûpên rengîn danîne ber te da ku di veşartgeha dilê min de bimînin kaj û kulî û sûsk... Tu welatê min bûyî ji ber ku min ti welatên din tine bûn.”

Helbesta destpêkê ya vê berhevoka me ya helbestên cîhanê bi van gotinan dest pê dike. Nivîskarê wê, Czesław Miłoszê polonî, zimanê xwe wek tek war û welatê xwe dibîne. Qedera wî ne ji ya gelek kurdînivîsan cuda ye: bi salan bêwar û aware dûrî welat û welatîyên xwe, ji hevzimanên xwe veqetandî lê dîsa jî bi zimanê xwe ve girêdayî.

Felekê heman tişt aniye serê vebijêr û wergêrê van helbestan jî: hê heftsalê bûm dema ku sala 1988ê ji warê babûkalên xwe hatim dûrxistin û niha li welatekî dijîm ku kesên bi kurmancî bixwînin ên li vê derê heyî dikarin bi tiliyên du destan werin hejmartin. Lê dîsa jî ev ziman tek rist û ben e ku min bi war û welatê min ve girê dide. Yan jî ya rasttir: tek war û welat e ku min heye.

Dil dike ku li cihê dirêjkirina pêşgotinê, hê jî rê bidim Miłosz: *“Ji ber ku tu zimanê kesên serşor î, zimanê bêhişan î, zimanê gelê ku belkî ji gelên din zêdetir ji xwe nefret dike, zimanê casûsan î, zimanê kesên ji bêgunehiya xwe nexweş, zimanê har û hêçan.”*

Dikim-nakim nikarim bi temamî bêşik bim ku ew behsa zimanê xwe polonî dike û ne behsa kurdî dike. Bi rastî ev gotinên wî zêdetir xîtabî kurdiya bêxwedî û kurdên bextreş dikin.

Lê ne tenê zimanê min hewceyî min e. Ez bi xwe jî bê wî nikarim bijîm. Dîsa ravekerê hestên min yên kûr Miłosz bila kerem bike: *“Zimanê min yê dilsoz, ma kî dizane, belkî qeder ew be ku ez im yê ku bikare te biparêze. Loma tasan li ber te rêz dikim, tasên bi rengên geş û zelal ji ber ku di nav hejariyê de pêwîstî bi aheng û bedewiyê heye.”*

Lê ev berhevok, berevajî gilî û gazine herdemî yên me kurdan, ne tenê bi kul û kovanan dagirtiye. Dîsa jî Miłosz nahêle em ji bîr bikin: *“Hey tu, yê ku te neheqî li mirovekî sade kir... hest pê neke ku tu bi ewlehî dijî. Ji bîra helbestvanî naçe... Bo te çêtir e spêdeyê sar ya zivistanê û werîsekî bi çeqekî darê yê çemiyayî ve.”*

Ziman û edalet du mijarên bingehîn in lê ji wan jî giringtir evîn û geşbînî ne. Peyamberên van yên pêşîn di vê berhevokê de Xelîl Cibranê libnanî û Violeta Parraya şîlî ne. Cibran kerem dike: *“Ji hev hez bikin lê evînê bo xwe nekin bend. Bila evîn deryayêke pêldar be di navbera beravên giyanê we de.”*

Û Parra difermo: *“Spas bo jiyanê, wê gelek da min. Du çira dan min, pê ronahî û tarîtiyê ji hev ferq dikim, esmanê bilind û banê wî yê stêrdar dibînim, pê ji nav koma mirovan li mêrê bi dilê xwe digirim.”*

* * *

Mebesta vê antolojiya helbestên cîhanê ew e ku piralîtiya hunera helbestan bi 200 nimûneyan pêşkêşî xwendevanên kurdî bike. Heta ji min hatiye min hewl daye ku nivîskarên ji neteweyên cuda, ji serdemên cihê û yên bi stîl û şêwazên ciyawaz dinivîsin bînim ba hev. Loma di nav helbestan de hin yên nûjen, hin kevnar, hin ji mezinan û hin jî ji xort û ciwanan re ne lê mezin jî dikarin wan bixwînin û pê şa bibin.

Helbestên ku bi inglîzî, erebî, farisî, fînî û soranî hatine nivîsîn, yekser anku dîrek ji wan zimanan hatine wergerandin. Yên fransî û almanî ji inglîzî hatine wergerandin, lê ji ber ku têra xwe ji wan zimanan fêhm dikim, min çapên wan yên orijînal jî li ber çavan girtine. Helbestên ji zimanên din li ber du wergeran - yên inglîzî û yên fînî - hatine wergerandin. Tenê eger nakokî di navbera çapên inglîzî û fînî de tine be, min ew wergerandine. Loma şaşiyên mihtemel dê ne binasên (xetayên, sûcên) çapên inglîzî û fînî lê li ser berpirsiyariya min bi xwe bin. Di nivîseke ku di berhevoka çîrokan, ya ku dê hevdem li gel vê berhevoka helbestan were weşandin de, bi dirêjahî behsa prensîpên xwe yên wergerandinê dikim.

Bi ti awayî idia nakim ku ev berhevoka 200-rûpelî bikare bi piralî hemû berhemên hêja yên wêjeya cîhanê bi xwendevanan bide nasîn. Lê armanca vê têkoşînê ew bûye ku deriyên fireh li ber wergerandina kurdî veke. Ev helbest tenê çend nimûne ne daku em bibînin ku em dikarin bi wergerê çawa xwe bigihînin berhemên hêja.

Hêvîdar im ku xwendevan me ji dîtî, pêşniyar û rexneyên xwe bêpar nehêlin.

Wergêr

Czesław Miłosz 1911 – 2004 Polonya

Di 30ê Hezîrana 1911an li Şetainiai Lîtwiya tê dinyayê. Yek ji helbestvanên Polonî bû. Di sala 1980ê de bû xwedîyê Xelata Nobelê ya wêjeyê. Ji malbateke naskirî bûye û zaroktiya xwe li YKSSê ya berê derbas kiriye. Perwerdeya wêje û dadnasiyê ditiye. Tevlî Şerê cîhanî yê II. bûye û piştî têkçûna dagirkeriya sazûmaniya Nazî, wekî dîplomat xebitiye. Di sala 1950ê de nakokî di navbera wî û rêvebiriya Polonya de derdikevin û ew direve Fransayê, serî li mafê penaberiyê dide. Sala 1960ê li zankoya California dersê dide û sala 1970ê de hemwelatiya DYAyê werdigire. Ew herçendî li derveyî Polonyayê hatibû jiyane û temenê wî piranî li derve diborî jî, nivîsarên xwe bi polonî dinivîsand. 14ê Tebaxê 2004an li Krakowie Polonya miriye. Ji çilê zêdetir berhem afirandine.

Tu tiştî naxwazim

Rojek xweş e,
mij spêdê hê zû vereviye,
li nav baxçê xwe xebitîme.
Çûkan kêlîkekê
xwe li ser çeqan ragirt.

Li vê dinyayê tu tişt nîne
ku bixwazim yê min be.
Hesûdiyê bi tu kesî nabim.
Min hemî xirabî ji bîr kirine.
Ji vê ramanê jî şerm nakim: her yê berê me.
Tu jan leş û canê min naêşînin.
Piştî xwe rast dikim û deryayê û kelekan dibînim.

- **spêdê: sibê, serê sibê, siharê, berbangê**

Zimanê min ê dilsoz

Zimanê min yê dilsoz, min xizmeta te kiriye, bi şevan kûpên rengîn danîne ber te da ku di veşartgeha dilê min de bimînin kaj û kulî û sûsk.

Wiha çendî çend salan dom kir. Tu welatê min bûyî ji ber ku min tu welatên din tunebûn.

Min bawer dikir ku tu navbeynkar bî, min bi mirovên qenc ve girêbidî tevî ku eger ew tenê bîst yan deh kes bin yan ew hê ji dayika xwe nebûbin jî.

Niha dipejirînim ku jê biguman im. Car hene hest pê dikim ku min jiyana xwe bi vî tiştê pûç ve borandiye.

Ji ber ku tu zimanê kesên serşorr î, zimanê bêhişan î, zimanê gelê ku belkî ji gelên din zêdetir ji xwe nefret dike, zimanê casûsan î, zimanê kesên ji bêgunehiya xwe nexweş, zimanê har û hêçan.

Lê ma ez bê te çi me? Tenê zanyarek li dûr ji biyanistanê, xelatkiriye netirs yê ku nayê serşorkirin.

Belê, ma kî me bê te?

Fîlozofek wek her kesî.

Tê digihim, tîm perwerdekirin; taca takekesiyê ji min tê standin. Pesnê Mezin berrikek sor li ber gunehkarê sincî belav dike û fanosa efsûnî di heman demê de wêneyên jana mirovanî û yezdanî li ser perdeyê dinexşînin.

Zimanê min yê dilsoz, ma kî dizane, belkî qeder ew be ku ez im yê ku bikare te biparêze.

Loma tasan li ber te rêz dikim, tasên bi rengên geş û zelal ji ber ku di nav hejariyê de pêwistî bi aheng û bedewiyê heye.

Yê ku neheqî kir

Hey tu, yê ku te neheqî li mirovekî sade kir,
bi xedreya ku li wî bû kenîyî,
te komek qeşmeran li xwe civand
da ku qencî û xerabiyê tevlihev bikî.

Eger hemî bejna xwe li ber te bitewînin,
navê qencî û hişmendiye bi te ve bikin,
medalyeyên zêrîn bo rûmeta te lê bidin
bextiyar ji hindê ku rojekê jiyane,

hest pê neke ku tu bi ewlehî dijî.
Ji bîra helbestvanî naçe. Dikarî wî bikujî
– yek din dê peyda bibe,
gotin û kirin dê bîn nivîsîn.

Bo te çêtir in spêdeyek sar ya zivistanê
û werîsek bi çeqek darê yê çemiyayî ve.

Xelîl Cîbran 1883 – 1931 Libnan, DYA

Li nav darên serwiyê li Bişarêya Libnanê hat dinyayê. Wî li wir dest bi xwendekariya xwe kir lê di 12 saliya xwe de - sala 1895an - koçî Bostona Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê kir. Di 14 saliya xwe de ew bi tenê vegerî Libnanê da ku xwendekariya xwe li Medreset el-Hikmetê kuta bike. Li wir zimanê spehî yê helbestên wî ku tê de çanda Erebî û bandora rojavayî digihin hev, teşe da. Wî du caran li Parîsê nîgarkêşî xwend, dû re vegerî Bostonê û paşî çû New Yorkê û ta mirina xwe li wir ma. 20 salê jiyana xwe ya dawî li Emerîkayê derbas kir û li wir dest bi nivîsîna Ingîlîzî kir. Fîlozofê emerîkî yê eslê xwe ji Lûbnanê nivîskarê ceribandin û romanê. Helbestvan û wênasaz Xelîl Cibran di 10ê Nîsana sala 1931ê de mir. Ji dehan zêdetir berhemên wî yê edebî û felsefî hene.

Evînê bo xwe nekin bend

Ji hev hez bikin lê evînê bo xwe nekin bend.
Bila evîn deryayek pêldar be di navbera beravên giyanê we de.
Piyaleyên hev dagirin lê ne tenê ji amanekê vexwin.
Nanê xwe li hev parve bikin lê ne tenê ji nanekî bixwin.
Li gel hev bistrin û bireqisin lê bila her yek ji we serbixwe be
tam wek têlên ûdê jî serbixwe ne lê bi hev re heman awazê dijenîn.
Dilê xwe bidin hev lê xwe nekin xwediyên dilê hev
ji ber ku tenê jiyan dikare dilan dagir bike.
Li gel hev rawestin lê ne zêde nêzî hev:
stûnên peristgehan jî bi navber in
û berrû û selwî jî di nav hev re şên nabin.

Violeta Parra 1917–1967 Şîfî

Di 14ê Çiriya Pêşîn a 1917an de li bajarokê *San Carlosa* ê bi ser eyaleta Chillán ku li başûrê Şîliyê dikeve hatiye dinyayê. Strana wê ya **Gracias a la vida** li dinyayê tê zanîn. Bavê wê mamosteyê muzîkê bû. Ji diya xwe ya ku pevre li gîtarê dixistin stranên gelêrî yê Şîliyê guhdarî kirine. Parra di zaroktiya xwe de bi heşt xwişk û birayên xwe re li kenariyan di nav xizaniyê de jiyane. Birînen kûr ên di rûyê wê de derdikevin ji nexweşiya xuriyê ne. Parra di nehsaliya xwe de hîni gîtarê û stranên dibe û dema dibe diwazdeh salî stranên xwe beste dike. Li mektebeke dewletê ya li Santiagoyê perwerdehiya mamostetiyê dibîne. Di van wextan de *bolero*, *corrido* û *tonadayan* beste dike û li bar, reqsxaneyên biçûk û sîrkan derdikeve ser dikê. Di sala 1952an de bi *Luis Cereceda* re dizewice. Du zarokên bi navê Isabel û Angel tîne dinyayê û xebatên xwe yê muzîkê bi piranî di gel wan pêk tîne. Di 5 Sibata 1967an de jî dimire.

Spas bo jiyanê

Spas bo jiyanê, wê gelek da min.
Du çira dan min,
pê ronahî û tarîtiyê ji hev ferq dikim,
esmanê bilind û banê wî yê stêrdar dibînim,
pê ji nav koma mirovan li mêrê bi dilê xwe digerim.

Spas bo jiyanê, wê gelek da min.
Wê robarek fireh yê bihîstinê diyarî min kir,
bi şev û roj stran, awazên firindeyan,
gurme-gurmê, teqereqê, dijûnan,
şeprepa baranê û gazyên nerm
dimêje xwe.

Spas bo jiyanê, wê gelek da min.
Wê deng û dirûvên tîpan arasteyî min kirin,
bi hev re dibin peyv û bi zelalî
navê dayikê û yê birayî dibêjin
û ronahiyê didin rêya ku
bi tenê pê ve dimeşim.

Spas bo jiyanê, wê gelek da min.
Piyên ku pê rêyên westîner meşim
di nav bajaran re, di ber birkan re,
di nav deşt û çolan, çiya û avzêman re,
di ber mala te re, di nav baxçeyê te re.

Spas bo jiyanê, wê gelek da min.
Wê dilek diyarî min kir ku ji keyfan lê dide
dema ku geşbûna hunera mirovan dibînim,
dema ku qencî û reseniyê ji xerabiyê ferq dikim,
dema ku li zelaliya kûrahiya çavên te dinêrim.

Spas bo jiyanê, wê gelek da min.
Bi kenekî xelat kirim û girî jî da rex.
Wisa ji hev ferq dikim xem û xweşiyê,
kûrahiya binê her stranê,
wê strana hevbeş ya ku ez jî distrim.

Spas bo jiyanê, wê gelek da min!

Charles Baudelaire 1821 – 1867 Fransa

Di 9ê Adara 1821an de li Parîsê hatiye dinyayê. Rexnegîr û yek ji helbestvanên mezin yê Fransî, avakerê helbesta nûjen e. Hîn di salên lîseyê helbestên wî bala dorê dikşînin. Dest bi xwendina hiqûqê dike lê hîn 19 salî bûye ji bo ku dest ji wêjeyê berde û jê sar bibe malbata wî, wî didin keştiyek bazirganiyê û diçe Hindistanê.

Piştî vedigere Parîsê di rojnemeyan de dixebite, di sala 1845an de hewldana xwekuştinê dike lê bi sernakeve; demekê bi siyasetê dixebite, navê wî di nav amadekarê Şoreşa 1848an de jî derbas dibe. Di vê navberê de rexne û gotarên li ser hunerê diweşîne.

Helbestên Edgar Allen Poe wedigerîne Fransî û bi vî hawî jî wî bi Fransiyayê re cara yekem dide naskirin. Li jiyana beradayî ya Parîsê nexweşîya frengiyê pê digre û dibe kêşê efiyon û esrarê. Du salan li Belçîkayê maye. Piştî vegeherê felç bûye û piştî di 31ê Tebaxa 1867an de li Parîsê jiyana xwe ji dest daye. Baudelaire, bandorek mezin li ser helbestvanên nûjen kiriye. Sê berhemên wî hene.

Koç

Niha, Mirin, kaptana pîr, ankor hilîne!
Ev dever bêsebr e, werîsan vepiçîne!
Ger reş be wek teniyê rengê esman û deryayê,
ji dilên me - wan dinasî - ronahî diherike!
Niha jehra xwe darijîne da ku xurtiyê bide!
Niha vîna me ye - agir mejiyan dişewitîne wiha -
em kûr danoqîn - ferq nake - biheştê yan dogehê,
em li nûyatiyan digerin, berev kûratiyên Nenasistanê!

Xerîb

- Herî zêde ji çi hez dikî, xerîbo? Ji bavê xwe, diya xwe, xwişk xwe yan birayê xwe.
- Min ne bav, ne dê, ne xwişk û ne jî bira heye.
- Ji heval û hogiran?
- Wateya wan peyvan ta îro ji min re nenas maye.
- Ji welatê xwe?
- Nizanim ew li ku ye.
- Ji spehîtiyê?
- Min dixwest ji wê hez bikim, ji wê xwedaya nemir.
- Ji zêr?
- Ji zêr nefret dikim wek tu ji Xwedê nefret dikî.
- De tu ji çi hez dikî, xerîbo?
- Ji ewran hez dikim... ewrên diborin... li wê dera han li dûr... dûr... ewrên ecêb!

Min bi şeydayî ji çavên te vexwar

Kolan bi qerebalixa xwe min mest dike
dema ku zeriyeke reşgirêdayî ya narîn û dirêj
di ber min re borî – destek delal
danga wê hildigirt dema ku dimeşî

bi nazenînî, bi berzî, bi lingên peykelvanî nîgarkirî.
Min bi şeydayî ji çavên wê vexwar
nermiyek sihrewî, şadiyek kujer,
tîrojên çavên wê bahozek di min rakir.

Bîskeke vejenî... şev tarî bû!
Delal revoke, bi çavên te ji nû vejîyam
lê diyar e ta mirinê te dîsa nabînim!
Em ê ji hev dûr bin, çavên me dê bi hev nekevin,
ne ez dizanim ka tu bi ku ve leziyayî,
ne tu dizanî li ku li te digirim.

- dang: daw, berdang, beşa jêrîn ya kiras

Bide rê!

Oy Mirinê, pîre-kapitanê, de keştiya xwe bide rê!
Ev dever derdgiran e, lengerê rake!
Ger çi erd û esman wek qîrê reş in,
dilê me yê dostê te gurr û geş e.

Jehra xwe birêje dilê, mirinê, pê xurt bike!
Agir mejî dişewitîne. Me divê ku xwe
biavêjin kendên nenas yên ecêb
– ferq nake ku bihişt be yan jî dojeh!

* Mirinê: şair di helbesta xwe de mirin kiriye wek kesekî loma navê bi herfeke girek (M) dest pê dike.

Sofokles 496 – 406 bz Yewnan

Berî zayinê di sala 495an de hatiye dinyayê. Di gel Eshilos û Evripides yek ji sê nivîskarên trajedyayê yê Yewnana Antîk e. Li gorî Aristophanes 130, li gorî Suda jî 123 lîstik nivîsandine. Di pêşbaziya dramayê ya di Festîvala Dionisosê de nivîskarê ku herî zêde xelat girtine (24 heb). Lê di roja me de tenê heft jê di destê me de mane. Navê berhemên mewcûd ên di destê me de hene ev in: Arias, Antigone, Trachiniae, Elektra, Kral Oedipus û Filokletes. Berhema Kral Oedipus berhema sereke ya Sofokles tê qebûlîkirin. Berî zayinê di sala 406an de miriye.

Mirov jêhatî ne

Dinya derek e ecêb e,
ji ecêbiyan mezintirîn jî mirov e.
Di nav deryaya hilfûrî re,
li ber pûk û bahozên zivistanê
ew dibeze, hema bi zor
ji pêlên dêwane difilite.
Bi hespan, bi gasinan
ew dijî Gayayê
– wê xwedaya destpêk û dawiyê,
wê xwedaya bêwestan û bêrawestan –
li ber xwe dide,
her salê çar demsalan tê dikoşe.

Peyva wî, ramanên wî jî
wek agirî lezgîn in,
dinya û cîhan jîngeh û jêdestên wî ne,
dijî êriş û pelamarên xwedayên seqayê
wî ban û xanî ava kirine.
Tişteke nîne ku mirov
bi jîriya xwe serdestiya wî neke.
Tenê bo mirinê tu çareyan nabîne
lê dermanê derdên kujek jî peyde dike.

*dijî dijî êriş pelamarên: “û”yek jê kêmbû, lê zêdekirin

Horatius 65 – 8 bz Yewnan

Berî zayinê di 8ê Çileyê Pêşîn ê 65an de hatiye dinyayê. Di heyama Augustus te şairê herî girîng ê Romanê bû. Horatius li navçeyeke biçûk ya bi navê Venuisa bûye. Ji bavekî ku kole bû lê piştî gihîştîye azadiya xwe bûye, belê ew azad welidiye. Bavê wî di karên muzayedê de dixebitî. Horatius jî wekî cotkarekî feqîr lê birûmet behs dikir ji bavê xwe. Bavê wî hemî perên xwe li perwerdehiya Horatius xerc kiribû. Pêşî ew şande Romayê, piştî jî bo Yewnanî û felsefê hîn bibe ew şane Atînayê. Şair hurmeta xwe ya ji bo bavê xwe di helbestên xwe de jî diyar kir. Piştî mirina Sezar Horatis tevî artêşê bû û ji bo Brutus beşdarî şerê Philippi bû. Brutus şer wînda kir û piştî şer Horatius dibêje ku min zirxê xwe hêla û reviyam. Piştî ku Augustus ji dijberên xwe efûya giştî îlan kir vegehiya Îtalya. Di vê vegehiyê de bavê wî miribû û bi gotina Horatius xizanî mabû jê re. Lê dema ku bi helbestên xwe bal kişand, ji hêla xezîna dewletê ve hatiye destekkirin û ji bo hunerê xwe yê helbestê bidomîne şertên guncan hatine amadekirin. Di 27ê Çiriya Paşîn a 8ê berî zayinê de jî miriye.

Bo Postumusî

Ax, dem dibore, Postumus, Postumus,
bi baskan difirin sal û dem,
karê mirina bêwijdan ranaweste,
dest ji pîr û ciwanan bernade.

Ger her rojê sêsed gameşan jî
bikî qurban, hevalo,
çemê mirinê nasekine,
Geryonî û Tityonî jî digire.

Pêdivî ye ku her kes tê re derbas bibe,
vêca em zarokên paşayan
yan jî yên parsekan bin,
baberrikên kelekê li benda me ne.

Bêfeyde ye ku em ji talûkeyên cengê direvin,
ji bahozên deryaya Adriyayê ditirsin,
bêfeyde ye! Bêfeyde ye ku em xwe
ji bayê êşewî yê payizê diparêzin.

Tu çare nîne, dive her kes carekê
wî çemê tarî yê bi herrika hêdî bibîne
ta eger ji hoza hêzdar ya Danao
yan Sisyphusê bo karê giran bendkirî bî.

Neçar î ku dest ji mala xwe berdî.
jina berdiliya xwe jî bihêlî.
Ji darên baxçeyên te jî
tenê dê sîbera selwiyek tarî
li pey te bimeşe.

Mîratxwer dê bikeve xêra Xwedê,
dê denên meya li pişt deriyên bi sed
qeraseyan qepatkirî vexwe
û wek qeşeyan rûne ser sifra te.

- pêdivî: pêwîst, gerek, hewce, lazim, divê ku

William Shakespeare 1564 – 1616 Ingiltere

Di 1564an de li Warwickshireyê, Stradford-Avonê ji dayik bûye . Helbestkar, şanoger, şanonûs û lîstikvanê Ingilîz ê mezin e. Shakespeare navdartirîn şanonûsê diroka wêje û şanoya cîhanê ye. Shakespeare dibistana navînî ya li Stradford de xwendîye, li wir fêrî Yewnaniya kevin û latînî bûye, perwerdehiya wêjeya klasîk girtîye, vê jî bandor mijarên lîstik û helbestên wî kiriye. Di temenekî xort de, di 18 saliya xwe de bi Anne Hathavaya ji wî bi heşt salan mezintir re zewiciye, jê re keçek û yek kur û yek keç, cêwî çêbûne. Wî van çaxan, ji ber sedemeke ku hê jî nayê zanîn, terka Stradfordê daye û heta sala 1592an çî kiriye, çawa jiyaye, ev yek zêde nayê zanîn, tu agahî û belge ji qala vê demê nakin. Di 23ê Adara 1616an de, li ciyê xwe yê jidayikbûnê miriye.

Sonet LXXIII **Di min de dibînî**

Di min de dibînî wê demsalê
ya dar lê rût bûne
li ber sarmaya sahî,
wan dîwarên vala yên dêrê dibînî di min de.
Di min de li xumamiya êvarê dinerî
dema tav xwe radixwişîne rojavayê
û şeva reş dema hêdîka bi ser de digire,
yek jê nîşana nemanê û ya dî ya mirinê.
Di min de dibînî agirekî yê divê
di nav xweliya xortaniya xwe de bişewite.
Tiştê berê hêz û jiyan dida,
niha li ber sekeratê dixwî.
Kûr dibe evîn, dema wê dibînî,
dema dizanî ku dem kême.

Bimînîm yan bimirim?

Bimînîm yan bimirim, aha ew e pîrsa dijwar.
Gelo hêjatir e ku ji kerrî ve
xwe li ber tîrên feleka bêbext bigirim
yan jî bi carekê dawiyê li derdên xwe bînim?
Bimirim – tenê binivim, binivim – ne tiştêk din –
û bawer bikim ku bi wê xewê
dê xelas bibin janên canî, dê nemîne
êşa ku leşê me ji zikmakî ve wergirtiye,
ma dê wisa ne dilovaniyek delal be?
Bimirim, binivim, tenê binivim
û belkî xewnan bibînim?
Aha li wê derazînkê dihilingivim.
Çawan in xew li dinyaya din
dema ku mirov li merema jiyanê vedikole,
ew mirovî dide fikirandin – û bi fikran
mirov dikare jariya jiyanê dirêj bike.
Eger ne wisa bûya, ma kê dê tehemila
derbeyên demê bikira
û xwe li ber bêdadiyê, çewisandinê bigirta
dema ku qanûn tên binpêkirin û evîn qehbik e,
hikûmet zordest in
û mirovên qenc di bin lingên qeşmeran de didewisin
madem ku mirov dikare vê hemiyê
bi xencerekê bi dawî bîne?
Belê, ma kî divê ku
di bin barê jiyana xwe ve binale
eger ne ji tîrsa mirinê be
– tîrsa ji wî warê nenas
yê ku tu gerok jê venegerîne –
eger wê tîrsê em bêirade nekirina
û neçar nekiribûna ku ji van pîrejanan binalin,
ne ber bi yên nû û nenas ve bilezin?
Nezanî me jar dike
û em li bêbiryariyê diheziqin,
girîngtirîn niyetên me jî
wisa varê û pûç dike.

Louis Macneice 1907 – 1963

Wekî şair û şanonûsê Îrlandayî di sala 1907an de hatiye dinê. Ji nifşê bi navê “Sî Şairan-Thirties Poets” bû ku W. H. Auden, Stephen Spender û Cecil Day-Lewis jî di navê de bûn. Di navbera salên 1926 û 1930î de li Oxfordê xwendiyê. Xelata *literae humaniores ya Zanîngeha Oxfordê stendiye*. Berhemên wî ji hêla civakê ve di serdemjiyana wî de bi qîmet dihatin zanîn. Sedem jî ew e ku şeweya wî serbest, herwiha ji hêla hestî û civakî ve jî nasiyar bû. Berhemên wî li dijî totalîtarîzmê xwedî helwesteke însanî bûn û kokên wî yên Îrlandî tê de pir eşkere bûn. Di meha tebaxa sala 1963an de ji bo karibe şanoya xwe ya dawîn binivîse li şikeftên Yorkshireê li efektên dangan digere. Di vê gerê de li herêmê firtone radibe û MacNeice di rê de şil dibe, heta ku digihê malê jî cilên xwe yên şil naguherîne. Ev jî dibe sedem ku bi bronşîtê bikeve, ew jî vedigere pneumoniayê û di 3ê Îlonê de, di 55 saliya xwe de li Hertfordshirea bajarê Brîtanyayê miriye.

Dua berî jidayikbûnê

Ez hê nehatime dinyayê; li bextê we me
min nedin destê şevrevînkên xwînmêj
yan mişkan yan pilingan û nehêlin
ku şeytanê lingbisim nêzîkî min bibe.

Hê ku nehatime dinyayê, tirsî min verevînin.
Ditirsîmin ku mirov bi dîwarên bilind min asê bikin,
bi tilyakên bihêz min gêj bikin, bi derewan min bixapînin
yan bi kelemçeyên reş min girêbidin,
di nav xwîne de bigevizînin.

Hê ji dayika xwe nebûme; diyarî min bikin
avê da ku min paqij bike,
gîyayî da ku min mezin bike,
daran da ku min bidin axaftin,
esmanî da ku min bide strandin,
firindeyan û ronahiyek spî ya binhişî
da ku rêberiya min bike.

Hê nehatime jiyanê; min fêrî
listinê bikin wek ku pêdivî ye,
şîretan bidin min da ku hînî
dersên pîremêran û kenê evîndaran bibim,
da ku hişyar bim dema ku pêlên avê
bala min dikeşin ehmeqîkirinê
û çol gazî xweruxandinê dikin
û parsek xêrên min wernagirin
û zarokên min nefretan li min dibarînin.

Hê nehatime dinyayê; li bextê we me,
hêzê bidin min da ku dijî wan têbikoşim
yên ku dixwazin dilê min yê germ bitezînin,
yên ku hez dikin min bi otomasyona kujer ve girêbidin,
yên ku divê min bikin parçeyek mekîneyekê, tiştêk yekrû

û dijî wan ên ku dixwazin min tarûmar bikin,
yên ku hez dikin wek strîkekî min
vir ve wir ve pif bikin û wek av bim
min ji destên xwe bireşînin.

Yan jî min bikujin.

Raymond Carver 1938 – 1988 Emerîka

Di sala 1938an de li bajarê sin'et û hunerê Clatskanieyê ku girêdayî eyaleta Oregon a li qiraxê Rûdxana Kolombiya bû hatiye dinyayê. Li bajarê Yakîma yê girêdayî wîlayeta Washington mezin bû. Nivîskarê çîrokên kin û şîfrekî meşhûr ê Emrîkî bû. Ew yek ji nivîskarên esra bîstan de şeklekî nû ji çîroka kin re aniyê û di salên 1980 de pir pêşketî bûye. Di sala 1988an de miriye.

Xweştirîn bîska rojê

şevên hênîk yê havînê,
pencereyên vekirî,
ronahiya çirayan,
meyweyên di legenê de
û serê te li ber milê min.
Xweştirîn kêlikên rojê...

ji bilî berspêdê, bêguman
û bîska berî firavînê
û danê êvarê
û tarîgewrika berêvarê.

Lê evîndarê
van şevên havînê me,
belkî ji gavên din zêdetir jî.
Karûbarên rojê hatine kirin
û kes nikare
min û te asteng bike.

Paul Marie Verlaine 1844-1896 Fransa

Yek ji pêşdehatiyê şairê Fransî ye. Di sala 1844an de hatiye dinyayê. Hetanî bîstsaliya xwe di bin dîsîplîna bavê xwe yê serbaz de mezin bû. Lê piştê jiyaneke serberedayî jiya. Perwerdehiyeke tekûz nedît, piştî xwendina lîseyê dest bi memûriyetê kir. Hinekî li Fransayê û Ingîltireyê mamostetî kir lê zêde nedomiya. Di 1871ê de çû Parisê û Parnasî nas kirin. Lê piştê ji vê bizavê veqetiya û şîrên simbolîst nivîsandin. Di gel Arthur Rimbaud li Londra û Brukselê geriyar. Hetanî dawiya jiyana xwe ji mey û esrarê xelas nebû, lê berhemên pir hêja anîn holê. Hewayeke nû, zindîbûn û musîqiyê ku heta wê demê nehatibû dîtin li ser şîra Fransî zêde kir. Di sala 1896an de miriye. Nêzî dehan zêdetir berhemên wî hene.

Êvarê

Heyva sîs
daristanê geş dike,
wek sihrekê
her dar, her çeq
heman dengî vedide...

Dema evînê ye.

Di neynika avê re
benavek ji kûrahiyê şewqê dide şevê,
çeqên wê
rondikên bayî radigirin...

Xewnên şiyarker in.

Wisa bi nermî
bêdengî belav dibe,
wisa bi geşî
valahiya esmanî
ronahiyê dirêje...

Ev kêlîk venagere.

- “xwenên“ hat sererastkirin: „xewnên“
- „big eşî“ hat sererastkirin: bi geşî

Gaspard Hauser distire

Hatim bajarek mezin bal mirovan
ez, sêwiyek tena, awirên nerm
yên çavên min dewlemendiya min bûn,
xelkê ez aqilsivik hesibandim.
Bîtsalî bûm, bir
aramiya min evînekê, wek agirî,
bi min spehî bû her jin

lê ez spehî nehesibandim tu jinê.
Ne min hebû saman, ne sermiyan,
ne şan an şerefa bo şer bikim
lê dîsan jî min xwest di şer de bimirim.
Ma dereng hatim dinê? Nikarim bizanim.
Yan pir zû? Li rûyê dinyayê çi dikim?
Hûn hema - barê xeman li min giran e -
bo Gaspardê reben dua bikin.

William Butler Yeats 1865 – 1939 Îrlanda

Şair û şanonivîsê Îrlandayî. Di sala 1965an de hatiye dinyayê. Yek ji nivîskarên herî girîng ê lîrîk e ku li Îrlandayê gihaye. Herwiha fîgurekî edebiyata sedsala 20an ê esasî ye. Pêşîvanê ronesansa edebiyata Îrlandayê tê jimartin. Yek ji avakerê Şanoya Abbey e û di sala 1923an de ji bo Xelata Nobelê ya Wêjeyê layiq hatiye dîtin. Helbesta wî ya bi navê "Those Dancing Days Are Gone" di salbûma Carla Bruni 2007 No Promises de hate xwendin. Di sala 1939an de miriye. Nêzî 40 berhemên wî yê edebî hene.

Girava innisfree

Ezê rabim biçim giravê Innisfree,
xanîkekê ji axê û çilû çêkim,
şaneyan bo mêşên hingivînê vedim,
nokan biçînim û bi tenê mêşên xwe xwedî bikim.

Ezê li wir aram bibim,
aramî li ber sîrrîna kuliyên
xunav bi xunav ji pelgan dibare.
Nîvşeva wir diçirise,
spêdê dibiriqê û êvarê
şeprepa çeng û baskan e.

Niha ezê rabim û biçim
ji ber ku bi şev û roj
ava deryaçeyê hêdîka kevirên beravê vedişo.
Li kuçe û kolanan jî bim,
di dilê xwe de wî dengî dibihîzim.

Hin pîremêr heyranî xwe li ber avê

Min bihîst dema hin pîremêran digot:
"Her tişt diguhere,
yek bi yek em ji nav dikevin."
Mîna nînokan bûn dest û çokên
qirmîçok wek giyagêzikên pîr
li ber avê.
Min bîst dema hin pîremêran digot:
"Diherike der her tiştê delal,
bêyî av."

Michelangelo 1475 – 1564 Îtalya

Michelangelo di Lodovico Buonarroti Simoni yek ji ressam, peykertraş, mîmar û şairê herî muhîm ê Îtalyayê di dema ronensansê de ye. Di 6e Adara 1475an de li nêzî Arezzoyê li Capresê tê dinyayê. Hê deh mehî bardikin Floransayê. Michelangelo dema ku peykerê xwe yê navdar Zarok Qral Dawud çêkir û ruşda xwe di peykertraşiyê de isbat kir 26 salî bû. Dahiyê ciwan ji bo berhemê xwe yê ji mermerekî xwedî pênc metre û niv kutleyî derxîne, li cem wî mermerî holikekê ava dike û bêyî arîkar, pîrî caran şev û roj xebitiye û berhemê xwe yê David ku yek ji harîqeyên Ronensansê tê qebûlkirin afirandiye. Di gel vê gelek helbest nivîsandine. Di 18ê Sibata 1564an de di 89 saliya xwe de miriye.

Leş geh cemed a tezî, geh agirê gurr e

Car cemed a tezî, geh agirê gurr e.
gavekê nalîna pîriyê, bîskekê axîna rûreşiyê,
li paş maye jîyan.
Hêvîkirin derd û jan e,
xweşî tenê kêlîkekê dimîne
lê ew jî li min ne xweş e,
giran e û min xemgîn dike.
Biborin lê hem jî qedera xwe ya qenc
û hem jî ji bextê xwe yê reş kerrixîme.
Niha êdî zelal dibînim:
kêlîkên bextiyariyê, dilovaniyê kurt in
lê dermanê derdan tenê di destê mirinê de ye.

Ezra Pound 1885 – 1972, DYA

Di 30ê Çiriya Paşîn 1885an de li bajarekî nêzî sînore Îdahoyê hate dinyayê. Bavê wî memûrê derbxanê û kalkê wî jî endamê kongreyê bû. Di sala 1901ê de diçe Zanîngeha Pensilvanyayê. Di demeke kin de meraqa wî li ser edebiyata Pound, Anglo Sakson û ya serdema navîn çêbû. Di sala 1906an de dema dîploma xwe ya hunerê girt dest bi berhema xwe ya herî muhîm Cantosê kiribû. Piştî zanîngehê jî li ser şairên muzîsyen û şairên gelêrî yê Başûrê Fransayê yê Provansal domand. Ev jî bû sedem ku hema her Ewrûpa. Di 1908an de diçe Venedikê. Li wir kitêba xwe ya yekem a helbestan A Lume Spenton (Di Gel Findên Vemirî) weşand. Ji bo W. B. Yeats nas bike çû Ingiltere. Li wê derê zûbizû wekî edîbekî hate naskirin. Yeats nas dike û dibe mudawimê jênegar ê civînên wî î roja duşemê. Di sala 1972an de li Venedikê mir.

Li xewxaneyê

Were, were em dilê xwe bi yên halxweş bişewitînin.
Were, dostê, û ji bîr neke ku zengînan xidam hene, ne heval
lê me heval hene, ne carî.
Were, were em dilê xwe bi yên zewicî û nezewicî bişewitînin.

Berspêde bi bêçîkan tê hundir wek Pavlovaya zêrkirî
û ez nêzîkî berdiliya xwe me.
Û di jiyane de tu tişt
ji bîskek zelal û hênîk,
ji bîska bihevreşiyarbûnê xweştir nîne.

Percy Bysshe Shelley 1792 – 1822, Brîtanya

Di 4ê Tebaxa 1792an de li Horshamê hate dinyayê. Yek ji şairên Ingilîz ê herî muhîm ê Serdema Romantîk e. Li Etonê perwerdehî dît. Ji ber gotara xwe ya "Pêwistiya Ateizmê" ji Oxfordê hate avêtin û ji hêla bavê xwe jî hate reddkirin. Çû Londrayê. Li Îrlandayê serhildan tehrîq kir. Di berhemên xwe yên *The Revolt of Islam* di salên 1816-1818an de û *Prometheus* 1820an de têkiliya jin û mêr wekî têkiliyeke xelasker pîroz dêra û hêviya xwe bi "Rojhilatê" ve girêda. Di sala 1822an de bi fetisandinê hatiye kuştin û li Îtalyayê cihê ku li qeraxê behrê ketiye ji bo were sewitandin merasîmeke cenaze jê re hatiye çêkirin.

Muzîk

Muzîk, piştî bêdengbûna stranê jî,
di bîra mirovî de dilerize;
bêhna binefşê, piştî çilmisîna gulê jî,
hê hestan himêz dike;
pelên sorgulê, piştî beyîna wê jî,
li nav nivînên yarê bêhnê didinê –
di nav ramanên min de, piştî nemana te jî,
evîna min dixwaze bijî.

Christina Rossetti 1830 – 1894, Brîtanya

Di sala 1830î de hatiye dinyayê. Şaireke Ingilîz e. Bi qasî ku bi helbestên xwe yê romantîk hatiye naskirin, ew qasî jî bi helbestên zarokan hatiye naskirin. Dema helbesta wê ya bi navê "Goblin Market" di sala 1862an de ji hêla birayê wê yê ressam Dante Gabriel Rossetti bi resimkirinê hate çapkirin, navdariyeke pir zêde çêbûye jê re. Di sala 1894an de miriye.

Dengvedan

Were nik min dema ku şev bêdeng e
û xew bêdeng û çirîskdar e,
bi geşî were, bi tîrojan re were,
wek roja ku di robarî re dibiriqe,
bi rondikan were,
bi hêviya salên ku min ji dest dane were.

Xewna delal, di gel delaliya xwe jî tehl e!
şiyar dibim û hingê hinda dibe Bihişt,
cihê ku giyan bi evîna xwe ve lê bendewar in,
çav li rê ne, hesretê dişewitînin
yên ku di derî re tîn,
deriyê ku tenê rêya hatinê heye.

Lê di xewnê de were, ev jiyana min
bi mirina sar jî be germ dibe,
xewnê de vegere da bibînî ka çi li vir
bo te lêdide, bo te dijî,
hêdîka biaxêve, were nêzîk,
wek berê, yar, wek berê.

- "hinge" hat sererastkirin "hingê"
- hinda: winda, berze, ne berçav (di eslê xwe de di kurmancî de "hinda" ye, ne "winda" ye ji ber ku hevberî "w" ya soranî û "w" ya zazakî di kurmancî de bi gelemperî "h" ye: "hirç" bi soranî "wirç", "hişk" bi soranî "wişk", "hinda" bi soranî "win".⁹

Pablo Neruda 1904 – 1973, Şîfî

Helbestvanek Şîlîyî ye. Di 12 Tîrmeha 1904an de ji diya xwe dibe. Navê wî Neftali Ricardo Reyes Basoalto ye. Ji ber ku gelekî ji helbestvanê Çekî Jan Neruda hez dike navê xwe dike Pablo Neruda. Sala 1924 da bi helbestên xwe tev li pêşbirka wêjeya dibe bi vê serkeftinê mafê bûrgirtinê bi dest dixê û di Santiago de dest bi xwendina wêjeya Fransî dike. Piştî qedandina perwerdê wek rojnamevan dest bi xebatê dike. Demek dirêj wek dîplomat li başûrê Asyayê û Meksikayê dijî. Di sala 1949an de ji Partiya Kominîst a Şîlîyê dibe senator. Ji ber ku serokê demê Gonzalez Videla rexne dike xayîn tê îlankirin, ew ji Şîlîye direve îdî mîna koçerekî li Arjantînê, Çînê, Yekîtiya Rûsya û li gelek welatên Ewrûpayê digere. Di sala 1952an de dîsa vedigere welatê xwe. Di 11ê Îlona 1973an de Pinochet bi darbeyek leşkerî tê ser text û mala wî dide talankirin û pirtûkên wî dişewîtîne. Nerûda di 23ê Îlona 1973an de dimire.

Evîndarên reben

Li vê dinyayê çend zehmet e
bi aramî ji hev bêzêkirin:
her kes çavdêriya çarşefan dikan,
hemî xelk evîna te têk vedidin.

Hemî dinya bi xerabî
behsa keçekê û kurekî dikan
yên ku piştî gerîn
û vegeşandinan
tiştêk wisa ecêb dikan
ku li gel hev diçin nav nivînan.

Dipûnîjim ka gelo beq jî
nobetê li hev digirin û dikuxin,
di birka xwe de weq-weqê dikan
daku rê li ber şadiya evîndaran,
zewqa yê nemehrkirî bigirin.
Difikirim ka gelo firinde jî
hevalên xwe nefret dikan
yan ga jî guhdariya gamêşî dike
berî ku dest biavêje çêlekê.

Her rê tijî çavdêr e,
her baxçe miştî nobedaran e,
hotêl bi dizîkî li mêvanan temaşe dikan,
pencere navan tînin bîrê,
top û artêş digerin
û evîndaran diçewisînin,
guh û gewrî bê navbir
sîxurî û casûsiyê dikan,
keç û kurrên ciwan
neçar dimînin ku
li ser piştê duçerxeyan
bi lez bi rê ve

bipişkivin.

- “dikeîn” hat sererastkirin “dikin”
- “yang a” hat rastkirin “yan ga”

Daxwazên dehfdayî

Daxwazên dehfdayî êvaran tora xeman diavêjim
okyanosa çavên te.

Ji nav bilindtirîn agir serê xwe radike bêkesiya te ya dişewite,
mîna yên keştiya wan noqbûyî destên xwe dihejîne.

Îşaretên lezgîniyê yên sor dişînim bo çavên te yên gêjelok
yên dibiriqin mîna derya li dor fenerê.

Tenê tarîtiyê vedişêrî, delala min ya dûr,
ji awirên te carinan qeraxên erjengiyê dixuyên.

Daxwazê dehfdayî êvaran torra xeman diavêjim
okyanosa pêldar a çavên te.

Firrindeyên şevîn dinikilînin stêrên pêşîn
yên diçirîsin mîna canê min dema ji te hez dikim.

Şev çargaviyê dike bi mehîna xwe ya sîtavkî
û diçîne serikên simbilên şîn li şovan.

Nazım Hikmet 1902 – 1963

Nivîskar, helvestvan û şoreşgerek e ku bi Tirkî nivîsand. Helbest, nivîs û sîyasetmedartiya wî her tim bi xwe re mijarên nû derxistin holê. Helbestvanê ku di sala 1902 de li bajarê Selanîkê hatibû dinê û di 3ê Hezîrana 1963an li Moskovayê mir. Surgunê tesîrek mezin li ser helbestvan danîbû. Ji ber ku dema mirov bala xwe dida nivîs û helbestê vî bêtirîn hasreta welat xuya dike. Helbestvan piştî kû derdikevê surgunê dewleta Tirkiyê ve bêbext û xayîn hate îlankirin û piştî demekê jî ji hemwelatîyê hate avêtin. Êdî helbestvan jî mîna gelek bêwelatîyan bêwelat mabû. Jiyanêke dagirtî derbas kir û 15 sal surgun û 13 sal di zîndanê de ma. Wî 27 pirtûk tevî jiyanê kirin. Ew di edebiyat û wêjeya Tirkan de pêşketî bû û yek jî şairên herî muhîm ê edebiyata Tirkî tê qebûlkirin.

Jiyan bêdawî

Rojekê xwezaya dayika me dê bibêje:
“Tu keniyî, tu giriyî,
êdî bes e, kurê min!”
Dîsa dê jiyanek bêdawî dest pê bike,
jiyanek ku nabîne, na-axive, nafikire.

Piraniya mirovan

Pirraniya mirovan li qata navberê siwar dibin,
di sefa sêyem de seferê dikan,
bi piyan bi rê ve dimeşin
piraniya mirovan.

Pirraniya mirovan di heştaliyê de dest bi kar dikan,
li bîstaliya xwe dizewicin
û di çîlaliya xwe de dimirin
pirraniya mirovan.

Ji bilî pirraniya mirovan
nan têra hemiyar dike
û birinc
û şeker
û qumaş
û nîvişk
ew hemî bo hemiyar hene
ji bilî bo piraniya mirovan.

Bo piraniya mirovan li dinyayê tu star nîne,

tu çira rê ron nakin
tu cam bo pencerê nînin,
tenê hêvî bo piraniya mirovan heye,
ew wê nikarin bijîn.
Çendî şeyda ye
dilê mirovî:
dema ku li gel te jî bim,
dîsa jî bêriya te dikim.
Nenas

- „wê wê ew“ hat sererastkirin: „ew wê“

Çi ya min li ser me nivîsî

Çi ya min li ser me nivîsî, xeyalî ye.
Ya rast: ew ne rast bû.
Ew hesreta min bû,
hêviyên min bûn li ser çeqên nagihimê,
tînatîya min ya jî xeyalan derkirî bû,
wêneyên li ronahiyê nexşandî bûn.
Çi ya min li ser me nivîsî, rastî ye,
spehîtiya te
zembîlek fêkî ye
yan seyranek li bin esmanê sahî,
bêkesiya min
mîna lampeyek kolanê bim
li taliya bajarî,
kumreşîya min
bazdanek bi çavên girtî ye
di nav trênen şevê re,
siûda min
çemek e li ber tavê diteyise
û bendavan dişkîne.
Çi ya min li ser me nivîsî, xeyalî ye.
Çi ya min li ser me nivîsî, rastî ye.

Heinrich Heine 1797 – 1856

Christian Johann Heinrich Heine di 13ê Çileyê Pêşîn ê 1797an de li bajarê Elmanya Dusseldorfê hatiye dinyayê. Zarokê malbateke Cihû ye. Bavê wî tucarekî ku her carê topdiavêje. Piştî wê Heine diçe Hamburgê. Li wir çûye cem apê xwe yê ku bankerekî pir navdar û serkeftî bû. Dawiyê li zanîngehên Gottingen, Bonn û Humboldtê hiqûq xwend. Lê meraqa wî bêtir li ser edebiyatê hebû. Di 1825an de dîploma hiqûqê girt û di heman demê de Protestanî hilbijart. Ev ji bo yek li dewleta Elman bibe şexsiyet lazim bû. Yan na dê wekî gelek Cihûyan ji gelek mafan bêpar maba. Tenê Filehan dikaribû di daîreyeke dewletê de bixebite. Gelek helbestên Heine ji hêla bestekaran ve bûne stran. Heine bi berhema xwe ya bi navê Gedichte (Şiîr) dest bi karê hunerê kiriye. Evîndarbûna Heine ya bi dotmamên wî Amelie û Therese di demên pêş de bûye sedem ku helbestên bibin stran binivîsîne. Berhema wî ya Buch der Lieder (Kitêba Stranan) berhevoka wî ya herî berfireh a kitêban e. Di 1821ê de çûye Parisê û di emrê xwe de tenê carekê vegeryaye Elmanyayê. Berhemên wî ji hêla Elmanyayê ve hatin menkirin. Heine polîtîka û civaka Elmanya ji dûr ve rexne kir. Yek ji kitêbên wî hate şewitandin. Tenê gotinek wî heye der barê vê de "Heke li ciyekî kitêban bişewitînin, dê rojekê însanan jî bişewitînin." Di 17ê Sibata 1856an de miriye. Nêzî 30 kitêbên wî hene.

Mirin şevê sar e

Mirin şevê sar e,
jiyan rojek germ e.
Êdî dinya tarî dibe, xew tê,
rojê ez westandi
me.

Darek terr li ber nivînên min bilind dibe,
bilbil li ser distrê,
strana wî nerm û şîrîn e,
di xewa xwe de jî wê dibihîzim.

Hafizê Şîrazî, 1320 – 1390, Ecem

Di sedsala 14an de jiyaye. Şairê Îranî li Şîrazê hatiye dinyayê. Yek ji şairê herî mezin ê Farisî tê qebûlkirin. Pêşîvaniya şîra îrfanî ya Îranê kiriye. Di şîrên wî de îstîareyên muteal jî hene. Hafîzê Şîrazî ji hêla hêzdariya fikrên xwe, taybetmendîya venêrînên xwe û rindîya di edayên wî de li rojhilatê şairê herî lîrik hatiye qebûlkirin û navdariya wî her ku çûye li rojhilat û rojavayê jî belav bûye. Berhemên wî tenê Dîwana wî ya helbestan heye.

Jiyan pîreqehbikek e

Çi dibe, bila bibe,
guh nede soz û ehdên xelkê,
dinya ne bi îradeya min û te ye.
Jixwe ev jiyan pîreqehbikek e,
rûqurmiçî li kolanan digere,
bi sedan mêran ew hêlaye.

Bawerî bi ken û stranan nayê.
Binale, bilbilê şeyda,
bazarê fîxana te biha ye.

Gelo çima helbestvan ji te nefret dikin, Hafîzo?
Ji ber ku wan behreya zikmakî nîne,
ji hêza hunera hûnandinê bêpar in,
hibra qelema wan nikare
xwe bigihîne dinyaya xeyalî.

Federico García Lorca, 1898 – 1936, Spanya

Bi Kurdî mîna Lorka tê naskirin, li bajarê Fuente Vaqueros ê herêma Granada (Spanya), di 5ê Hezîrana 1898an de hatiye dinê û di navbera bajarên Vízna û Alfacarê (Granada) de di 18ê Tebaxa 1936an ji destê faşîstan hatiye kuştin. Ew helbestvan û şanonivîsekî Spanî ye. Federico García Lorca nîşana azadiyê ye, hem wek mirov û him jî wek nivîskar û helbestvan. Piştî êrîşa ji hêla leşkerên faşîst ên Franco (Franko) li ser Komara qanûnî ya Spanî di havîna sala 1936an de lêgêrîn û kuştina rewşenbîr û pêşengên Komara Spanî destpê kir. Wextê leşkerê Franco ket ser bajarê Granadayê Lorca hate girtin û dan ber gulleyan. Lorca ji ber spartina rêxistina Frente Popular a Komara Spanî û ji ber sedema homoseksûelbûna wî hate kuştin.

Gîtar

Robarê rondikên
gîtarê diherike,
piyaleyên spêdê
dişkên.
Robarê rondikên
gîtarê diherike.
Bêkêr e ku bêt bêdengkirin.
Nayê bêdengkirin.
Wek avê
bê navbir digirî,
digirî wek bayî
li nav pûka berfê.
Nayê bêdengkirin.
Li yê li dûr,
li doza sosinên spî,
li xîzê agirbar yê başûr
digirî.
Li tîrê bêarmanc
û li êvara bê spêde
û li yekem çivîka
li ser çeqê darê mirî
digirî.
Ax gîtar!
Dilê pênc rîman
bi jan birîndar kirî!

Dema heyv hiltê

Dema heyv hiltê, vedimire
dengê zengilên dêrê.

Rêyên şêlî
xuya dibin şevê.
Dema heyv hiltê, bejayî dinixime
bin pêlên deryayê,
û dil wek giravan
di bêtxûbiyê de ye.
Li bin heyva çardeyî kes
pirteqalê naxwe.
Divê fêkiyek
qeşayî û kesk bixwî.
Dema heyv hiltê, rûyê wê
di şevê de sedanbare dibe,
û hûrdeyê zîvîn
di berîkê de dikinkine.

Córdoba - dûr û tenê

Córdoba.
Dûr û tenê.
Heyvek gir, siwarek reş,
di çanteyê min de zeytûn.
Tevî ku rê dizanim jî
qet nagihim Córdoba.
Di deştê re, ber bi ba,
heyvek xwînê, siwarek reş.
Ji bircên Córdoba.
mirin li min dinêre.
Wey rêya dirêj, dirêj!
Wey li siwarê çeleng!
Mirin dê min hilîne
hê berî bigihim Córdoba!
Córdoba.
Dûr û tenê.

AX Û AVINO!

Luis de Góngora 1561 – 1627, Spanya

Wekî zarokê malbateke feqîr a li bajarê başûrê Spanyayê dijiya, di sala 1561ê de li Córdoba hatî dinê. Li Zanîngeha Salamancayê çanda klasîk xwendîye. Şairê lîrîk ê Spanyol e. Góngora û reqîbê wî yê di temamê jiyana wî de Francisco de Quevedo her demê hewl dane ku bibin şairê herî navdar ê Spanyolî. Góngora bi terzê xwe yê lîrîk û herikbar cihê xwe yê di nav edebiyata Spanî de bi herfên mezin da nivîsandin û di tarîxa edebiyata wan de bû hîmekî bingehîn. Ew di sala 1927an de li Córdoba Spanyayê miriye.

Delaltirîn zeriya vê beravê,
ku duhî bûk bû
û sibê dê bibe bîjin,
temaşê dike
çawa mêrê wê diçe cengê
û bi dîlkovanî dilorîne:
Ax û avino,
bihêlin ez binalim.

Niha ji ciwanî ve, dayê,
pê hesîm
ku çendî kurt e bextiyarî,
çend dirêj e bextreşî.
Te ez dam mêrê ku netebitî
lê kilîlê azadiya min bir.
Ax û avino,
bihêlin ez binalim.

Karê çavan niha girî ye,
şadiya bînahiyê êdî nemaye.
Ma dê çi din ji çavan bêt:
yê ku çû cengê
aştiya dilê min jî bir.
Ax û avino,
bihêlin ez binalim.

Dayika delal, ma kî dê negirî, kî?
Halê min dê kevirên helanan jî bihelanda.
Ma kî dikare temaşê bike
dema ku geştirîn gavên gencatiyê hişk dibin?
Ax û avino,
bihêlin ez binalim.

Bila xewên şevan jî nemînin
madem çû yê ku xew pê re şîrîn bû.
Bila xew jî biçin, nikarim li nivînan binêrim.
Ax û avino,
bihêlin ez binalim.

Min aşt neke, min lome neke, dayê,

herdu jî bêfeyde ne.
Ger giriyê min bisekinînî jî,
jana di dilê de dê hê jî kambaxtir be.
Ax û avino,
bihêlin ez binalim.

- ”mere” hat sererastkirin: ”mêrê”

Charles Bukowski 1922 - 1995

Di 16ê Tebaxa 1920an de hatiye dinyayê. Helbestvanekî Emerîkî ku navê wî yê esil Heinrich Karl Bukowski ye. Di berhemên xwe de carinan navê Henry Chinaski jî bi kar anîye. Jiyana xwe bi giranî li Los Angelesê ya ku bajarekî California ya DYAyê ye derbas kiriye. Ew, di berhemên xwe de bi granî cîdayîna merevên dervî civakê, depresyon û araqxwuriyê navdar e. Ew bixwe jî jiyaneke wuha jiyaye. Di 9ê Adara 1994an de miriye.

Bi tenê li gel her kesî

goşt hestiyar diniximîne
û mejî jî
têkilî wan tê kirin
û carna giyan jî,
û jin guldankan
li dîwaran didin û dişkînin
û mêr zêde vedixwin
û tu kes
ya yan yê ku dilê xwe bo xwe nabîne
lê hê jî lê digerin
xwe dixwişînin nav nivînan
û ji nav derdikevin
goşt hestiyar diniximîne
û goşt
li tiştêkî ji goştî zêdetir
digere

tu çare
nîne:
em hemî koleyên
heman feleka seyr in

tu kes
tu car
ya yan yê ku dilê xwe nabîne

sergo tijî dibin
semtên tilyakkêşan tijî dibin
şêtxane tijî dibin
nexweşxane tijî dibin
goristan tijî dibin
tu tiştêkî din
tijî nabe

- “ya yan yê” bo zelaliyê “ku” lê hat zêdekirin. Mebest “kesa ku yan kesê ku...” ye
- tilyakkêş: bikarînerên narkotîkê, esrarkêş, heşîşkêş, narkoman (tilyak, tiryak: narkotîk, heşîş)

Karin Boye 1900 – 1941, Swêd

Yek ji şair û nivîskara Swêdî bûye. Di serê 1900î de li Göteborgê hatiye dinyayê û li Uppsalayê zanîngeh qedandiyê. Ew di malbateke burjuva de mezin bûye. Bi xwe yek ji çepgirên radîkal a Swêdî bûye. Di rojnamegerî û nivîskariya çapemeniya çepan de jî pir aktîf bû. Piştî 18 saliya xwe mesela dîn jê re bû problem ku çî ye. Nizanibû bikeve kîjan dînê. Di nav Bûdîzm û Filetiyê de diçû û dihat, lê piştî 20 saliya xwe elaqe xwe bi temamî ji dînan birî. Jiyanê wê her demê tez û antîtez bû. Yanî di navbera du tiştan de diçû û dihat. Karinê bêtir di bin bandora Nietzsche û Edith Södergran de bû. Ew di Nîsana 1941an de koça xwe ya dawî kir û şeş berhem li pey xwe hiştin.

Tu baştirîn sebr î bo min

Tu baştirîn sebr î bo min,
aramiya min î, naşkêyî,
baştirîn derman î bo min
çunkî çu tişt wek te min na-azirîne.

Na, tu tişt mîna te min na-arîne,
wek agirî, wek cemedê min dizûrînî,
wek kêra polayî canê min dipertînî,
tu bo min baştirîn xemrevîn î.

Bi rê ve be her dem!

Girîngtirîn tişt ne têrbûn e,
xweştirîn roj ew e ya ku hest bi tîbûnê bikî.

Diyar e ku gelek armanc li ser rêya me hene
lê meşa me bi xwe hêjayî zehmetiyê ye.

Armanc bila wardenîna tenê bo şevê be:
agir hilke, pariyek nanî bixwe û spêdê dîsa bide rê.

Cihê ku tenê carekê lê binivîs,
bêhnvedan lê biewle ye, xew xweş e.

Rabe, bi rê keve! Dîsa rojek nû ye,
maceraya me berdewam û bêdawî ye.

- “speed” hat sererastkirin “spêde”= sibê, serê sibê, siharê, berbangê

Tadeusz Różewicz 1921 –, Polonya

Şair û nivîskarê hemdemî yê Polonî ye, li bajarê Radomosko di 9ê Çiriya Pêşîn a 1921an de hatiye dinyayê. Ji neslê Columbus ê ko piştî Polonya serxwebûna xwe bi dest xist tê jimartin.

Xatirxwestin

Jinik difikirî
ku dinya xem e
hemî
ku gul xem in û baran jî
ku xemê hêlîna xwe
di nav hiriya girr
ya bi bêhna resedayê de çêkiriye
ku xemgîn in
dengên rêvingên xatirxwaz
ku xembar e
ajovanê dilxweş
yê ku qamçiyên vediweşîne hespan
ew difikirî
erd û esman
zêde xemgîn
lê çerx lê diçerixin
çerxên her lezgîntir her dûrtir

çerxên zexm, yên bêtixûb

Ferîdeddîn Ettar 1146-1221

Di 1146an de li Nîşabûra bajarê Îranê hatiye dinyayê. Yek ji şair û arifê Îranî ye. Yek ji navdartirînê edebiyata Farisî yê di navbera sedsala 12an û 13an de ye. Ew wekî Ehlêsunnet tê zanîn lê di serdemên dawiyê de Şîf li ser vê xalê disekinin ku piştî demekê helbestên li ser Şîftiyê û hezkirina Ehlêbeytê nivîsandine. Lê Ettar bêtir bi edîb û şairiya xwe hatiye nasîn û ev aliyê wî tê zanîn. Ettar nêzî 180 çîrokî li pey xwe hiştin, ji wan 40 jê şîrkî û yê din jî nesirkî ne. Ettar teqriben di sala 1221an de di hemleya Moxolan de şehîd ketiye.

Şiblî ji Şeytanî dihesibe

Dema ku ecela Şiblî hat, ew bêhedan bû. Wî kemera agirperêsan li navtenga xwe alandibû û di nav xweliyê de rûniştibû. Wî rondik dibarandin û xwelî bi ser xwe de dikir.

Yekî jê pirsî: “Malavayo, ma kes li ber mirinê kemera kafiran li xwe girêdide?”

Şiblî gotê: “Ez ji çavnebariyê dişewitim û dihelim. Ma ez çi bikim? Min xwe ji dinya û axretê kiriye lê ji Şeytanî dihesidim! Tenê ew bûye xwediyê naletê ya ku Xwedê bi xwe bi devê xwe lê barandiye. Dişewitim û qîçqîça dilê min e: Wî tiştek daye kesek din lê ez jê bêpar hêlame.”

EMILY DICKINSON (1830 – 1880)

Di 10ê Çileyê Pêşîn ê 1830ê de hatiye dinyayê. Helbestvana Emerîkî ye. Emily Dickinson li navçeya Massachusettsê, bajarê Amherstê ji dayik bûye. Malbata Dickinson bi çalakiyên polîtîk û perwerdehî re gelek navdar bûne. Bavê wê parêzer û li kolejeke herêmî berisgerek bûye û ji aliyek din li Kongre kar dikir. Diya Dickinson a ku navê wê jî Emily bû, jinek xwînsar, gelek dîndar bû û karê wê kevanîti bû. Diya wê zehf ji nexweşiyê giyanî kişand û bi piranî di depresyonê de bû. Dibe ku ji bandora wê nexweşiyê be, têkîliya wê bi qîza wê re gelekî sar bû. Ew jî Dickinson di nameyêke xwe de wisa aniye ziman ku digot ‘‘Xwedî dayîkek qet nebûm.’’ Dickinson li Akademiya Amherstê (1834-1847) û koleja *Mount Holyoke* (1847-1848) perwerdehiya xwe qedand. Dora 1850'yê, ew dest bi pêk anîna helbestan kir, helbesta wê ya yekemîn di rojnameya Springfield Daily Republican de di sala 1852an de hate weşandin. Stîla hewl û xebatên wê ya pêşî bi rêkî vetûrî bû lê salên bi ceribandîna pêşketinek bi vî karî xuya kir. Bi piranî, bi awakî lawîj helbest nivîsandin û helbestên wê li ser mijarên bawerî, bêdawîtî, siruşt û girîngiya malbatê bûn. Di 15ê Gulana 1886an de miriye.

Ne denên meya rezên berçeman jî

Ne denên meya rezên ber çeman jî
dikarin vexwirakek wiha bidin
wek ya min tam kirî,

mîna ya nayêt meyandin.
Ji hewa mest im,
ji xunavê serxweş im
dema li meyxaneya rojên şîn
yên havînê li ber ketinê me.
Dema hingmêşên jihalçûyî
ji gulan dizîtikin,
dema pelatînk hew vedixwin,
ez hê jî dinîçînim
ta firîşte bên silav bikin,
yên pîroz bên ber pencereyê
da ku bibînin ya li ber
tavê sermestbûyî.

Dînîtiya xwerû

Dînîtiya xwerû hişmendiya herî esmanî ye –
bo çavê bisexbêr –
Pirr hişmendî – xwerûtirîn dînîtî ye –
Pirranî
di vê de, wek di her tiştî de, serdest e –

Bindest bibe – û dê hişmend bî –
Dijî rabe – û tu dê di cih de bibî talûke –
Û tu dê werî bendkirin.

Pär Lagerkvist 1891 – 1974

Di 23ê Gulana 1891an de li bajarê Växjö hatiye dinyayê. Helbestvan û nivîskarekî Swêdî bû. Sala 1951an de Xelata Nobelê ya wêjeyê wergirtiye. Di hemî warên wêjeyê de berhem daye. Di xebatên xwe de elementên paqij ên ola Mesîhî gelek bi kar aniye. Li ser dîroka hunerê perwerde dîtiye. Di destpêka jiyana xwe ya wêjeyî de helbest dinivîsand û di rojnameyên herêmî de diweşand. Di 11ê Tîrmeha 1974an de li Danderyd a li ber Stockholmê miriye.

Dinya êvaran delal e

Dinya herî zêde êvaran delal e.
Hingê hemî evîna esmanan
li ronahiya tarî dicive
da ku axê, xaniyên erdê
biniximîne.

Li raserî her tiştî dilovanî dilerize,
Yezdan bi xwe beravên ron tarî dike.
Dûrî û nêzîkî dihelin hev.
Bo mirovî her tişt
bi emanet hatiye dan.

Her tişt ji min re hatiye dan
û dîsa her tişt ji min tê standin:
war û dar û ewrên esmanan.
Bi tenê
bê şop diçim.

- “beravan ron tarî dike” hat sererastkirin “beravên ron tarî dike”

Roberto Fernández Retamar 1930 –

Şair, pexşaner, rexnegirê edebî yê Kubayî. Hevalê Che Guevara û Fidel Castro yê herî nêzîk û sirdaşê wan. Retamar yek ji rewşenbîrên herî pêşdeahî yê Latîn Emerîkayê hate bilbijartin. Kovareke çandî damezrand û bi rê ve bir.

Stranên kêmpyv

Gelek peyv hene
di zimanî de
peyvên wek heywanan
mezin, carna xerîb
û hin jî biçûk
û nezelal,
hinên ji kevirî

û şevê çêkirî.
Lê em
ne hewceyî gelek
peyvan in
da ku bikarin
bijîn.
Yên ku pê
perdaqa avê tê xwestin,
pê gazî
dayikê tê kirin,
pê tê hezkirin.

Ma hewceyî
çend peyvan î
daku evînê gurr bikî?
“Hezkirin” diyar e
ku ne ne lazim e
û ne jî ”gul”;
tenê ew peyv pêdivî ye
ya ku taliyê
mirov her nabîne.

Berî peydabûna xwe
helbest
kaxezek vala
û komek bîranînan e,
perrek vala
û arezûyek hilfûrî ye,
wereqek vala
û daxwazek xurt ya kolanan e,
laperrek vala
û gurmîna şoreşê ye.

Peyvên em nikarin bê bijîn

Pirr in peyv
di zimanî de:
hin peyv mezin in
hindî heywanan,
hin xerîb in carinan
û hin jî biçûk
û tarî ne,
ji keviran
û şevê çêkirî ne.
Lê ne pêdivî ne
pirr peyv

bo vegotina tiştan
yên em bê
nikarin bijîn.
Yên pê piyaleyek
avê tê xwestin,
bangî dayê
tê kirin,
tê hezkirin.

ÇEND HELBESTÊN ESKÎMOYÎ

Pesnestranek bo biharê

Bi qayika xwe meşîm
û gihîştîm bejayiyê.
Rêya min bi keviyek berfê ket
ku dest bi helînê kiribû.
Ji wê min zanî ku
bihar e:
em ji zivistanê rizgar bûbûn!
Ez tirsîm
ku zêde qels im,
zêde qels
bo ku xwe li ber wê delaliyê ragirim!

Min divê dût biçim

Dût, min divê dût biçim.
Dût, di ser çiyayên bilind re,
biçim warê firindeyan,
hê dûtir, hê jî dûtir ji vir.

Du zinaran rê li min asê dikir,
du zinarên zilh û zexm:
herdu wek erzîkan
vedibûn
û dimiçîn.
Mirov nikare li dor wan bizivire,
divê di nav re bizivirim
eger hez bikim biçim dût,
pişt çiyayên bilind,
bal warê balindeyan.

Du hirçan rê li min asê dikir.
Du hirçên şerker
di rêya min de bûn.
Rê girtî bû.

Lê dîsa jî dil dikim
ji vir dût biçim,
bigihêm pişt çiyayên bilind,
bimeşim warê firindeyan.

Jaan Kaplinski 1941 –

Di 22ê Çileyê Paşîn ê 1941ê de li Tartuyê hatiye dinê. Şair, filozof û rexnegirê çandê yê Estonyayî ye. Gelekî di bin bandora cereyanên felsefî yên Rojhilatî wekî Taoîzm û bi taybetî jî Bûdîzmê de maye. Kaplînskî di Zanîngeha Tartuyê de di sala 1964an de ji filolojiya Fransî mezûn bû û beşa zimanzaniyê xwend. Wekî wergêr, edîtor û sosyolog wezîfe kir.

Sê helbest

Tu zarokiya min
ya tineyî be
nerm xweş
sivik
şevê havînê
ya ku min
bi çengên xwe yên bédeng
diniximîne.

Nayê bawerkirin:
wek ku cara yekem be
ku pişkiwîna daran dibînim.

Bo aşnabûna li hatina biharê
jiyan kurt e.

Kêlîkekê ewr dipijikin
roj sar e
li raserî kotanê
tarîgewrika êvarê
darên sotinê hatine hûrkin
destikê gêzikî pê ve ye
li ser depê derenceyan rûniştî me
aşîm li gel roja borî
û bi şeva bêre
aşîm li gel heriyê û pûşî
bi stêrên esmanan re
yên ku li hindavî xanîkê min
vêdikevin û vedimirin.

- pijikîn: perrîtîn, pirt-pirt bûn, parçe-parçe bûn, bi temamî ji hev qetîn

Tu be yê neyî

Tu be
zarokê min yê neyî
nerm qenc
sivik
şeva havînê
ya min
bi çengên xwe
yên bêdeng û
mezin radipêçe

Ez dê bêm

Ez dê bêm pêş te ve otobûsa nehê
agirê cigareyê
kirmîkek li nav tarîtiyê bi rêyek hêdî ve dixuşe
sîrsîrokek bi tenê dibire
li ber dîwar hevrikiya mirinê dike
kewçêr
mazûyên bêçare li ber pêngavan dimeriçin.

Borîs Pasternak 1890 – 1960 Rûsya

Di 29ê Çileyê Paşîn ê 1890î de li Moskovayê hatiye dinyayê. Helbestvan û nivîskarekî Rûsî bû. Ew li seranser cîhanê bi romana xwe ya navdar Doktor Jîvago tê naskirin. Sala 1958î Xelata Nobelê ya wêjeyê didin wî lê ew ji ber sedemên polîtîk vê xelatê napejirîne û nagire. Li malbateke Cihû ya hunermend tê jiyane. Di zaroktiya xwe de dersên muzîkê digire. Li Moskow, Almanya û Îtalyayê perwerdeya fîlozofiyê dibîne. Li gorî gelean ew nivîskarê herî baş ê sedsala 20em bû. Di bin siya fûtûrîzm û sîmbolîzmê de pêûsa xwe xebitandiyê. Di helbesta rûsî de nûjenî pêk aniye. Kûraniya derûniya kesayetiya ferdan û koman, bêhempa raxistiye ber xwendevanan. Herçendî ne bi zimanê zikmakî be jî, li Kurdistanê jî gelek hez ji berhemên wî tê kirin. Romanên wî xewnên gelek ciwanên Kurd xemilandiye, hêz û biryardariya jiyane daye wan. Di 30ê Gulana 1960an de li Peredelkîno a li ber Moskovê miriye.

Peydebûna helbestan

Sibat. Ximav, rondik!
Helbest lehiyan radikin,
heriya çerxan
gurzan li bihara reş dide.

Erebeyên lid û hespan. Nîv ripî
çingîna li ber zingilan
ximav, girî bo
tavîbaranek bihêztir,

cihê ku bi hezaran qirereşk ji daran
wek hirmiyên rejîbûyî
wek xemên xuha dadikevin binê çavan
wek beq xwe diavêjin binê avê.

Av ji xeman reş dibiriqin,
hewar li ber bayî bilind dibin,
jixwebawer bi derbeyên tesedifê
helbest bi girî peyde dibin.

Tomas Tranströmer 1931

Di 15ê Nîsana 1931an de li Stokholma Swêdê ji dayik bûye, helbestvan, wergêr û derûnnasekî Swêdî ye. Tranströmer di sala 1958an de tevî Monica Bladh zewiciye û du keçên wan hene. Helbestkarê swêdî di meha Çiriya Paşîn a 1990î de bi xwînêjiya mêjiyî ket û li aliyê rastê felc bû. Tomas Tranströmer, kitêbên wî yên ku bi gelek zimanan wergerandî ne. Di sala 2011an de Xelata Nobelê ya Wêjeyê wergirt.

Kemberên romanî

Li hindirê dêrek zexm a romanî
geştiyar li nav nîv-tarîtiyê hev dehf didin-
Stûn li pey stûnê diyar dibe,
dîmenê giştî yê dêrê xuya nabe.
Ronahiya çend findan dipirpire.
Firişteyek bêrû min himêz dike
û bi hemî bûneweriya xwe dipiste guhê min:
“şerm neke ku tu mirov î, jê serbilind be!
Di te de bêdawî stûn li pey stûnê diyar dibe.
Tu çu car kamil nabî, û jixwe wisa baş e.”
Findan ez çavkor kirim
û izdihamê ez dehf dam derve
nav meydana li ber tavê dibiriqî,
li gel Mr û Mrs Jones, rêzdar Tanaka
û signora Sabattini
û di her yekê de bêdawî stûn li stûnê diyar dibû.

Jaroslav Seifert 1901 – 1986 Çek

Di 23ê Îlona 1901ê de li Pragê hatiye dinyayê. Niviskarekî Çekî bû. Di sala 1984an de Xelata Nobelê ya wêjeyê wergirt. Ew yek ji navdarên rêbaza poetîzmê tê zanîn. Di demên şerê cîhanî yê duyemîn de, xwedî hest û helwestên neteweperwer e. Piştî şer jî bêhtir ramanên dij-komûnîst dihewîne û di berhemên xwe de lê dikole. Di 10ê Çileyê Pêşîn ê 1986 li Pragê miriye.

Bi xatirê we

Bi milyonan helbest li dinyayê hene,
min jî tenê çend rêzik lê zêde kirin.
Ew jî ne ji çîr-çîra kuliyan hişmendtir in.
Dizanim. Li min negirin.
Ezê zû bes bikim.

Jixwe ew ne şûnpiyên pêşîn
yên li ser rûberê tozgirtî bûn.
Eger carna çirîskek jê dibiriqî jî,
ronahî ne ya wan bi xwe bû.
Ji vî zimanî hez dikim.

Zimanê ku lêvên bêdeng
dilerizîne
dikare bike ku evîndar maçan bidin hev
li ser rêka xwe ya li ber hingura tava êvarê
li deverek ku roj hêdîtir
ji deverên tropîkî ava dibe.

Helbest ji destpêkê ve di demarên me de ye.
Wek evînê,
wek birsîtiyê, wek êşê, wek cengê.
Carna helbestên min wisa aqilsivikane bûn
ku jê şerm dikim.

Lê daxwaza lêborînê nakim.
Bawer im ku baştir e li peyvên bedew bigerim,
ne mirovan bikujim û qetil bikim.

Lêvên sedcarî maçkirî

Şev, mûristana ebedî ya stêran
û hê çî din?
Li ber tarîgewrika kesk ya kepirê
evîndarên bextiyar hev dimaçandin.

Lêvên sedcarî maçkirî
peyvên agirbar
bo lêvên sedcarî maçkirî dipistin
daku rê ron bikin bo xwînê
ya ku diherikî çalên kûr yên evînê.

Wek du xenceran
zimanan hev
di devên nîv-vekirî de diperitandin.

Û hingê stêra êvarê ya dibiriqî Gelavêj bû.

Friedrich Nietzsche 1844 - 1900

Di 15ê Çiriya Pêşîn a 1844'an de tê dinê. Di sala 1849an de bavê wî jiyana xwe ji dest dide, li ber destê dê, xwişk û xaltiya xwe mezin dibe û di 25 saliya xwe de dibe profesorê filolojiyê. Friedrich Nietzsche ku li ser felsefeyê kûr dibe, ji malûlî malnişîn dibe û bi temamî xwe dide nivîsandinê. Friedrich Nietzsche bi peyva "Xwedê mir" mirov kişandine nav fikirînê, peyva mirovê raser derxistiye pêş. Nietzsche ku heta niha di gelek anketan de di nav mirovên herî bîaqil ên dinyayê de di nav rêzên pêşîn de cih girtiye, ji bo pirtûka xwe nirxandina, "berhema herî kûr" kiribû. Fîlosofiya wî kartêkirineke mezin li şeweyê ramana sedsaliya 20an kir. Naziyan felsefa Nietzsche ji bo berjewendiyên xwe bi kar anîn û polîtîze kirin, lê rexneyên wî ên zelal li dijî nijadperestiyê, anti-semîtîzmê û biyolojiyê bi zanebûn bêguhndan kirin û binax kirin. Nivîsên Nietzsche kartêkirineke mezin li gelek nivîskar û torevanên Elman ên modern kiriye mîna Rainer Maria Rilke, Robert Musil, Hermann Broch, Stefan Zweig, Thomas Mann, Hermann Hesse, Karl Kraus û Gottfried Benn, herweha li tore û felsefeya Frensiyan kir û bi taybetî li Michel Foucault û Jacques Derrida kir. Felsefa Nietzsche li ser rastî û derewan, xêr û şer, reş û spî, di çarçewa sincê de, belav bû û bi taybetî di pirtûka wî de *Also sprach Zarathustra* (Zerdeşt Wer Got) de. Di Psychologiyê de jî bandora Nietzsche li Sigmund Freud, Ludwig Klages û Carl Gustav Jung bû. Li hember wê jî pir ramiyar û zane li dijî Nietzsche û baweriyên wî hebûn mîna Karl Jaspers, Martin Heidegger, Martin Buber, Paul Tillich, Albert Camus û Jean-Paul Sartre. Wan di nivîsên xwe de, rexneyên tund li Nietzsche girtine. Nietzsche, di cîhana navnetewî de, wek fîlosofê hatiye naskirin, lê wek helbestvan, kêr li derveyê Elmaniya behsa wî bûye. Bi taybetî di salên xwe yên dawî û piştî mirinê navdar dibe; piştî jiyana 11 salên wekî jiyaneke nebatî di 25ê Tebaxa 1900ê de jiyana xwe ji dest dide.

Çinar û birûsk

Ji mirovan bilindtir bûm.
ger bipeyivim, ma kî dê bibihîze?

Bi tenê zêde hilketim.
Niha bendewar im – bendewarî çî?

Yê ku ta ewran hewa bikeve,
dê li hêviya birûska pêşîn be.

Nikki Giovanni 1943 –

Di 7ê Hezîrana 1943an de hatiye diê. Şair, nivîskar, şîroveker, aktîvîst û mamosteyê Emrîkî. Ji bo wî di jiyane de xala pêşî ew e ku hêza şexsî ji bo afirandina ferqekê ye di jiyana xwe bi xweyî û dîgeran de bê bikaranîn. Helbestên Giovanni li ser xurûreke bihêz ya nijadî û malbat û hurmetê ne. Parazvanê mafên însanan ên sîvîl e. Hê jî li Virginiayê profesorekî pêşdehatî yê Ingilîzî ye.

Biserdebirin

rojekê
tu tê malê
ez bi kirasê dirêj yê efrîqî me
tu rûdinî û dibêjî: "Mirovên reş..."
û ez destekî i kirasê xwe derdixim
û paşî tu – bêyî ku qet bala xwe bidî min –
dibêjî: "Ew birayê me..."
û ez kirasî di ser serê xwe re dikeşim
û hê birde-birda te ye: "Şoreş..."
dema ku ez destê te datînim ser zikê xwe
û – wek herdem – gotina xwe didomînim:
"Ez qet fehm nakim çima..."
dema ku destê xwe jor û jêr ve dilivînim
û gumlekê te vedikim
û paşî dibêjî: "Ma em bi rastî hewceyî çî ne..."
û ez zendê te dialîsim
û "Bi min divê ku em..."
û ez qayîşa te vedikim
"Herçi rewşa niha ye..."
û derpîkurtkê te vedişelînim
û paşî pê dihesî ku tazî yî
û te dinasim loma bawer im ku wiha dibêjî:
"Nikki,
ma ne aha ev e şoreş...?"

Halina Poswiatowska 1935 – 1967, Polonya

Di 9ê Gulana 1935an de li Czestochowa, Polonyayê hatiye dinê. Şair û nivîskarê Polonî ye. Yek ji navê herî muhîm ê edebiyata Polonî ye. Ew li ser moz, jiyan, mirin, evîn, hebûn, şexsiyetên tarîxî yên muhîm û li ser temayên tedawiyê helbestên lîrîk nivîsandine. Helbestên wî bi entellektueliyê û hestyariyê meşhûr in, taybetmendiyên hezbarî û hestyarî tê de hene. Dema di Şerê Cîhanê yê Duyem de di esnayê îşxala Naziyan de wekî zarokê nexweş ket, nefeskişandina wî zehmet bû û ji qelbê xwe kete emeliyatê, piştî emeliyata diduyan jî di 32 saliya xwe de mir.

Ez Julia me

Ez Julia me
jiyê min bîstûsê ye
carekê min tam kir evînê
wek fincanek qehweya reş
gelek tehl bû
lerza dilê min lezand
leşê min zûrand
hasten min arandin

ji nik min çû

Ez Julia me
li şaneşînek bilind
ew diheje
diqîrim: vegere
diqîrim: vegere
lêvên xwe yên gezandî
bi xwînê reng didim

ew venagere

Ez Julia me
jiyê min hezar sal e
dijîm –

Frances Horowitz 1938 – 1983

Di 13ê Sibata 1938an de li Londrayê hatiye dinê. Li Zanîngeha Brîstolê xwendiyê. Wekî spîker û pêşkêşvanê BBCyê navdar bûye. Li gor Peter Levi helbestên wî ji "terbûnê" zêdetir wekî "axê" hatiye wesifdan. Helbestên wî li ser dinya siruştî, tarîxê û têkiliyên însanan de ne. Di Çiriya Pêşîn a 1983an di 45 saliya xwe de miriye.

Tenê destlêdan

Gelo tê digihî ku hewceyî destkirina te me
wek çawa dest dikim mêweyan yan zarokan?

Peyv tişta ku ji te hewcedar im nadin min.

Bihêle dest bikim pirça te, lêva te ya dilive,
hestiyê di bin çermê nerm ve.

Te naêşînim – min nevê evînê jî bikim.

Tenê destlêdan, bawer ke, ti ziyane nagihîne te.

- "didkim" hat sererastkirin "dikim"

W. H. Auden 1907 – 1973 Brîtanya

Di 21ê Sibata 1907an de li Yorke Brîtanya hatiye dinê. Li Brîtanya hatiye dinê lê piştê bûye welatîyê DYE, şair û analîstê edebiyatê ye. Nivîskarekî girîng ê ku bandoreke wî ya mezin li ser edebiyata Ingilîzî heye. Nêviyê jiyana xwe li Brîtanyayê derbas kiriye û di 1939an de koçî DYEyê kiriye û piştê derbasî hemwelatîbûnê bûye. Auden ji 400î zêdetir helbest, ji 400î zêdetir pexşan nivîsandine. Gelek listikên şanoyê û librettoyên operayê nivîsandine. Temaya esasî ya helbestên wî hezkirin, welatîbûn û polîtîka û li ser pêwendiyên dîn û exlaq û hebûna însan û siruştî dijşexsî bûne.

Stran

Hemî demjimêrkan rawestînin, xetên telefonan bibirin,
nehêlin se li hestiyê goştî birewe,
piyanoyan bêdeng bikin, daholan qut bikin,
rê nedin behîçinan, tabûtê rakin!

Bila firoke bi nalînan li esmanan biçerixin,
bi tîpên dûxanî binivîsin ku ew miriye.
Bila kotirkên bazarî tacgulên reş li gerdenên xwe yê spî bikin,
bila polîsên trafikê destgorkên reş bikin destên xwe.

Ew bakur, rojhilat, rojava û başûr bû,

ew yekşem bû, rojên min yên karkirinê bû,
nîvroja min, nîvşeva min, gotin û strana min bû:
Min bawer dikir ku evîn dê bêdawî be lê şaş bûm.

Rê nadim stêr bên mala min, wan bitemirînin,
tavê veşelînin, heyvê biniximînin,
deryayan vala bikin, daristanan ji binî ve bibirin:
tu tişt êdî nikare tişteki baş bide min.

- "hetsiyê" hat sererastkirin "hestiyê"
- "[ew kes] rojên min yên karkirinê bû" anku hemû rojên xwe bi wî ve mijûl bûm, tevî ku "rojên min yên karkirinê" pirrjimar e jî, ji ber ku ew kes tenê kesek e, "bû" rast e, ne "bûn". Mebesta "rojên karkirinê" rojên hefteyê yên ji duşemê ta îniyê ye.

Eka Budianta 1956 –

Şairê Endonezî wekî zarokê malbateke Katolîk hate dinyayê. Li Zanîngeha Endonezyayê Beşa Edebiyatê Vekolînên Asya Rojhilat edebiyata Japon xwend. Di sala 1976an de koleksiyona xwe ya pêşî ya helbestan weşand. Di sala 2002an de jî berhemeke wî ya ji çîrokan pêkhatî weşiya.

Wêneyê malbatê

Wek Jononê pale yê ji Tegalê me
ku jin û herdu zarokên xwe
hêlane da ku li Jakartayê
taksiya bipayder biajo.
Wek Salkayê masîgir yê ji Çilingçingê me
ku ji malbata xwe ya li giravê Modura veqetiyayî ye.
Her sê mehan carekê yan
salê du caran
em jin û zarokên xwe dibînin
da ku em ji hesreta xwe rizgar bibin.

Karkerek avakirinê me, dûr im ji malbata xwe.
Gelek kes bi vî halî ne, ezbenî, gelek kes.
Em bi sedan hezaran karker
li ser avahiyên bajarî dixebitin.
Me malbatên xwe li gundan hêlane.
Dema ku ewrên esmanan dibînim,
em nagirîn lê pê dilxweş jî nabin.
Ey ewrê spî, eger di ber gundê min re biborî,
bibêje ku jiyana min ya li bajarî îdare dibe.

Ez tenê Jojon im, bi kontratê li Londonê me.
Tu û zarok bi hejarî li gundê me dijîn.
Dema ku hûn bibînin
ku mij ji esmanan datê

yan berî cejna Zayînê
bi rojan baran dibare,
xwe pal din û bi dilek rehet binivin.
Ezê bi milyonan stêran
bişînim xewnên we
û hûn jî di duayên xwe de
navê min jî bînin.

- Jojon: navê kesekî ye

Aleksandr Sergeyevîç Pûşkîn 1799-1837, Rûsya

Di 27ê Gulana 1799an de li Moskvayê ji diya xwe bûye. Lawê malbatek dewlemend û rewşenbîr e. Wek hemû zarokên malmezînan û dewlemendan Pûşkîn jî di piçûktiya xwe de bi hîmgiriya klasîken Fransî mezin dibe û pirtirîn li ser lîteratûra Yewnanî û Fransî disekine. Hîna di heştaliya xwe de, Pûşkîn zimanê Fransî û Îtaliyî wek zimane xwe î zikmakî dizane. Di duwanzdesaliya xwe de, Pûşkîn di dibistana bi nave Tsarkoye ye de dixwîne. Di navbera salên 1813 û 1815an de bi nivîsîna van helbestên xwe yên xweş deng dide. Piştî ku di sala 1817'an de dibistana xwe tewaw dike. Berhema wî ya peşîn Rûslan û Lûdmîla di sala 1820an de diweşe. Dema ku Pûşkîn tê de dijî, di bin çavsoyîya Çar û dewlemendan de ye. Pûşkîn ne nivîskarekî gundî ye. Ew nivîskarekî peşverû û netewî ye. Gelek fikrên şoreşgerî cara peşîn ji Pûşkîn û berhemen wî hatiye girtin. Di 29ê Çileyê Paşîn ê 1837an de li nêzî Petersburgê dimire. Nêzî 30 berhemên wî hene.

Keşîşek ji hemû kul û xeman revî

Keşîşek ji hemû kul û xeman revî
nav daristanokên li ber deryaçeyê;
li wir rojên xwe yê havînê bi lavayên berdewam,
lêkolînên kûr û rojîyên herherî borandin.
Hê hingê wî pîremêrî bi merikê
ji xwe re gorek kolî mîna ku,
piştî bangî ewliyayan bike ku xanîkê wî bipîrozînin,
tenê bêriya mirinê - ne tiştek din - bike.
Dema wî berşevêkê li ber
xanîkê xwe yê serober xwe tewandibû
hizûra yê herî dilovan,
daristanokê hêdîka li ber çavên wî dizivirî,
li raserî deryaçeyê mij û moranek radibû,
di nav ewrên sîs re, bi esman ve

heyva sor bi nermî dilivî
 dema rondik hatin çavê keşîş...
 Ew matmayî dixuye, tijî belayê,
 tijî tirsî tînegihê ye.
 Ew dibîne ku pêl dibin peqpeqok
 lê dîsan dihedîn û aram dibin.
 Hingê keçîkek tazî - mîna berfa pêşîn li zozanan,
 pêsvîk mîna siyên şevê -
 ji deryaçeyê radibe bejayiyê
 û bêdeng li ser rûniştêkê rûdine.
 Ew fedîke keşîş û bi nermî pirça xwe dimizdîne,
 ava bi destên xwe ve diwerîne.
 Keşîş ji tirsan diricîfe û bi awîrek tûj
 li wê, li bedewiya wê ya efsûnî dinêre.
 Keçîk destekî bi çûş li ba dîke û bangê dîke,
 serê xwe bi lez dihejîne, li dûriyê dibîşîre,
 û mîna stêrekê, di bîskekê de,
 dileze ava aram.
 Êdî xew bi çavên pîremêrê dilbixem neket,
 wî hemû rojê jî lavayek jî nekir:
 sîtava ewreng, a bînad hê jî
 li ber çavên wî dibiriqî û diteyisî...
 Daristan kincê xwe yê şevê bi ser xwe de digire,
 heyv bi banê ewrîn ve dimeşe;
 Ê keçîk niha dîsan li wir e, keçîka spîçolkî û şîrîn
 xwe tewandiye hindavî berava efsûnî.
 Keçîk li wî dinêre, pirça xwe dimizdîne,
 ramûsanên hewayî, çolîn dişîne,
 bi pêlan dilîze, miz dide, dişepîne -
 geh dikene, geh mîna zarokêkî dinale,
 bi narînî dinale, dengbilindtir, hê bilindtir gazî dîke...
 "Were, keşîş, were, keşîşo! Were nik min, cem min!.."
 Paşî wenda dibe nav ava zelal
 û bîskekê bêdeng e...
 Roja sêyem xamoşanê bicoş
 li beravê rûniştibû, evîndar bû,
 bendewarê zeriya şîrîn bû
 dema siyê daristan niximandibû...
 Tarîtiyê rê da xuyabûna rojê;
 keşîşê me bi temamî wenda bûbû -
 ta komê zarokên şûm ên heremê,
 dema masî digirtin, riyên wî yê spî dîtin.

Ebdullah Goran 1904–1962, Kurdistan

Di sala 1904an li bajarê Halebçeyê hatiyê cîhanê. Ji aliyê malbatê ve navê Evdila lê dikan. Goran nasnavê wî ye. Lê navê Goran hê bêtir bandor kiriye û navê Evdila êxistiye pîleya duyemîn. Êdî ev nasnav ji aliyê wî û ji aliyê gel ve jî tê pejirandin û ev weke navê wî derdikeve pêş. Bavê wî karmendekî dewleta Osmanî bûye.

Goran zaroktiya xwe li bajarê Halebçeyê borandiye. Çand û perwerdeya pêşî ji malbata xwe girtiye. Di temenê xwe yê şeş salî de, ji bavê xwe fêrî Quranê bûye. Di demeke kin de Quranê diqedîne û hînî xwendin û nivîsandina Erebi û Farisî dibe. Di temenê heşt saliya xwe de li Helebçeyê dest bi dibistana seretayî dike.

Goran di sala 1919an de ji bo xwendina dibistana mamosteyan, diçe bajarê Kerkûkê û dest bi xwendinê dike. Ji ber tengasiya aborî nikare dibistana mamostetiyê biqedîne. Di navbera salên 1921 û 1925an de, karmendiya dewleta Osmanî dike. Di vê navê re dersên dibistana mamostetiyê xwe bi xwe dixwîne û dikeve ezmûnan; bi ser dikeve û dibe mamoste. Ji sala 1925an dest bi mamostetiyê dike; di dibistana seretayî ya Helebçeyê de 12 salan mamostetiyê dike. Bi awayek tekûz zarokan digihîne. Gelek suxteyên wî jê hînî helbestnivîsandinê dibin. Bi taybetî di vê demê de helbesta xwe pêşve dibe û helbestên tekûz dinivîse.

Goran piştî sala 1937an xwe bi temamî dide helbestnivîsînê. Di vê demê de derbasî herêmên Qeredax û Hewramanê dibe. Li van deran li ser helbesta kevin lêkolîneke baş dike. Ji van lêkolînan sêdeke baş digire. Xwe digihîne û di warê helbestnivîsînê de digihe pîleya herî mezin. Êdî helbestên xwe zelaltir û watedartir dinivîse û pêşkêşî xwendevanên xwe dike. Ev dema ku jê tê axaftin dema Mamoste Goran a herî germ û geş e.

Di salên desthilatdariya Qral Faysal û Nûrî Seîd de, gelek caran hate girtin û di girtîgehê de ma. Di zindanê de jî helbest dinivîsîn û ji girtiyan re dixwendin. Bi nivîsandin û xwendina helbestan sebra girtiyan jî dianî. Girtiyên ku pê re diman, gelekî kêfa xwe jê re dianîn û jê hez dikirin.

Mamoste Goran di helbestên xwe de, bi taybetî behsa spehîtayî, aşî, evînî, xweşî û hevaltîyê dikir. Bi awayek zêde jî li ser gel û gelên bindest radiwestiya. Ji bo rizgarkirina wan li çareyan digeriya. Bi taybetî helbestên xwe li ser rewşa gelê xwe dihonandin.

Mamoste Goran sala 1962an, cara dawî derbasî Moskowayê dibe û li wira nexweş dikeve. Ti derman li nexweşiya wî nayên. Piştî demekê di temenê xwe yê 58an de, gelek berhem li pey xwe hiştin û hê dikarîbû gelek berhemên biafirîne lê di dema xwe ya herî berhemdar de koça dawî kir. Ji nivîs û helbestên wî yê bi Kurdî, du piyes û çar dîwan mane.

Çav

Ger bedewî giyayek şên î narîn be, çav cotek guliyên geş e bi serî ve. Çav cotek şakaran e ko bi bilindahiya esmanan ve diçirise. Cotek cewherên birqok e, taca evîn û spehîtiyê dixemilîne. Du pencereyên ron in li gulistana giyanê.

Çav du rûpel in ji pirtûkek pîroz, dagirtî bi peyvên qenc. Rastiyên jiyanê, sîrrên dilî û razên derûnê bi tîpên nûranî tê de hatine nivîsîn.

Gelo ma ji çav diyarkertir, ji çav watedartir, ji çav efsûnîtir çi berhemek giyanî, çi pirtûkek esmanî heye?

Yek ji mucîzeyên çavan – wek berên bihadar – ew e ko ji hemî rengan peyde dibin. Hin çav mîna şevê reş in, hin şîn in nola feyrûz, hin jî dişibin çavên bazan, wek yaqûtan dibiriqin.

Arthur Rimbaud 1854 - 1891, Fransa

Di 20ê Çiriya Pêşîn a 1854an de li herêma Ardenler bajarokê Charlevilleyê hate dinyayê. Helbestvanê navdar ê Fransî ku li ser jiyana wî fesane hatine honandin. Pêşengê herikên simbolizm û surrealizmê. Bûyerên 1870-71ê bûn sedemê şiyarbûna hestên wî yê serhildêr ku ji zarokatiyê ve di nav dilê wî bi tundî cîh digirtin. Piştî şer dest pê kir reviya Parîsê, lê di rê de ji ber ku bê destûr rêwîti dikir hate girtin. Di tîrmeha 1872an de tevî Verlaine Parîs terikand û bi hev re li Belçîka û Elmanyayê jiyanek gerrok û beradayî jiyan. Di vê navbêndê de gelek helbest nivîsand ku giş dawiyê li bin navê *Illuminations* hatin weşandin. Rîmbaud pirtûka xwe ya navê wê *Une Saison en enfer* (Di Dojehê de Demsalek) ku têde helbestên qala gişê dînîti û beradahiyên xwe dike hebûn, weşand. Di 1875an de Rimbaud dev ji nivîsandina helbestan berda û dest bi jiyanek bi rêwîtiyan û serpêhatiyan tije kir. Piştî ku vegeyriya Ewrûpayê demekê li Awistriya, Îtalya û Elmanyayê ma. Di sala 1877an de tevî artêşa Holandê bû û çû heyta Cawayê lê pîr derbas nebû ji artêşê reviya. Paşî çû Kîprosê û ji 1880yî wir ve li Efrîqa yê bi cî bû û li Aden û li Harrar ê dest bi bazirganiya çekan û a mirovan kir; mebesta wî bi frotina çekan di rêyek kin de dewlemendbûn bû. Piştî demekê dewlemnd bû jî. Lê ji ber ku di çoka wî a rastê de girêkek derket, ji bo derman dîtinê mecbûr ma ku vegere Fransa'yê. Çend meh piştî ku li Marsilya yê lingê wî hate jêkirin di 10ê sermaweza 1891an de li Nexweşxaneyê Coceptionê ji kangrenê mir.

Keştiya mestbûyî

Dema hêdîka bi Herrikên bêxem re dimeşîm, pê hesîm
ku êdî kêşvanan serkêşiya min nedikir: çermSORAN
bi qîjînî ew kiribûn hedefên xwe,
bi darên gelerengî ve girê dabûn.
Keştîvan qet ne xema min bûn, xema min,
barkêşa dextlê flaman, çîtê îngilîzan. Dema
bi carekê dawî li kêşvanan û wan mijûliyan hat,
Herrikan hişt ku xwe berdim çî dera ku dilê min dixwest.
Zivistana borî min xwe hênik kir li ber pêlên dijwar
yên rabûn û daketina avê, bêhesttir ji mejiyên berşîran!
Qet negihane şehyanên ji wan serkeftîtir
ta Nîvgiravistanên ji bejayê veqetiyayî jî.
Bahozan pîroz dikirin her şiyarbûna min ya deryayî.
Ji derqefankan siviktir min sema kir deh şevan
di ser pêlan re yê tîn gotin hêskên herherî ne,
û min bêriya fikirina balnekêş ya ewrengiyên nekîr!
Şîrîntir ji goştê sêva ji zarokan ve tirş
qurmê min yê şeşdarî ava kesk mêt xwe
û şûşt verişîn û lekeyên şîn yê meyê
û virr avêt paşok bi aliyekî, lenger bi yek dî ve.
Ji hingê ve min xwe veşûştîye di Helbesta Deryayê de
ya tê de stêr dişilin, ya şîrê rêya kadizan jê diçipe,
û ya şîniya kesk dadibilîne; ya carinan dikeviyê
xayinek dilpak yê di ramanên xwe de xeniqî;
ya tê de kûriyên şînbûyî, gêjî û rîtmên hêdî
tavilê rengîn dibin li ber birqokên zêrîn yê rojê

dema lekeyên xwîna tal ya evînê dest bi meyînê dikin,
ji alkolê tûjtir, ji van helbestan bêkinartir!
Ez dinasim ewrên birûskan şeqkirî, peykelên babelîskan,
pêlên li hev didin, herrikên deryayê; ez dinasim êvarê û
Spêdeya firrok mîna refa hecîreşkan; û carinan
min ew dîtine yên mirovan bawer kiriye dîtine!
Min dît ka çawan roja erjengiyên efsûnî herrimandî ava bû
û ronahî da bi dirêjîya tîrojên cemidî yên şîn û sor ve;
li dûr dicolîn pêlên bi xîçikî dilerizîn
ta mîna pêşkêşkerên şanoyên serdemên kevnare!
Ez xeyal dikim şevê kesk û berfên wê yên korbûyî,
xeyal dikim maçekê ya li ber çavên deryayê hêdîka radibe,
û dewrek berê nedîtî ya gezo û kîtreyan
û haybûna stranane ya fosfor ji şînî û zeriye!
Bi mehan ez mîna garrana harbûyî
bi pêlên mezin re revîm ber bi zinarên di avê de;
min nedizanî ku Meryem dê bi piyên geş
bidin ser û bigirin derûlêvên intok yên Okyanûsan.
Ez didihimîm, bizanin, Floridayên nayên bawerkirin
yên tê de dibiriqin tevlihev gul û çavên pilingên
ji çermê mirovan! Keskûalayên li jêr asoyê
keriyên gewr digirin, şidandî goya hefsar bin!
Min dîtî avzêlên bilqok yên neditemirîn, xefikên
tê de tevaya Leviathan dê di nav rûlan de şil bibe!
Min dît av dadirîjin bêbiniyan li nav tenahiya avê
û dûrahî min dîtî bi gurmîni dadiqulipin kendan!
Qeşageh, hetavên zivîn, pêlokên morîkî, esmanên
rejîkî! Çûnên kabûsane berev tengavên têherrî
yên lê marên kirmokan xwarî hêdîka
li gel hilfûrîna bêna reş aşt dibin ji darên çemiyayî!
Dilê min dixwest doradên pêlên şîn, wan masiyên zêrîn,
masiyên stranbêj, nîşanî zarokan bidim.
- Ez, ya bêxwedî, vekişandim xewê serikên kefok yên gulan
û bayên nayên baskirin carinan ez diçengandim.
Carinan, dema navik û navçeyan ez ji birsan
şehîd dikirim, kinkinên deryayê bi nermî dihejandim,
û devên zer yên gulên xwe yên xumamiyê deryayê hildidan
berev, û ez dimam li wir wek jinan li ser çokên xwe...
Ez hema giravek bûm, li ser rexên min dihejîn
gen û gazinên firrindeyên çavspî yên pitpitker.
Û wa diseyirîm ta bi alavên min yên nazik re
yên xeniqî li ser piştê xwe di xew diçûn! ...
Lê ez, keştiya di bin pirçên kendavan ve mayî,
ya bahozê veweşandiye esmanek bêfirinde,
ya kelexê wê yê ji avê mestbûyî dê barkên Hansayan
ranekiriba, û ne jî keştiyên zirîpoşî -
azad, fistewî, bihêz mijên binefsî
min kun kiriye esmanê sor mîna dîwarê ku
dibe lezet bo helbestvanên baş:
lîkenên rojê û gilîzê şîn yê hewayan;

ez darê dîn, bi saya hespên deryayî yên reş,
 ya parasû hênik kirin û şilqand karebaya heyvokan
 dema tîrmehê bi derbeyên mîrkuî dest bi şkandina
 berç ya min heyî û jê baştir nabe
 Lê ez dê çi lê bikim, ji te hez dikim
 Tu yî leylana min a spehî
 Ew dem li bîra min e ya tu leylana min
 ya spehî bûyî
 Tu spehî yî
 Min diviya li gel te bifirim wek difirin,
 belê, wek difirin dûr
 Lê nesax bûn em her du û nêz dawî dê li vê bê
 Pa çi pere dike ev hemû?
 Ji te hez dikim, nêz ez dê birûxim
 Ma dikarim tu lê bikim? Ez dibim nediya
 Ez destê xwe li te dihejînim, ji bilî destî tu nabî
 Derî vedibe, derengî şevê ye
 Ronahî ditemire, min daye her tiştê min hebû
 Min tu ji xwe re nehêla pê bijîm lew her
 nediya dibim
 Lê ez dê bimirim
 Dimîne: derî. Ma ez dê çi dî bikim ji bilî derbikevim
 ji odeyek ez bi xwe
 Ez namirim, tenê wenda dibim
 Belkî, wenda didim bêhedaniyê, ez dê dîsan
 şiyar bibim misogeriye û nemisogeriye
 hingê ez dê vebigerim li te bigerim.

- herrik : robar, co, çem û hwd
- kend: cihên kûr
- kendav: xelîc, berava teng ya navbera du-sê bejahiyan

Dylan Thomas 1914 - 1953 Brîtanya

Di 27ê Çiriya Pêşîn a 1914an de li bajarê Swansea yê Gallerê hatiye dinyayê. Şairê Gallerî ji cereyanên Modernîzm û Romantîzmê bandor girtiye û yek ji şairên herî bibandor ê sedsala 20an e. Thomas di 16 saliya xwe de dest bi rojnamevaniyê kir û di sala 1934an de derbasî Ingiltereyê bû. Dîsa di vê salê de yek ji berhemên xwe yên herî muhîm 18 Helbest weşand. Di Herba II. Ya Cîhanê de qederekê li Londrayê maye û bi xwendina helbestên xwe yên ku di wê demê de li BBCyê xwendin pir bal kişandiyê. Piştî şer vegeyriyaye Laugharnê û helbestên li ser nîgaşên siruştê nivîsandin. Di helbestên xwe de hezkirina siruştê, pêwendiya di nav zayin û mirinê de bi rîtm, nîgaş û peyvên ku wî dariştibûn bi awayekî zindî aniye ziman. Di 9ê Çiriya Paşîn sala 1953an de li Gundê Greenwichê miriyê.

Xort bûm bêxem

Û dema xort bûm bêxem li bin çeqên sêvan,
li ber xaniyê dicolî bextiyar bûm wek giya kesk bû,
stêrîn bû li raserî çalê şev,
demê dihêla biqîrîm,
wek zêr hilkevim geşiya çavên xwe,
û bi erebaneyan şahane bûm ez mîrê bajarê sêvan
û carekê şeng bû dema min pel û dar dawerandin
nav herrikên ronahiya bi hezaran kerbên
fêkiyên daketî, li gel dexl.
Û kesk bûm dema bêxem bûm li nêzî çeperên çeleng,
li meydana bermala bextxweş distrîm mala min bûn welat,
tenê carekê li ber tava ciwan
demê rê da yariyan bikim,
zêr bûm di nav bereketên wê dayî de
û zêrê kesk bûm ez nêçîrvan ez şivan, golikan
bersiva zirneya min dida, bi zelalî bi xwînsarî gur li serê giran dizûrîn
û roja pîroz hêdfîka
dijenandin kevirên herikên pîrozwer.
Dem hemû rojê diherikî, şeng bû, zevî hindî
xaniyan bilind, dengê zirneyên dûkêlî, lîstik û yarî, hewa
şîrîn mîna avê,
agirê kesk wek giya.
Û şevan, tenê stêr serbanê min
dema siwar dibûm xewê, kundan bêdeng xanî bi xwe re dipirpirand,
her tim min dibîst şevrêsk - pîroz li dorberî govan -
difirîn bi gidîşan re û hesp
diçîrisîn tarîtiyê.
Û şiyar dibûm li dema xaniyê xunavî mîna gerokek spî
vedigerî dîkek li ser milî, û dibiriqî her tişt, tam roja
bû gilover roj,
esman berhev bû dîsan,
delîva Adem bû û ya zeriye.
Diviyabû wa be madem tenê ronahî peyda bûbû
ji babelîska pêşîn û siwarên efsûnkirî
ji gova dişihî ya kesk derdiketin

meydanên pesnan.

Di nav tezerwanan û guran de fêris li nêzî xaniyê bikêf
li bin ewrên nipînû bextiyar bûm wek dil bêwestan e,
her û her roj vedîjîya,
rêçikên mestane bezîm,
hêviyên min li nav giyayê bilind dilezîn,
di karûbarên şînî esmanî de ne xem bû ku dem di dewra xwe
ya awazdar de rê dide wa kê m stranên wa yê spêdeyan
ji berî zarokên keskî zêrîn
didin pey wê derdikevin,
rojên spiyî berxane ne xem bû ku demê destê siya min digirt û
hefsarê min dikêşa jorve berev serdavan nav vizîna hecîreşkan,
li hindavê heyva her hiltê,
ku dema siwar dibûm xewê
min dê bibîsta dilezîne meydanên bilind pê re
ku dê veceniqim xanî wenda, zarok bêwelat.
Wey ez xort bûm bêxem di nav bereketên demê de, kesk
girtiyê demê, dê miribam
tevî ku zeftkirî distrîm wek deryayê.

Gaius Valerius Catullus 84–54 bz. Împeretoriya Romê

Der barê jiyana wî de pir kê m tişt têne zanîn. Li gorî çavkaniyên girîng ên wekî Suetonius û Ovidius jî di nav de li Veronaya Italya hatiye dinyayê. Mensûbê malbateke mezin a Veronayê ye. Di gel nufûza xwe ya Veronayê jî qismekî muhîm ê jiyana xwe li Romayê derbas kiriye. Li rexê qiraxa Gola Gardayê Sirmioyê maleke wan hebû ku bavê wî Julius Sezar û Walî Gaul mêvan kiribû. Ji ber gotinên xwe yê n ku li vê derê li ser Sezar û Namura gotin piştî lêborînê dixwaze, heta poşman dibe.

Hevalên Catullus ên şair kesên wekî C. Licinius Macer Calvus, Marcus Furius Bibaculus û C. Helvius Cinna xetîb Hortensius û dîrokzan Nepos in.

Were em bijîn

Were em bijîn, Lesbia,
ji hev hez bikin,
çi dibêjin bila bibêjin, mêrên enirî,
jinên zimandirêj!
Roj ava dibe,
û dîsan radibe:
roja me ya kurt dema carekê ava bibe,
emê binivin
êdî ranebin.
Bide min 1000 maçan,
paşî 100an,
paşî dîsan 1000an,
paşî dîsan 100an
paşî dîsan 1000an,

paşî 100an.
Û paşî,
ku ew bûn gelek gelek hezar,
emê wan şaş bikin
da ku êdî kes nejmêre
û êdî çavên xerab
dê nikarin ziyane bigihînin me
madem kes nizane ka çend in.

Gunnar Ekelöf 1968 Swêd

Şair û nivîskarê Swêdî di sala 1907an de li Stockholmê hatiye dinyayê. Yek ji wan şairan e ku li ser Kurdistanê û Kurdan şîr nivîsandine. Wextê ku Ekelöf li welatê Ereban, Kurdistanê û Tirkiyê geriyaye, bûyerên xerab ên ku rastî wan hatiye di helbestên xwe de nivîsandiye. Ji xwe dipirsî zimanekî jiyanê heye lê gelo çima zimanekî pevrebûnê tune?

Bo te ji welatek dûr dinivîsim

Ez bo te ji welatek dûr dinivîsim
Wî reng nîne
Wî ne wêne hene bide te
ne ramanek bide te biramî
Ew welatek dûr e
Çawan dikarî bigihiyê?
Tenê eger bidî pey wî
lê ne bi ramanan û ne jî bi xeyalan
û bêwec e lasa bikî,
texlîdkirin kêr nayê:
Ger bi rastî bidî pey
ya ji te bi xwe re rastî ye
dê bigihî wir
Li pey xwe bihêlî yek ji xwe li pey yek dî
qûnaxek li dû qûnaxekê
Li pey xwe bihêlî yek ji xwe li pey yek dî
dê bigihî wir.
Ew welatek dûr e
Nêzîkî li wir peyde nabe
Ger bigihî wir

dê tam welatek dûr bibînê
 welatek ku dûr e
 Tu tiştêk dî li wir nîne
 lew her tişt yek dî ye
 Giya li wir dûr e
 û çêlên li çerîngehê dûr in
 xanî û gov dûr in,
 kotan dûr in, ta bîrê qederek e
 Her tişt dûr e - hindî hev dûr in
 ax û av, erd û esman
 tu û ya jê hez dikî
 Belê wa ye, ew tam wa ye
 Ew welatek e yê ku welatek e
 yê ku welatek dûr e yê ku welatek e
 yê ku welatek dûr e.

- „bide te biramî“: bide te daku bifikirî, bo fikirînê bide te
- lasa kirin: texlîd kirin, çav lê kirin, mîna kesekî kirin

Çima distrî, teyrikê min, madem wa sar e hê?

Çima distrî, teyrikê min, madem wa sar e hê?
 Ma gezoyê daran ta nik te hildikeve jor, gula awazan li ser çeqê bilind?
 Hemû valahî li dor min bi nearamiyê tijî dibe. Li dûr e,
 li derî asoya bînahiya te ye rojavabûna nesax, duhiya
 hilmgirtî îro ye û kêlîka borî niha ye û hemû ya heyî ev e li vir e:
 Mal di bêmalîyê de, berpirsiyarî di bêberpirsiyarê de! Teyrikê koçer!
 Di te de rojên min yên borî dijîn, di te dijîn hemû ew
 yên di ser deryayan re revîn û şewitîn rojê, di te de
 ew ya rê û rêvingî, ya mirovan û heyberan,
 û ew ya jiyanê li hev tîne. Bêdengî jî rêyek e
 dem ew bi xwe çûnek e mîna vê êvarê
 Çûna di hêlînê de ye, di navoka hêkê de, bi me re diwelide
 Lew ji min re distrî, teyriko, lew sarmaya hov hênîk dixuye.
 Bang, gazî, ax birsa dişkê tenê
 dema nikilê xwe diavêjî pêşûyek ne-tu
 ya her kêlîkê pelate dibe hewayê vala.

Andrew Marvell 1621 - 1678, Ingilîstan

Di 31ê Adara 1621ê de li Winestead a Brîtanya hatiye dinê. Parleментар û şairê metafîzîk ê Brîtani û kurê keşîşê dêrekê. Wekî şairekî metafîzîk têkildarê John Donne ye. Helbestên Marvell bi piranî henekî, metafîzîk û stîleke zerîf hatine nivîsandin. Gelek helbestên wî jî bi girtina îlhama ji zeman, bûyer, qamû û şexsî hatine nivîsandin. Di 16ê Tebaxa 1678an de li Londrayê miriye.

Bo evîndarek şermîn

Ger me têr heba dem û derfet,
dê ne tawan ba, jinê, ev şermî.
Emê rûniştina derekê da bipûnijin ka
bo em kîjan rêyê bibijêrin û ka em çawan biborînin
roja dirêj ya evîna xwe. Li berava Gangesê Hindistanê
te dê yaqût bidîtan, min dê li hindav rabûna ava
hember gazin bikiran. Min dê ji te hez bikira
deh salan, ta tofana avê,
û ta hemû cihû bihatan ser rêya rast
dîsan jî te dê bigota nabe ger dilê te nexwesta.
Evîna min ya siriştî dê geş bûba
ji împaratoriyan mezintir û pirr hêdîtir.
Bila sed sal gorî pesindana çavên te ban, du sedan
min dê herdu memikên te biperestan:
sî hezar bo hemû yên din.
Bi kêmanî serdemek bo her endamek leşê te,
û ji wan ya dawîn dê dilê te nîşan bida.
Jinê, tu hejî hemû vê şerefê yî;
tenê wa ji bilind ji te hez dikim.
Lê ji paş dibîzim herdem erebaneyên bibask
yên demê dilezînin nik, û va li pêşiya me ne
xîzistanên bêtxûb yên herheriyê.
Bêkêr e êdî ji wir li bedewiya te bê gerrîn,
û di gorra te ya mermerî de jî venajene
vedengê strana min: gorî kirman dibe ew
keçaniya te pirr parastî û dibe ax
ew namûsa bûye kevnjen;
û dibe xwelî gurriya goştê min.
Gorr ciyek delal yê takekesî ye lê
ne haydar im jê ku kes li wir kesî hemêz dike.
Lew niha, ku hê li leşê te
ciwanî mîna xunava spêdeyan e û tê de
çirûskan dijenîne agirê canê te yê coş,
were em herdu bilîzin hê ku em dikarin;
û mîna çivîkên evîndar, yên bûne nêçîra qertalan,
baştir e em aniha dem û derfetên xwe bixericînin,
bêyî em xwe biavêjin bendewariyê.
Were em hemû hêza xwe û hemû şîrîniya xwe
têk bialînin da bibe gogek mezin:

û were em bi hemû kêfa xwe bi carekê
deriyên asinî yên jiyane bipelixînin.
Wiha, madem em nizanin roja xwe
rawestînin, em dikarin wê bidin çerxandin.

- hember: beramber, miqabil

Octavio Paz 1914 - 1998, Meksîko

Di 31ê Adara 1914an de li Ciudad de México hatiye dinyayê. Nivîskar û dîplomatekî Meksîkanî bû. Sala 1990î de li gel gelek xelatan, guncavê Xelata Nobelê ya wêjeyê hate dîtin. Ew yek ji navdarên întelîjansiya Latînamerîka bû. Hevalê Pablo Neruda, filozof û aşîxwazek bû. Bi giştî cihan û nakokiyên Latînamerîka dianî ziman û ew bêhempa şîrove dikirin. Berhemên wî li tevayî zimanan hatine wergerandin. Wî herwiha bandoreke berbiçav li wêjeya Bakurê Amerîka ya îngîlîzîaxêv jî kiriye. Di 20ê Nîsana 1998an de li heman dera bûye miriye. Ji 30î zêdetir berhemên wî hene.

Evîndar

Li nav giya
keçik û kurrik
pirteqalan dixwin maçokan vediguhêzin
vediguhêzin kefa xwe mîna pêlan.
Li beravê
keçik û kurik
lîmonan dixwin maçokan vediguhêzin
vediguhêzin parçokên xwe wek ewran.
Li nav heriyê
keçik û kurik
tu nabêjin ranamûsin
bêdengiyê vediguhêzin bêdengiyê.

Muriel Rukeyser 1913 – 1980 Emrîka

Di 15ê Çileyê Pêşîn ê 1913an de hatiye dinê. Wekî şair, siyasetmedar û aktîvîsta Emrîkî tê zanîn. Bi helbestên xwe yên li ser wekhevî, femînîzm, edaleta civakî û Cihûtiyê de hatine nivîsandin navdar bû, hate naskirin. Helbesta navdar ya bi navê "Di Sedsala Bîstan de Cihûbûn" ya wê ye, kitêbên wê jî hêla bizavên Reconstructionist hatin qebûl kirin. Di 12ê Sibata 1980ê de miriye.

Du mirov dikoşin ji hev re bipeyivin

Ji min re bipeyive. Destê min bigire. Niha tu çi yî?
Ez dê hemûyê ji te re bibêjim. Tiyê venaşêrim.
Dema ez sêsalî bûm, zarokek biçûk çîrokek li ser kêroşkekê xwend
ya ku mir, di çirokê de, û min xwe xwişand bin kursîkê:
kêroşk rengpembeyî bû: rojbûna min bû, findê
bi dijwarî tîla min sot û ez dihatim neçarkirin kêfxweş bim.
Ax, fehma bibe min binase. Ez ne bextiyar im.
Vekirî dipeyivim:
Aniha ez diramim li baberikên spî hemberî esman
wek hemberî muzîkê,
wek zirneyên bi kêfxweşî lê didin, firindeyên hejok,
û zendek li dorberî min.
Yek hebû min jê hez dikir, yek bû dixwest bi seyirînê bijî.
Ji min re bipeyive. Destê min bigire. Niha tu çi yî?
Dema ez nehsalî bûm, bi çirîkî hestiyar bûm,
rijok bûm; û meta min ya jinbînmayî Chopin dijenî,
min serê xwe pal dida darek birrî ya boyaxkirî, û digirîm.
Niha ez dixwazim nêzî te bim. Dixwazim
deqeyên rojên xwe yek bi yek bi rojên te ve girêbidim.
Ez ne bextiyar im. Ez vekirî dipeyivim.
Min hez kiriye ji lampeyan li kuncikên êvaran, ji helbestên rehet.
Di jiyana min de tirs hebûye. Carinan dipûnijim
çi trajedî bû jiyana wî, bi rastî.
: Destê min bigire. Dilê min bigire lepê xwe.
Niha tu çi yî?
Dema ez çardasalî bûm, min xewnên xwekujiyê didîtin,
li avabûna rojê bilind li ber pencereyê radiwestîm,
hêvî berev mirinê:
ger ronahiyê ewr û meydan nehelandiban da bibin bedewî,
ger ronahiyê ew roj veneguhartiba, min dê xwe biavêta.
Ez bextreş im. Ez bêkes im. Ji min re bipeyive.
Ez vekirî dipeyivim. Wa diyar e ku tu car
ji min hez nedikir:
hez dikir ji beravên sîs, lêvên kefok
li ser pişta pêlên biçûk, ji dewra qaqlîbazan hez dikir:
bi devek kenok digot: ez ji te hez dikim.
Fehma bibe min binase.
Niha tu çi yî? Ger me bikariya dest bida hev,
ger van tekatiyên ji hev qut xwe bigihanda hev
û biqilifîna hev mîna parçebaziya çînî... duhî
ez di nav geremolekê de bûm, kolan miştî mirov,

yekî peyvek jî negot û spêde dibiriqî.
Her kes bêdeng bû, dimeşî... destê min bigire.
Ji min re bipeyve.

- birrî: ya ku hatiye birrîn

Bertolt Brecht Di 10ê Sibata sala 1898an de, li Augsburg ji dayîk bû. Bavê wî – rêvebirê karxaneyekê bû. Xwendina tenduristî û feylesofiyê li Münchenê kir. Ji şanoya Elmanî hez dikir. Ji ber rewşa siyasî reviya Siwêstra, piştê Danîmarka, Ingilîstan, Swêdê û ji wir çû yekîtiya Soviyetê û DYeyê jî, piştê li Swêstra bi cih bû. Piştî 1949an vegeriya Berlîna rojhilatê û bû Endamê Akademiya hunerê li Berlîna rojhilat di sala 1954an xelata Stalin a aştiyê wergirt û di 14ê Tebaxa 1956an koça xwe ya dawî kir û kartêkirineke mezin li şanoya Elmanî û cîhanî kir. Li gor agahiyên Weşanxaneyê Suhrkamp Brecht 50 berhem nivîsîne. Helbest û pexşanên wî ku di sala 1998an ji Weşanxaneyê Suhrkamp hatibûn weşandin.

Bo bîranîna Marie A

Li meha îlonê li sahiyek zelal
bi bêdengî li bin darhilûyekê
min zêft kir hemêza xwe dilbera xwe ya şermîn
û li lêvên xwe min hest bi devek nazik kir.
Û li raserî me, li zelaliya esman
dimeşî ewrek yê min dîr-dirêj da pey.
Ew spî bû û qewî bilind bû
û verevî dema min lê nêrî.
Ji hingê niha çendî çend meh
hêdîka veguhezîne paşerojê.
Belkî darhilû hatine birrîn û dibe bipirsî:
pa halê evîna te çi ye?
Û wa dibersivînim: ew êdî ne li bîra min e
lê dizanim merema te çi ye.
Ger rû ji bîra min çûbe,
pirtir tê bîra min, maç tên bîra min.
Û min dê maç jî ji bîr kiriban
ger li esman ewr neba.
Lê ew tê bîra min, bi herherî dê li bîra min be
yê wa sîs-spî wa bilind.
Dibe hê jî bipişkivin darhilû;
jin belkî dayika heft zarokan be.
Tenê ewr bi tenê kêlîkekê pişkivî,
dema min lê nerî, min dît vedireve.

Valery Larbaud 1881 - 1957 Fransa

Di 29ê Tebaxa 1881ê de li Vichê hatiye dinê. Di sala 1908an de diyariya Akademiya Goncourt a Edebiyatê Oktav Mirbeau ya amatorî wergirt. Piştî sê salan jî Akademiya Goncourt a Edebiyatê wergirt. Ingilîzî, Îtalî û Spanyol jî di nav de bi şeş zimanan axivî. Helbestên wî bêtir realîst bûn û li ser rastiyên xembar û tûj nivîsand. Di sala 1957an de li Vichê mir.

Trên

Bide min xilingîna xwe ya mestker û leza xwe ya nerm,
xwişîna xwe ya şevîn ya di Ewropaya ronkirî re dimeşe,
ey trêna şeng, û bide wê muzîka diltengker
ya di bersifkên te yên pîstzêrîn ve dihurme
dema li pişt qeraseyên zîvîn yên giran yên deriyên maliştî
milyoner dinivin.

Bi nehvirîn li korîdorên te dilezînim,
meşa te ber bi Viyana û Budapeştê,
dengê xwe dikim nav koroya sedhezaran dengên te,

ey çengetrênê!

Yekem car pê hesîm, çend xweş e bijîm
di vagonên Trêna Lezgîn ya Bakur de, li navber
Wirballen û Pihlakovayê.

Em di nav mêrgan re dilezîn, li cihê li bin
komên darên gir yên dişibîn giran

pîstê mihan yê pîs û xav li şivanan bûn...

(Seet heştî spêdeyek payizê û stranbêjek bedew,
ya çavbinefî, li pişt dîwarê min distrî.)

Ey pencereyên mezin, yên tê re min dîtiye li paş dimînin Sîberya û çiyayên Samnium,
Kastîlyaya bêqulî rût û deryaya Marmara li ber baranê!

Bidin min, ey Trêna Lezgîn ya Rojhilat û Raya Başûrê Brennerê,

bidin min xilingîna xwe ya xuloleyî xerîb

û çîzînên xwe yên çivîkane;

bidin min henaseya sivik û livên narîn yên lokomotîvên bilind û hilû,

yên lokomotîvên trêna lezgîn

yên bêzehmet çar vagonên tîpzêrîn dikêşin

tenêtiya çiyayên Sirbistanê

û paşî di Bulgaristanê re ya ku tijî sorgul e...

Ax, bikevin nav helbestên min, deng û liv û bibêjin

ka çi ye jiyana min ya nayê şîrovekirin, jiyana zarokekî

yê naxwaze tu bizane

lê tenê her û her tiştên nediyar xeyal bike.

Hugo von Hofmannsthal 1874 - 1929, Awistîrya

Di 1ê Sibata 1874an de li Viyanayê hatiye dinyayê. Romannivîs, librettîst, şair, şanonivîs, vebêjer û pexşannivîsê Awistiryayî ye. Cara pêşî di şazdesaliya xwe de bi mexlesa Loris dest bi nivîskariyê kiriye. Bi Gesterna ku bi mustearê Theophil Morrenê bal kişandiye. Ji ber ku di ciwaniya xwe de gihîştîye asteke mukemmel di serdema xwe de wekî dahî tê binavkirin. Di 15ê Tîrmeha 1929an de miriye.

Sêyîn li ser nemanê

I

Ez hê jî li gepên xwe hest bi henaseya wan dikim:
çawan dibe ku ev rojên berî kêlîkekê
êdî nemabin, bo herherî nemabin, bi hêwirî çûbin?
Ev metelokek e ku kes tê dernaxe
û qewî zalimî ye bêt gilîkirin:
ku hemû dibore û di ber re dibore
û ku ezatiya min bi xwe bêyî tişteke wê asteng bike
raguheziye min ji zarokek biçûk yê ku
ji min re seyrî lal û xerîb e wek seyekî.
Û hê jî: ku sed sal berê jî ez bûm
û ku bavkalên min di cilên mirinê de
ûcaxa min in wek pirça min.

II

Kêlîk! dema em fedikin şîniya
vebûyî ya deryayê û em mirinê fêm dikin
bi sivikî, bi şehyanî, bêyî kabûs,
mîna keçikên biçûk, pîrr zerik,
çavgir, û her sar,
dema ew êvarekê bêdeng li pêş xwe dinêrin
haydar ji hindê ku jiyan hêdîka di endamên leşê wan
yên xewto diherike daran, giya,
û bişkurek sist dinexşe
mîna ewliyayekî yê xwîna xwe dike gorî

III

Em ji heman tevnê ne ya xewn jê
û xewn çavên xwe vedikin tam
mîna zarokên biçûk li bin dargilyazan
dema ji çilûyê wan heyva çardeyî diçe
bi zerikî zêrrî di şeva mezin re dibore.
... Wek din xewnên me hilnakevin hewa,
ew hene û dijîn wek zarrokekî yê dikene,
mezin dema radibin û ava dibin
wek heyva çardeyî ya gupikên daran pê hesiyayî.
Nava me vekirî ye da ew raçînin,
mîna destên ruhên bi odeyekê ve qerasekirî
ew hene û bêwestan di me de dijîn.
Û sê eynî yek in: mirov, diyare, xewn.

Guillaume Apollinaire di 26ê Tebaxa 1880ê li Roma Îtalya hatiye dinyayê. Helbestvan û Rexnegîrê Fransî ku bi eslê xwe Îtalyan e. Nûnerê herkakubîzm, dadaîzm, surrealîzm a ku di serê sedsala 20î de dest pê kirine. Û navbavîkê surrealîzmê û orfîzmê ye. Bavê wî îtalyan, dêya wî polonî ye. Li Collège Saint-Charlesa ku li Monacoyê ye hindekariya fransî dît. Di 1902'an de li Parîsê bicîbû. Li Cannes û li Niceyê li çend dibistanan hindekariya xwe domand. Di 1903'yan de kovara ku navê wê *Le Festin d'Esope* ye derxist. Li Fransayê bi Pablo Picasso û bi André Derain re hevnasînek wî pêk hat. Çû Rhinelanda Elmanyayê û li wêderê demekê mamostetî kir. Di van salan de helbestên wî di nav helbesta fransî ya nûjen de cî digirt. Apollinaire, di Şerê Cîhanê yê yekem de ji serê xwe brînek gran girt û di sala 1918'an de li Parîsê ji şewbê mir.

Pa tu dilê min

Pa tu, dilê min, çima bênavbir lê didî
Wek venêrek xemgîn
ez çavdêriya şevê û mirinê dikim.

Georg Trakl 1887 - 1914, Awistiryaya

Şairê lîrik ê Awistiryayî yek ji wan hunermendan e ku kartêkirineke baş di empresyonîzm û ekspresyonîzmê de kiriye. Ji vê hêlê ve navekî gelekî muhîm e ku însan bala xwe bidinê.

Êvarê dilê min

Êvarê qîjîna balçermikan tê bihîstin,
li mêrgan hesp dibezin
dixîşîşe darkevotek sor.
Yê gervan li rex rê bi ser meyxaneyekê hildibe.
Xweş in gûz û meya nû,
xweş e xwe hilavêjî nav daristana tarî dibe.
Dijenin nav çeqgelên reş zengilên jandar,
li rû xunav dimîne.

Hans/Jean Arp 1886 - 1968, Almanya/Fransa

Di 16ê Îlona 1887an de li Strasburga Elmanya hatiye dinyayê. Ressam, şair û peykertiraşê Fransî yê di nivê sedsala bîstan de yek ji pêşvanên fêmkirin û şîrovekirina hunerekî nû ye. Di 7ê Hezîrana 1966an de li Basela Swîsre miriye.

Xwe digihîne hêlînên vala ba

Xwe digihîne hêlînên vala ba,
digihe rûpoşên hişk.
Li xumamiyê distre dengê mirovan
reng,
pesnestran,
marên çîrrokan.
Diheje, diheje
vir ve – wir ve
navberî ronahiyê, tarîtiyê.

Margiad Evans 1909 - 1958 Brîtanya

Di 17ê Adara 1909an de hatiye dinê. Li mekteba Hereford a hunerê perwerdehî dît. Bi helbestên xwe yên Mûma Gavekê Li Pêş, xelata Konseya Hunerî ya Gallerê wergirt. Curên pastoral di nav helbestên wî cihekî taybet digirin. Mînanî helbesta wî ya Daristan helbestên wî yên li ser siruştê gelekî dikşînin. Di 17ê Adara 1958an de miriye.

Daristan

Li vê jiyane, ya tê de kes ne xwe bi xwe ye,
min xwe dît li nav daristanek mezin dimeşî. Sî bû hemû.

Û kûr meşîm:

nediçirisîn stranên firindeyan, gavek tenê jî
bi rehetî bi deholâ daristanê nediket.

Ne ronahiyê tîkên pelên daran şeq dikirin
û ne jî rûyê esmanan, yê çeqan pê velîstî,
ji jor ve li min dinêrî.

Û kûr meşîm

bêyî bibişirim, bêyî bitirsim. Û kûr meşîm.

Ruha di min de yan giyanê dîtin rehên bêdeng
hind kûr di bin daran ve hindî çeq li bilind.

Û kûr meşîm

û strîm li nav daristanê ya ber bi du aliyan ve kûr bû:
berv diyariyê û berv nediyariyê, û bextxweş bûm

di bêdengiyê de, li ber siyê û bi tenê.

Mîna dilê yekî mirî bûm

yê di gorê de distre, yê bo herherî hatiye gorkirin.

Û kûr meşîm li nav daristanê dema taviê

min dît mirovek, kevirek û kûriya wî ditacand

hingivmêjkên sîs yên mişe; û çavên wî kevir bûn,

bêyî biqeliqîn. Rawestîm çiku ev dirûvê dilşadiya min e:

kevirek pîroz û bêna spî

yên di min de bûne yek; nediyar, ta çavên neniximandî

fedikirin rondikan, û rondik vedirijîn ser rû

û diteyisîn mîna tîlên çengê...

Û hewayek berê yê sosret li nêzî min hildifûrî.

Û kûr girîm û nestrîm, wa bi dengbilindî pelên daran distrîn.

Û kûr girîm. Hê jî her dem digirîm.

----: ev rêzik hatiye rakirin

Robert Desnos 1900 - 1945, Fransa

Şairê Fransî ku Gestapoya Elman di Sibata 1944an de şandiyê kampa Theresienstadt a Ewrûpa Navîn de ye. Di wextê esaretê de miriyê. Bûye yek ji nûnerê surrealîzmê. Piştî ku nava wî û Andre Breton vebûye, di dawiya manîfestoya duyem a surrealîst ji wê civakê veqetiyaye.

Li kujiyê yekem dizivirî rastê

Li kujiyê yekem dizivirî rastê
Bi kolana beravê ve dimeşî
Li pirê derbas dibî
Deriyê xanî diqutî
Roj dibiriqê
Çem diherrike
Cerrikê pelargonî di pencereyê de vediheje
Li berava din tirimpêlek dibore
Dizivirî li dîmenek şeng binêrî
Pê nahesî ku derî li pey te vebûye
Kabanî li derazînkê ye
Xanî tijî tarî ye
Lê li sifreyê teyisînek diyar e
Tava rojê ji fêkî û şûşeyekê
Ji sênîkekê û raxistekekê diteyise
Û tu li wir li derazînkê radiwestî, li aliyê din
Dinya tijî yê wek te
Li aliyê din tenêtiya te ya hemû dinyayê
Dihurmîne

- kabanî: kebanî, bermalî, jin, pîrek

Sapfo 617/612 - 570/560 bz. Yewnanistan

Li girava Mîdîlliyê hatiye dinyayê. Şaira lîrîk a Yewnana Antîk e, rahîba kulta Afrodîtê, lîderê Ekolê. Dîroka jiyana wî di navbera salên 630 û 570ê bz. bûye. Eusebius dibêje ku Sapfoyê di sala duyemîn a Olîmpiyatên 45emîn de dewra xwe ya herî xweş borandiye.

Dema te dibînim

Ji xwedayan e ew yê bi te re rûne,
yê ji nêz ve bibîze dengê te yê şîrîn
û kenê te
û evîna te
kenê
te
Dil di sînga min de geş dibe.
Dema li te dinêrim
qet
deng ji devê min dernakeve.
Dema ji nişkê ve te dibînim
zimanê min dilerize, agir dikeve leşê min
tu tiştî nabînim
vizînek guhên min dadigire
xuh bi leşê min de tê
gehên min diricifin
ji pûşê hişk
zertir im.

Yê bi gurriya evînê dil şewitand

Hatî: te baş kir:
min bêriya te dikir,
te yê dilê min
bi gurriya evînê şewitand
niha hatiyî
kerem ke hind car
hindî em ji hev dûr bûn

Solveig von Sshoultz 1907 - 1996, Fînlanda

Di 5ê Tebaxa 1907an de hatiyê dinê. Şairê nûjen û lîrîk ê Fînî ye. Malbata wî gelemperî hunermend û hunerhez bûne. Diya wî ressam, diya wî stranbêj û jina wî ya pêşî jî bestekar bûye. Schoultz wekî edîtor li ser mijarên civakî gelek nivîs nivîsandin. Nêzî 70 salî nivîskarî kir. Çîrok û helbestên wî baş têne zanîn. Di sala 1996an miriye.

Çavên min dixwazin rûyê te maç kin

Çavên min dixwazin rûyê te maç kin.
Nikarim çavên xwe ji te ragirim.
Bivê-nevê, ew dixwazin rûyê te maç kin.
Tênek nerm ji çavên min ber bi te ve diherike,
li ser milên te dibizive
û hêdîka derhêlan hinda dike
û min digihîne te, nêzî lêvên te
û li herderê dorberî te --
nikarim çavên xwe ji te ragirim.
Li vir rûniştî me, dest di hemêzê de,
wan nagihînim te û qet jî napeyivim.
Lê çavên min rûyê te maç dîkin,
ji xwe diçin û kes nikare min rawestîne,
diherikim, kes dê di vî halî de min nenase,
nikarim biçikînim vê herikê,
vê zelaliya bêdestpêk û bêdawî --
lê gava taliyê awirekî didî min,
awirek bêhay, pirsker, biyan,
xwe radestî destên xwe dikim
û vedigerim bin qepaxkên çavên xwe.

Geoffrey Chaucer 1340 - 1400, Brîtanya

Şairê mezin ê Ingiltere û edebiyata Ingilîzî. Di emrê xwe yê ciwan de li serayê wekî xizmetkar maye. Kurê qral John of Gaunt ew girte bin hîmaya xwe. Ji kurê hundirîn derbasî sîlehdariyê bû. Di herbê de li Fransayê bû êsîr. Gerewa wî hate dayin û serbest ma. Bi wezîfeyên curbecur li gelek welatan geriyaye. Li Italya ronesansê maye. Bi hemdemê xwe William Langland hatina Ronesansa Edebiyatê xeber didan. Di gel kevneşopiya edebiyata ku jê dihat û felaketên wê serdemê Chaucer ne şêweyeke xemsar û bedbîn, lê terzekî bikêf û şadab tercîh kiriye. Kevneşopiya helbestê ya Anglo-Saksona Bakur û awayê zordest û tarî yê Dêra Katolik a Serdema Navîn piştî Chaucer vediguhere awayê rewşen yê Normanan. Berhema sereke ya şair Canterbury Tales yek ji berhemên herî muhîm ên edebiyata Serdema Navîn û Edebiyata Ingilîz e.

Herdu çavên han min dikujin

Herdu çavên han min dikujin;
nikarim xwe li ber bedewiya awirên te bigirim:
dilê li min diperitînin.
Tenê tu bi şekerpeyvên xwe dikarî
birîna teze dîsan bikewînê.
Herdu çavên han min dikujin;
xwe li ber awirên te ranagirim.
Jiyanê yan jî mirinê diyarî dikî,
şabanûyê, dizanim;
dema bimirim, dê rastiye bibînê.
Herdu çavên han min dikujin;
xwe li ber bedewiya te nagirim:
dilê li min diperitîne.

Ji "Stirana stiranan"

(Ji Tewratê)

Xort:

Were, dilbera min, ji çiya were,
ji Çiyayê Libnan were bal min!
Gupikên Amana bihêle,
bihêle lûtkeyên Senîr û Hermonî,
wargehên şêran,
çiyayên pilingan!
Yara min, destgirtiya min,
te biriye dilê min!
Bi awirekî te ew bir,
bi morîkek gerdenîka xwe.
Ax, çend şîrîn e evîna te,
yara min, berdiliya min!
Ma mey çi ye li ber evîna te!
Xweştir e ji hemî belseman

bêna melhemê te!
Hingiv ji lêvên te diteyise,
zimanê te şîr û şekir e.
Yar, bêna Çiyayê Libnan
ji cilûbergên te tê!

[...]

Xort:
Yar, dilbera min!
Tu baxçeyek girtî yî,
gulistanek çeperkirî, kanîkek parastî;
biheştek î ku li ber robarên wê
şên dibin hinar,
çendîn fêkiyên çêjdar,
xena, nerdiz,
nerdiz û sehrem,

[---]

belsema herî baş.
Tu kaniya gulistanê yî,
bîra ava jiyane yî
ya ku avên çiyayên Libnanê tene!

Zerî:

Rabe, bakur, rabe, başûr!
Li gulistana min bide
da bêna belsemê belav bibe
û yarê min gulistana xwe
û berhemên wê wergire!

- tene: ten wê, ten wê derê

William Blake 1757 – 1827 Brîtanya

Di Çiriyaya Paşîn a 1757an de hatiye dinyayê. Şair, ressam û vîsyonerê mîstîk e. Xebatên Blake yê ku di jiyana wî de nehatin zanîn di roja îro de hem ji hêla dîroka hunerên dîtbarî û hem jî ya helbestê wekî vekirina asoyên nû ten dîtin. Di 12ê Tebaxa 1827an de piştî ku soz da jina xwe ku dê her tim pê re be, mir.

Pilingo

Pilingo, Pilingo, geş dibiriqe
agirê te li nav daristanên şevê.
Çi çav bû, çi destê ebedî
ev şengiya te şarand?
Ji çi kûriya esmanan ve
agirê çavên te dişewitî?
Çi çeng bûn hildiketî ber esmanan?
Bi çi zendî gurz hatin veweşandin?

Û çi tilan, çi hinêrê
davên dilê te vehûnandin?
Û çi destî, çi piyan
dilê bêhedan zeft kir?
Çi çakûçî, çi asinê ew debirand?
Bi çi nîrî ve hat girêdan mejiyê te?
Çi mistê, çi mîrkuî karî
van erjengiyan rawestîne?
Dema stêran bi rondikên xwe esman şil kir
û bo kuştinê rimên xwe avêtin,
gelo kêfa wî bi karê wî hat?
Gelo Babê Bexê bû Piling jî afirand?
Pilingo, Pilingo, geş dibiriqe
agirê te li nav daristanên şevê.
Çi çav bû, çi destê ebedî
ev şengiya te şarand?

Jiyorgos Seferis 1900 - 1971 Yewnanistan

Giorgos Seferis Di 13ê Adara 1900î de li Îzmirê hatiye dinyayê. dîplomat û nivîskarekî Yewnanî (Grekî) bû. Di sala 1963an de Xelata Nobelê ya wêjeyê wergirtiye. Li Îzmirê hatiye jiyane ku wê demê tevahiya rojavayê Anatoliyayê ji Grekiyan pêk dihat. Piştî damezrandina Komara Tirkiyê gelê Yewnan hate derxistin û yê mayîn bi darê zorê hatin Tuikîzekirin. Malbata wî di sala 1914î de koçberê Yewnanistanê dibin. Li Parîsê perwerdeya dadnasiya bidawî dike. Bavê wî jî herwekî parêzer bûye. Wekî balyozê Grekyayê li gelek welatan dixebite. Li dijî dîktatoriya leşkeran a ku di salên 1967–1974an de li ser desthilatîyê dimînin têdikoşe. Seferis di 20ê Îlona 1971an de li Atnayê dimire. Ji bîstî zêdetir berhemên wî hene.

Li çi digerî

Dolfîn in, flama ne û silavên bi topan.
Deryaya carekê wiha tal bo canê te
niha hildigirtin keştiyên rengîn, yê şeng,
wê ew dipêlandin, dicolandin, zîq şîn, bi baskên spî.
Deryaya carekê wa tal bo canê te
bi rengan têrbûyî li ber tavê bêna xwe vedide.
Baberrîkên spî û ronahî û bêrikên dikevin
bi rîtmên deholê li pêla hêwirî dida.
Çavên te dê spehî ban, ger wan dîtiban,
zendên te dê bibiriqîna, ger te ew raber kiriban,
lêvên te dê dîsan vejîyana
li pêşberî sosretiyek wiha:
tu lê digerî -
li çi digerî li nav xweliyê,
baranê, mijê, ba,
tam dema ronahiyê dest bi xumambûnê kir
û bajar wenda bû kûratiyê û li ser kevirên peyarêyê
Yê Nesranî dilê xwe nîşanî te da,
li çi digerî? Çima tu nayê? li çi digerî?

Rainer Maria Rilke 1875 - 1926, Awistirya

Nivîskarê ku bi wasita edebiyatê ji heqê edebiyatê derketiye. Rîlke wiha tê nasîn. Di Çileyê Pêşîn 1875an de li Pragê hatiye dinyayê. Bavê wî Alman, diya wî bi eslê xwe ji Pragê bû. Dema bû nehsalî diya û bavê wî veqetiyan. Rilke li cem diya xwe ma û çû Viyanayê. Perwerdehiya xwe li Munîh û Berlînê didomîne û şair Lou Andreas Salome nas dike. Ev jina ku Nietzsche evîndarê wê bû di pêşketina hunermendiya Rilke de roleke mezin lîstiyê. Di gel Salome di sala 1897 de diçe Berlînê, ji 1898an de diçe Floransayê û ji wir diçe Rûsyayê. Li wir Tolstoy û ressamê mezin Pasternak nas dike... Rilke, ji xeynî helbestên xwe wekî pêşengê romana Elman jî tê zanîn. Romana wî ya bi navê Notên Malte Laurids Brigge bandoreke mezin çêkir. Ev berhem wekî rojaneyekê ye ku behsa jiyana li Parîsê ya şairekî ciwan ê Danîmarkî dike... Rilke bi nexweşiya losemiyê ket û piştî 1923an sihheta wî bi yekcarê xera bû. Di 29ê 1926an de li nêzîkî Montreuxê li Valmontê ku bajarê Swîsrê ye, miriye. Nêzî deh berhemên wî hene.

Rojek payizê

Dem e, Xwedêyo. Min havînek mezin dît.
Siya xwe niha biavêje ser rojengan
û mêrgan biniximîne bi simbilan.
Û ji fêkiyan re bibêje: Bigihin!
du rojên başûrî bide wan,
û bila dawîn şîrînî ji wan bikeve
nav meya giran ya dibiriqe.
Ya bi tenê be, dê pîr wa bimîne.
Ava nake ya bêyî xanî be.
Tenê hişyar dimîne, vedixwîne dema payiz be,
nameyên dirêj dinivîse her
û li gor serê xwe digere mîna pelek piçiyayî.

Sohrab Sepehrî 1928 - 1980, Îran

Di 7ê Çiriya Pêşîn ê 1928an de li Kaşana nêzîkî Îsfahanê hatiye dinê. Şair û ressamekî Îranî bû. Ew li Îranê yek ji şairên muhîmtirîn ên serdema nûjen bû. Helbestên wî bi bal gelek zimanên wekî Ingilîzî, Fransî, Spanyayî û Îtalî ve hatine wergerandin. Yek ji pênc pêşengên bizava "Helbesta Nû" ye. Yên din jî Nîma Yûşij, Ehmed Şamlo, Mehdî Exvansales, Ferrux Ferrûxzad in. Di helbestên wî de însanhezî serdest e. Ji siruştê hez dikir û di helbestên xwe de gelekî bi kar dianî. Helbestên wî yên herî navdar û derketine pêş Sedayê Payê Ab (Dengê Piyê Avê) û Misafir (Mêvan) in ku Sedayê Payê Ab di zimanê Farişî de jî yek ji helbestên herî navdar û girîng e. Di 21ê Nîsana 1980ê de ji ber nexweşiya losemiyê di nexweşxaneyê Pars a Tehranê wefat kir.

Bangî rêvingiyê

Ka pêlavên min?
Yekî gazî kir: "Sohrab!"
Deng nas bû, mîna ba li pelan.
Diya min nivistî ye.
Herwa Menûçer û Perwane, belkî hemû mirovên bajar.
Şeva gulanê hêdîka dimeşe wek helbestên duyîn di ser kêlîkan re
lê bayê sahî ji pişt danga kesk ya beteniyê min xewa min radimale.
Bêna çûnê tê:
balguhê min tijî dengê şeprepa baskên hacîreşkan e.
Bi lez dê spêde bêt
û esman dê raguheze
tirarê avê.
Vê êvarê divê biçim.
Ez bi van re di pencereyên vekirî re dipeyivim
lê min peyvek jî ji dema me nebîst.
Tek çavekî jî matmayî dildarbûyî li erdê nenerî.
Tu kes ji hal neçû bi dîtina baxçeyê biçûk.
Tu kesî ji dil li qirrereşka li mişara zeviyê nenêrî.
Ewr dilê min didewisîne.
Dibînim di pencereyê re Horiyê
- keçika cîran -
ya pirtûkek dînî dixwîne
li bin seyrtirîn dardira dinyayê.
Hin tiştên ji van cuda jî hene, kêlîkine tijî banê esman
(bo nimûne: min helbestvanek heye
ya ku vemalî der feza ta ku esman
hêkek berda çavên wê,
yan: şevêkê
yek ji min pirsî:
"Rêya çend saetan hê maye bo rabûna tirî?")
Vê êvarê divê biçim.
Vê êvarê divê derînim
çanteyê xwe yê rêvingiyê yê tê de ciyê gumlekên tenêtiya min heye
û biçim bi wî alî ve
yê lê darên dastanî tîn dîtî,
berew valahiya bêgotin ya berdewam bangî min dike.
Yekî gazî min kir: "Sohrab!"
Ka pêlavên min

Li ser çavê şevê

şev dagirtî bû.
Ji ber rehên kajan rûbar dixwişî dûrahiyan.
Gelî bi tavheyvê hatibû rapêçandin û çiya wer zelal bû ku gengaz bû Yezdan bêt dîtin.
Em sekinîbûn li bilindahiyên,
qeraxa esman hinda, seviye hatibûn raşûştin, awir narîntirîn ji her dema şevê.
Destên te da min dest min destikê peyama kesk,
hilma te wa kir cerrickê dostaniyê hêdîka bişkê
û hilma dilqutînên min herikî tehtê,
meya kevn, xîzê germ yê havînê di demaran.
Birqa tavheyvê li raserî meşa te,
ey tu ya seyr, tu serbest, tu spehîtiya dinê.
Kêlîka kesk ya jîyanê giha hewayê sahî yê zozanan,
sî vekîşîn,
û hê, li ser rêya bayê spêdeyê,
aloleyên dihejin,
azweriyên diherikin hev.

Ji keskî ta keskî

Li nav tarîtiyê
ez dipûnijim li berxikek sîs
ya têt li mêrga westîna min biçêre.
Li nav tarîtiyê
dibînim li ber baranê
raberîya şil ya zenda xwe.
Wê baranê ya şil kir duaya yekem mirovê tîn.
Li nav tarîtiyê
min derî vekir li çerîngehên berê,
di yê rengzêrrîn yê em ji dîwarên çîrokan lê dinêrin.
Li nav tarîtiyê
min dîtin reh û rîş
û peyivîm ji terraşa ji mirina avê welidî re.

Av

Bila em avê neherimînin:
 belkî li jêr kevokek jê vedixwe
 yan dûr li nav daristanê çivîkek perên xwe pê dişo
 yan li gundekî cerek tê dagirtin.
 Bila em avê neherimînin:
 belkî diherike ber rehên spîndarekê ya tê de
 dilek bi derdan lewitandî dikare bêt pakşûştin.
 Belkî zelamek hejar nanê xwe yê hişk pê şil dike.
 Jinek spehî havî ber avê
 - bila em avê neherimînin -
 û rûyê bedew di avê re teyisî.
 Ax çi avek delal e!
 Ax çi avek zelal e!
 Çendî pak in mirov li jorî wê!
 Bila kaniyên wan bibilqîn, çêlên wan şîrî bidin!
 Min gundê wan nedîtiye.
 Li ber rehên tanên wan - bêguman - piyê Yezdan heye.
 Li wir ronahiya heyvê firehiya peyvan geş dike.
 Li gundê joriya çemî dîwarên ji axê - bêguman - nizm in.
 Rûniştvanên wî dizanin ka gulên çawan in binefş.
 Li wir şîrî heye, bêguman şîrî!
 Dema bişkojk vedibin, niştecihên gund pê dihesibin.
 Ew gundek e ku divê gund wisa bin.
 Bila awaz bijenin li kolanên gulistanên wî!
 Mirovên li serekaniyê ji avê fam dikin.
 Ew wê naherimînin;
 bila em jî ne.

- „gund wan bin“ hat sererastkirin ”gund wisa bin”

Ibn el-Farid 1181 - 1235, Misir

Di 1181ê de li Misrê hatiye dinê. Yek ji wan şairên herî mezin ên di edebiyata Erebbî de pêşengîtiya rêya îrfanê girtiye. Mijara helbestên wî zêdetir evîna Xwedayî ye. Ji ber vê yekê jî leqebê Siltanê Aşiqan lê hatiye kirin. Li ser fiqha Şafîî kûr bûye, piştî ketiye rêya îrfanê. Wextê xwe zêdetir li newala Mustedefan û çiyayê Meqtem ku nêzîkî Qahîrê bû derbas kiriye. Piştî vê rêya Mekkê girtiye, piştî seyr û silûka pazdeh salan vegeriya Qahîrê. Berhema wî ya herî navdar Qesîdeya Tayyê Mezin e.

Yê li pey wijdana xwe biç

Ger tenê hiş stêra rênîşander be,
 kes nikare bijî.
 Yê li pey wijdana xwe biç,
 wenda nabe dema li Yezdan bigere.

Mihai Eminescu 1850-1889 Romanya

Di pazdehê Çileya Pêşîn a 1850 de hatiye dinê. Şair, romannivîs, rojnamevan û romantîkê herî navdar ê Romanyayê tê zanîn. Dema ku endamekî çalak ê Koma Edebiyatê Junimayê bû, edîtorîya rojnameya Timpulê dikir. Berhema wî ya helbestê ya pêşî di şazdeh saliya wî de derket û di nozdeh saliya xwe de ji bo perwerdehiyê çû Viyanayê. Destnivîsên şair ên ku ji 14.000 rûpel û 46 cildî pêk dihatin ji hêla Titu Maiorescu di 25ê Çileya Pêşîn a 1902an de bi merasimekê ji Akademiya Zimanê Roman wekî diyarî hate dayin. Eminescu, di helbestên xwe de bi piranî mijarên dersiruştî, mîtolojîk û dîrokî bi kar dianîn. Gelekî di bin bandora fîlozofê Elman Arthur Schopenhauer de mabû. Ji 3ê Sibata 1889an heta 15ê Hezîrana 1889an li nexweşxanê tedawî dibîne û dawiyê dimire. Di 17ê hezîranê de jî wi li binê dara ixlamûrê de vedişêrin.

Perî

Perdeyên mija zîvîn
ji tavheyvê difûrin,
li raserî avê difirin,
li hindavî mêrgê digerin.
Gul hêdî dinehwirin,
tevnepîrk tevnê xwe dirêsin,
kevîrên dirr û gewher yên daristanê
li hewranê çîrokî yê şeva şîn diwerin.
Li beravê darên çamê
li birqa heyv û avê çavdêr in.
Di nav pel û çeçên daran re
tava spî û siya reş pev dilîzin.
Keçxanim serê xwe ji nav qamûş dertînin,
sorgulan bi avê de berdidin;
sihreke kevn e ko berê
bi nehînî û razdarî dihat vegotin.
Li awêneya rûyê avê,
li pira zîvîn a esman dinêrin
ka pêşeroj dikare bê dîtin,
ka Yezdan dê peyaman bişînin?
Sorgulên xwe diwerînin
da rûyan bibînin,
da razên şevê
bêrîkirina birçiyên têr bikin.
Belê, ew, delalên dilan,
li sîberên dor xwe dinêrin,
di şîniya çavên wan de
hemû çîrok dicivin.

1876

Bo stêrê

Dema stêr çirîskeke vedijenîne,
rêya wê dirêj e;
ta xwe bi me digihîne,
hezar sal ji demê dirêje.
Ew hê ji mêj ve vemiriye,
tarîtiyê ew daqurçandiye.
Lê dîsan jî
em ji nû niha wê dibînin.
Belê, em li stêra temirî,
li leylanokan dinêrin,
leylanên li ser serê me dibiriqin.
Wiha carekê jî evînê
ron kir şeva giyanê min.
Ew ji mêj de vemiriye
lê dîsan jî çirîska wê bi me re ye.

1883

Hevdîtin

- Daristanê, daristana min,
çawa demên te derbas bûne?
sal herikîne.
gav gerîne.

Li gelek rêyan likumîme
ta dîsan li vir vegerîme.

- Her wek berê:
Zivistanan tipîyan li derê
çeqên min şkandine,
avên min xetimandine
rêyên min di bin xwe ve niximandine
stran ji min verevandine.
Û her wek berê:
Havînan li vê derê
stran strandine,
bi rêyên ber bi kaniyan ve
jin bi cerên xwe ve hatine
da stranên tijîkeser bibêjine.

- Bi kanî, rêçik û rê,
tu yî her yê berê.
Dem diherike, dem diruxîne
lê te her dixemilîne.

- Sedsal tèn, diçin û li ser rê ne,
stêr her wek berê ne.
Dem çî dibin, bila bibin,
di nav çeqên min re ba digijin,
av bi Çemê Tuna ve diherikin,
rêya xwe her naguherin.
Tenê mirov guherbar e,
gerok e, carinan bêyar e.
Em çî bin her wer dimînin,
tu ji me naguherin:
derya, çem, avên din,
erd û bozkirên ser û bin,
roj û heyvên esman
bêdem in, bêpayan.

1879

Bi sedan keştî

Bi sedan keştî ji lengergehê
di ser deryaya fire re bi rê dikevin,
çend ji wan dê bèn daqurçandin
hemêza avê, hemêza ba?
Komek firindeyên koçer
xwe dilezînin wargehên dûr,
ma ewê bi rê ve netehisin

hemêza avê, hemêza ba?
Li pey bextiyariyê tu dibezî,
hevrê bi te re bin tu dixwazî.
Ji pey te axînan dikişîne
hemêza avê, hemêza ba?
Dilê mirov li dewrana demê
çerçekê diavêje.
Bi herherî jê re stranekê dibêje
hemêza avê, hemêza ba?

1880

Firindeyên biçûk

Firindeyên biçûk ên xewxwaz
bi êvarê re vedigerin malê,
nav darên hêlînan.
Şevbaş!
Kanî hêdîka dixilwîlin,
gul li nav baxçe dinivîn,
daristanên tarî bêdeng in.
Xweş rakeve!
Qû li ser avê xwe
diqelizîne kendavoka bînvedanê.
Fîrîşte jî parêzvanên xewa te ne.
Xweş binive!
Bi bêpêjnî heyva rûduru (kuulaskasvo)
li şeva hênîk dinere.
Hemû dikevin xewa aram.
Şeva te xweş!

1883

Daristanê, çima hurmîna te ye?

Daristanê, çima hurmîna te ye,
bê ba û bê baran
şeperepa çeqên dara te ye?
Bi rastî jî dihejim
çimkî dem ji dest min diçe,
roj direvin
şev dadikevin,
ji daran pel diwerin.
Wek mêdekê erd diximin,
stran nayên guhên min.
Siwarên bayên qeşayî
havîn dûr diajotin.
Firinde filitîne,
çeqên daran rût mane.
Refên hehecikan bi baskên armûşî
di ser lûtkeyên min re difirin,
baweriyên min diherifin,
xweşiyên min jî pê re diçin.
Didin xwe hilibikevin
ber qeraxa esmanên tarî dibin,
lê taqet û şiyar di baskan de namînin,
havîn li min venagerin...
Demên li pêş min
tarî û bêhêvî ne,
hevalên şeva min kul û xemgînî ne,
yên roja min rondik û girî ne.

1883

Tişteke din naxwazim

Tiştêk din naxwazim
heke li hengura êvarê,
li ber pistîna pêlan
bi aramî bikarim bimirim.
Daristan dê parêzvana min be
û xew dê şîrîn be.

Li raserî deryaya fire
valahî bêsinor e.
Dixwazim bê merasim
û bê gor bimînim
heke bikarim li bin siya darekê
serê xwe deynim ser derekê.
Bila kes jî rondikekê
bo min nebarîne.
Bila dengê strana payizê
xwe bigihîne daran rûtbûyî.
Heyv dê di ser esman re
bimeşe hemêza kajan,
xwişîna ava kaniyê dê bêdeng bibe
û daristan bikeve xewê.
Ixlamûr zêrevana ba ye.
Di bin axê ve jî
dê lorînên wê bên guhê min.

1886

Paul Eluard 1895-1952

Paul Éluard, di 14ê Çileyê Pêşîn ê 1895an de li bajarê Saint-Denis hatiye dinê. Navê wî yê rastîn Eugène Grindel e. Zrokatiyek gelek bi êş û jan bihurandiye. Di hivdeh saliya xwe de bi nexweşiya êşa zirav, ketiye nav nivînan. Piştê nexweşiya Bronşîtê bela xwe lê da. Ji ber êş û nexweşiya wî di leşkeriyê de karê namenivîsandina leşkeran û xwendina wan didinê. Di ber hemû van êş, jan û karên xwe re her tim kitêb li ber destê wî ne û wêjeya Frensî dişopîne û dinivîse. Pişt re rastî gelek wêjevanên xort tê; L.Aragon, A.Breton, R.Desnos, H.Arp, M.Ernest...û bi van re tevî Dadaist û surrealîstan dibe. Di sala 1924 ê de derdikeve rêwîtiyekê ku dê paşê ew bi xwe jî poşman bibe. Helbesta wî ya bi navê Liberte (Azadî) mîna sirûda azadiyê olan dide û di serhildanê de cihekî taybet digire. Di 18ê Çiriya Pêşîn a 1952an de li Parîsê bi nexweşiya dil dimire.

Azadî

Li deftera xwe ya fêrê
li darên maseya xwe
li xîzî li ser berfê
navê te dinivîsim

Li hemû rûpelên nivîsandî
li hemû rûpelên vala
li kevirî li xwînê li kaxezê li xweliyê
navê te dinivîsim

Li wêneyên zêrrkirî
li çekên şerrvanan
li taca paşayan
navê te dinivîsim

Li çolistan û dehlistanê
li hêlîna firrindayan li nokan
li dengvedana zarokiya xwe
navê te dinivîsim

Li seyriyên şevê
li nanê sîs ê rojê
li demên dezgirtî hev
navê te dinivîsim

Li zeviyan li qeraxa esman
li çengên çivîkan
li aşê siyan
navê te dinivîsim

Li her hilma elindê
li deryayê li keştiyan
li çiyayê şeyda

navê te dinivîsim

Li kefa ewran
li dilopên xuhokî yên bahozê
li barana tund û bêtam
navê te dinivîsim

Li dirûvên dibiriqin
li demjimêrkên rengan
li rastîniya fizîkî
navê te dinivîsim

Li şiverêyên haybûyî
li rêyên vebûyî
li meydanên di ser kinarên xwe re berfire dibin
navê te dinivîsim

Li lampeya hildibe
li lampeya ditemire
li xaniyên hatî hev
navê te dinivîsim

Li fêkiyê awêneyê
û odeya parvekirî
li doşeka xwe ya vala
navê te dinivîsim

Li seyê xwe yê hesûd û sernerm
li guhên wî yê durhîkirî
li destê wî yê goc
navê te dinivîsim

Li nêrdewana ber deriyê xwe
li tiştên nas
li hurmîna bayê pîroz
navê te dinivîsim

Li rûyê pencereya surprîzan
li lêvên hişyar
li raserî bédengiyê
navê te dinivîsim

Li stargehên xwe yên rûxandî
li bircên xwe yên hilweşî
li dîwarên bêriya xwe
navê te dinivîsim

Li dûriya bêbêrîkirin
li tenêtiya tazî
li gavên mirinê

navê te dinivîsim

Li saxiya vegerrî
li xeteriya rê lê hatî girtin
li hêviya bêbîr
navê te dinivîsim

Û bi hêza peyvekê
dîsan dest bi jiyana xwe dikim
hatim dinyayê da ku te binasim
da ku nav li te bikim

Azadî

Dildar

Ew li ser qepaxên çavên min radiweste,
pirça wê di pirça min re ye,
wê dirûvê destên min heye,
ew danoqiye nav siya min,
wek kevir nav esmanan.

Çavên wê vekirî ne herdem
û ew rê nade min binivim.
Xewna wê li taveroya tevav
rojê dike xwîsar;
min dikenîne, digirîne û dikenîne ew,
dipeyivîne bêyî tu gotin hebe.

Tu radibî

Tu radibî av belav dibe ji qatên te
tu xwe pal didî av dipîşkive dibe gul

Tu av î ya ko pişta xwe dide kûriya xwe
tu erd î yê ko rehan digire
û yê ko her tişt lê tê damezrandin

Peqikên bêdengiyê diafirînî li çolistana dengûdoran
sirûdên şevîn distirî li ser kevanên keskesorê
li her derê yî her tiştî dirûxînî

Gorî ciwaniya herherî dikî
agirê bêkêmasî yê demê
yê radipêçe siriştê û wê nû
dike
jinê tu diwelidînî bedenekê ya herdem eynî
ya te ye
tu nûbûn î.

Eino Leino 1878-1926 Fînlandiya

Di 6ê Tîrmeha 1878an de li Paltamo hatiye dinê. Şair û rojnamevanê Fînî yek ji pêşengên helbesta Fînî tê qebûlkirin. Ew bêtir dixwaze çanda Fînî ya keleporî bi terzekî nûjen bihone. Di stîla stranên gelêrî yê wekî Kalevala. Di xebatên Leino de evîn, bêhêvîbûn û siruşt pir zêde hatiye bikaranîn. Berhemên Leino yê helbest û çîrokan di ser heftêhî re ne. Di nameyeke xwede tarîfa jiyanê wiha dikir: “Jiyan her demê bi hêzên wê yê bêdawî re têkoşîn e.” Di sala 1926an de 47 salî dimire. Li Fînlandiyayê pir tê hezkirin û xwendin.

Di ser daristanê re roj hilhat

Di ser daristanê re roj hilhat
dema zerî li nav mêrgê digerî,
û gulên êvarê xwe veşartî
dîsan rûyê xwe yê girtî vekirin.

Û zeriya wisa delal
li nav mêrgê hêdîka meşî
û gulan devê xwe birin ber guhê hev
dema dangên kirasê wê ji gulavê şil bûn.

Dema delala min çû

Tiştêk te neda min, canê,
wek bîranîn, delal min,
ji bilî şûnpiyên te li beravê -
pêlan ew jî ji min standin.

Bahozan birî, bayan înayî

Ezê reben dema hatim dinyayê,
bihedan û hêmin bû her
mîna berî bahoz dest pê bike -
haya min ji tofanê nebû.

Lê paşî ewr vecivîn,
esmanê min tarî kirin

û birûsk şirqîn, av rabû -
min kir û nekir xelasbûna min nebû.

Mîna qirşikan baroveyan birim
dûrî dinyayê kirim;
lê dawî hat li yemanê
û bayan avêtim hemêza axê.

Ramanên mezin

Di berxwedana jiyane de
tenê ramanên mezin
dikarin mirovan hildin jor -
wa hatim fêrkin.

Lê sal û deman
ez hînî hindê jî kirim
ku ramanên zêde mezin
barê giran didin milê mirov.

Strana keça jandar

Bihurme, kevirê reş ê Dojehê,
biheje, çiyayê êşan!
Bihêre kerb û kînan,
kul û keseran,
bikelîne danê
gilî û gazinan!

Biherike, çemê Dojehê,
di ser pira miriyan re!
Bi xwe re bîna sinbilên xeman,
genimê derdan, cemedan dilan -
em dê bi pêxemet
dawetê têr vexwin.

Kêm maye
êdî dê ew dem bê,
yeman dê rabe,
dinya dê bimîne bin pêlên janan,
mirin dê miletan vexwîne
govenda keça Dojehê.

Bihurme, kevirê reş yê dojehê,
biheje, çiyayê êşan!
Bihêre kerb û kînan,
kul û keseran,
bikelîne danê
gilî û gazinan!

Wek reş û spî

Mîna pelatînkên reş û spî
li hindavî gulan bi hev re dipirpirin,
wiha kul û kêf
giyanê min dadigirin.

Mîna şev û roj bi hev re
ewrên havînan diperitînin,
wiha spêde û êvarên bextiyariyê
berdangên rojên min sor dikan.

Mîna zarokên jiyan û mirinê
li ber tavheyva payizê dilîzin,
wa payiz di şeva canê min de
gulên bihara lezgîn dixwe.

Bo destek min

Belê, tenêtî, dosta xeman
û dayika diltenik ya
ramanên mezin,
nêzîkiya wê germ e.

Dema dil şkestî û can tarî be,
bênteng û jiyan dijwarî be,
û gula baweriyê bêbêhn û çilmisî be,

dema şadî vemirî be û hêvî temirî be -

Wey, hingê çend xweş e
bi tenê bimeşî, bi tenê li nav şevên zivistanî
û li pêş xwe çolistanekê bibînî
û dûr li nav çembera xeyalan bigerî.

Wiha mezin, wiha aram e bêdengî
û pesna jiyane ji bilind deng vedide:
ji nav zeviya kedê gula şadiyê hiltê
û qencî ji bin axa xeman dertê.

Xumamî

12.

Wey, ma tê bîra te ew stran
ya me dema zaroktiyê digot,
dema şev dihat ber pencereyê -
wê stranê em şad dikirin.

Wê rehetî di dil de diçand
û bawerî dida xewê -
ger hê ew stran bêta bîra te,
niha bistre, wê stranê bêje, wey!

Sed û yek stran

2. ARAMÎ

Çi ye ev bêna gulan li dor min?
Çi ye ev bêdengî?
Çi ye wateya vê aramiya di dilê min,
vê tenahiya mezin, seyr û nû?

Dibihîzim, çawan kulîlk dipişkivin
û dar dipeyivin li nav daristanê.
Bawer dikim, niha digihim xeyal
û hêvî û xebatên dûr.

Her tişt wiha bêdeng e li dor min,
her tişt wiha xweş û geş.
Gulên mezin vedibin di dilê min de
û bênek kûr ya rehetiyê didin.

9. STRANA SPÊDEYÊ

Deng vede, strana min,
bilind vede!
Spêde dertê,
pêl li beravê dide.

Binive, dilê min,
xewek bedew binive!
Bibîne, çawan pê dihese
hemû xelk û alem

Bifire, evîna min,
di ser çiyayan re, bifire!
Çiya jî nabin asteng
li ber evîna ciwanan.

12.

Bide ez veşêrim danga te
serê xwe yê giran, yê nesax,
bihêle biavêjim danga te
vî dilê xwe yê bidax.

Erd wa xirîxalî ye,
tenê tu tijî yî mîna şevê
ya li esmanê wê stêr diçirisin,
ya li ber sîberên wê dil lê didin.

Ax, şeva min ya nerm û narîn,
şeva min ya gewer û gewr,

bigire koşa xwe vî zarokê westiyayî!
Min pir germ û gurr e.

20.

Bextê min kulîlkan dide wek darsêvan
li şevên biharê yên ron,
dema gupikên kajan dadiçemin
û zarok di xewn û xeyalan in.

...

66.

Ji min wiha bû
qey em li ser avê bimeşin
û tav germ bike pêlan
û sînga zinarên beravan.

Wiha bû qey em daketibin
bin wê tehta bedew
û me hilkolandibe jê axa spî
û raguhestibe serê girikî.

Û ma ne roj ava bû
pişt giravan, devê tengavan,
û hat êvar û daket şev
nav geliyan, ser daran?
Bû govend û dîlana şevê,
mijê bi pêlên deryayê lîst,
li ber xewê cokên geliyan
avjenkî û melevanî kirin.

Ji çeçekî xwe avêt yek dî,
ji gulekê hilket yek dî,
dest di hev de em rawestî bûn
û me lê dinêrî ka ew çawan verevî.

Ax, çend kurt e şeva havînê!
Aniha dê roj ji nav pêlan hîlbêt
lê ta hingê dê ramanên min
li nav pêlên xewnan bimeşin.

72.

Heyva şermok bi rêya xwe ve dimeşe,
şeva biharê bedew û pîroz e.
Hê ji mêj ve ye dema veqetînê ye
lê hê jî me herduyan heman doz e.

Bakê şevê hêdîka dilorîne
pelên gulên di xewnan.
Dilê bédeng lê dide dizane
hêviyên mezin yên havînan.

76.

Wa min li te nêrî, zerî,
wek gul li xemla xwe.
Wa min li te kir guhdarî, zerî,
wek gelî li robarê xwe.
Tu gul pişkiviyî di dilê min de,
bûyî awaza dilşadiya min.
Te şiyar kir bihar li ber min,
te kir stran kaniya min.
Te bayek bir û babelîskek anî.
Lew niha dilşadiya min
wek gula bêxeml e,
sînga min niha bûye
çemê av lê qerisî.

Li ser gora Z. Topelius

Xweş binive
li geliyê guldar,
xweş binive
di danga dayika dildar.
Gelek xweş e nivistin
bo yê kar nekirî nehiştin.
Aramî ye para
têkoşer xebatkara.

Mirin dimeşe,
gul diwere, dar diweşe.
Yê qehreman
dikeve dilê niştiman.
Xweş binive,
te strî li rêya me nehişt,
xweş binive
di gora herdem-bihişt.

Strana bextiyariyê

Kî bextiyar be, bila bextiyariya xwe veşêre,
kê gencîne û xezîne hebin, bila wan biniximîne,
û bila bi tenê bextiyar be ji bextiyariya xwe
û zengîn ji gencîneyên xwe.

Bextiyarî xwe li ber awirên xelkê nagire.
Yê bextiyar be, bila biçê çolê
û bédeng bijî, belê, bédeng li çolê
û bila bédeng bextiyar be ji bextiyariya xwe.

Strana agirî

Yê agir be, bila agirî biperêse.
Yê ji axê be, bila bibe ax.
Lê yê bixwaze bigihe ber perrên esmanan,
ev e jê re awaza yê sazvan:

Gelo em çi ne? Tenê xwelî, toz?
Ne tam: Raman ji axê çêdibe.
Qedera te ye carekê bibî xwelî
lê ta hingê agirek geş be.

Çi ye agir? Madde ye. Çi wî geş dike?
Yezdan, giyan, viyana ebedî.
Jî kurt e lew geş hilbibin.
Ax dimîne lê giyan digihe esmanan.

Camî 1414 – 1492 Îran

Di sala 1414an de hatiye dinyayê. Fîlozof û alimê mezin ê Îranî ye. Di edebiyata Erebi û felsefê de kûr çû û bû yek ji zanayê mezin ê Îranê. Di nav felsefa îrfanê de yekî pir girîng tê qebûlîkirin. Perwerdehiya medresê girtiye û li ser problemên matematîkê sekiniye. Di zemanê xwe de wekî ellame hatiye binavkirin. Ji xeynê felsefê gelek helbestên bi Erebi û Farisî nivîsandine û herwiha bi muzîkê re jî elaqedar bûye. Helbestên wî yê bi navê Yûsuf û Zuleyxa û Leyla û Mecnûn hene. Di edebiyata klasîk a Îranê de xwedî cihekî mezin e. Di sala 1492an de wefat kiriye.

Ger gul kulîlkan bidin di dilê te de

Ger gul kulîlkan bidin di dilê te de,
tu bi xwe jî dê bibî gul.
Ger bilbil di dilê te de bistrin,
tu bi xwe jî bilbil î.
Ger Yezdan li ser textê dilê te be,
tu jî dê mîna wî lê bê.
Niha tu tenê piçkokek î
lê dê carekê bibî hemû.

Yamanoë no Okura 660 – 733 Japon

Derbasbûna demê derd e

Bêçare
meh û sal
li vê dinyayê diborin
û me bi çemê xwe ve dibin.
Bi sedan derd me digirin,
nahêlin bîskekê bêhna me fireh bibe.

Keç û zerî
dest û zendên xwe
bi gewerên biyanî dinexşînin.
Destê hev digirin,
ciwan û cehêl
cejn û şahiyên dikin
lê nikarin demê rawestînin,
neşên berdewam rûgeş bimînin.
Gencatî zû derbas dibe:
hê baş pê nehesiyayî
te hind dît ku
xwîsarek sîs ketiye ser pirça reşî qetranî,

Xwedê dizane
ka ji ku ve peyda dibin
qurmiçk li rûyê sor.

Kur û lawik
şûran li navtenga xwe hildigirin
û kevan di destan de ne,
zînên hespên xwe dinexşînin,
pê li rikêbê dikan,
bi quretî ji şahiyekê dilezin ya din
mîna ku jiyana wan dê ebedî be:
deriyên xewxaneyên zeriyan vedikin,
ji dizîkî ve dikevinê.

Dest destan digirin
lê gelek şevan
li gel keçan nanivin:
te hind dît ku gopal di destî de ye.
Dema ku mêr pîr bû, ku ve biçê jî
yan tinazî lê tên kirin
yan jî nefret lê dibare.
Wiha em bi jiyana xwe ya pûç ve
diçirrikin,
em naxwazin ew biqede
lê ma çî ji destê me tê?

Xwezî ez
zinarek ebedî bûma –
lê mirovek mirbar im
û nikarim
derbasbûna demê bisekinînim.

Musō 1275 – 1351

- xwîsar: ava ku bi şevê cemidiye û bûye mîna berfê
- „bisekinîm“ hat sererastkirin ”bisekinînim“

Wek xunavekê di xewê de

Wek xunavekê di xewê de
ez hatim vê dinyayê.
Dilê min sivik û hêsa ye:
wek xunavek spêdê
ezê carekê hinda bibim.

Laotse, nêzikî 500 bz

DESTJÊBERDAN TEMAMMAN E

Destjêberdan tamamman e
xwetewandin piştrastman e
valabûn tijîman e
hatinbikaranîn nûman e
kêmhêbûn zêdetirwergirtin e
zêdehebûn şaşman e
loma yê hişmend tenê yekê dibijêre û
bo hemî welatî nimûne ye.
Ew xwe pêşkêş nake loma ronahiya wî geş e,
nabêje ku rast e loma qedirbilind e,
pesnê xwe nade loma bi ser dikeve,
xwe mezin nahesibîne loma xurt e,
hevrikiyê nake loma tu kes nikare bibe hevrikê wî.
Bi rastî, tenê bi vegefnê mirov dikare tamam bimîne.

- destjêberdan: devjêberdan, xwe lê nekirin xwedî, ji kesekî din re dan
- tamamman: tamam û kamil man, bêkêmasî man

Mihály Vörösmarty 1800 – 1855 Macar

De lêde, mitirbo!

De lêde, mitirbo, te destheqê xwe xwar,
lêde û lingan rake govendê!
De têke, berdestiyo, çipek meyê berde tasê,
ev nanê tursî bi avê naçe xwarê.
Dinya wiha ye, ji dizîkî ve diguhere,
geh diqerise, qeh dişewite.
De lêde, ma kî dizane ka kengê
dê li şûna kevanê kemanê
hewceyî gopalê gerînê bibî.
Xem dilî dişewitînin, mey devî,
de lêde, mitirbo, min hew ji te divê!

Bila xwîn wek zivrokên robarî bifûre,
bila mejî bisincire û çirûskan hilavêje,
çav wek stêrên rijok biqurmijin,
ji gijlokê gurrîr lê de
jixwe wêran bûye mal û milkên me!
De lêde, ma kî dizane ka kengê
dê li şûna kevanê kemanê
hewceyî gopalê gerînê bibî.
Xem dilî dişewitînin, mey devî,
de lêde, mitirbo, min hew ji te divê!

Anku de lêde, yan na, dest jê berde;
dê carekê dema cejnê bêt vî warî
gava ku bahoza kerb û kînê vemire,
meydan ji xwînê zuha bibin, birîn bikewin.
Hingê ji nû ve bi coş lêde,
dilê xwedayan mendehoş bike.
Dest biavêje kemanê, lêde, bi rûyek geş
yê ku îro gelek tarî ye.
Anku bi meya xweşî û zewqê dilî dagire,
lêde û hew xemxwer be!

- nanê tursî: nanê tusî/tisî, nanê ku ti pêxwarinek pê re nîne, nanê ku bi tenê tê xwarin

Li Po, Çîn (li gor Ezra Pound 1885 – 1972, DYA)

Li ber pira ten-shin

Adar gihîştiye ser pirê,
çeçên darxox û darmijmijan li ber deriyê kelhê daçemîne.
Her spêdê gulên ji cûnên cuda dilê min şeq dikan
û êvar wan berdide avên ber bi rojhilatê ve diherikin.
Kulîlk bi ber avê ketine, avên borî, avên diborin û avên gerok
lê mirovên niha ne yên berê ne
tevî ku ew jî xwe li ser pirê ditewînin.
Rengê deryayê ji cihê xwe dileqe dema ku spêde dertê
û mîr hê jî li ber textê xwe bi rê rawestayî ne
û heyv şewqa xwe dide dergehên Sei-go-yonê
û xwe li dîwaran û keviran radigire.
Bi kumên li ber tav û ewran dibiriqin
serdar ji serayê ber bi tixûbên dûr ve bi rê dikevin,
hespên wek ejdehayên
bi zînên zêrîn,
xelk ji ber simên wan bi ser hev de dikevin.

Qurre ye meşa wan,
qurre ne pêngavên wan dema ku tîn şahiyên,
eywanên bilind, ser sifreyên xwarinên nadir,
ber hewayê gulavkirî, bal keçikên reqqas,
stran û awazên bilûrên zelal,
govenda heftê cotan,
nêçîra bi lez li nav baxçeyan.
şev û rojan gorî zewq û şahiyên dikan
û bawer dikan ku ev dê hezar payizan bidome,
payiz dê jê newestin.
Lûrîna seyên zer jî wan dilgiran nake,
ma ew çî ne li xanim Riokushu
ya ku kerb û kîn dikeland!
Ma kî ji wan dê hevberî Han-rei be,
hevberî camêrê ku bi tenê li gel yara xwe çû,
keçik bi pirça vekirî, mêrik ajovanê belema xwe.

- «liu» hat sererastkirin « li »
- « lûrîn » dengê wek yê guran

DESTPÊKA BIHARÊ Li Ch'ing Chao 1081 – 1150

Li nav vê berfê jî
dizanim ku peyama biharê hatiye:
tevî ku sar e jî, darhilûkê
çeçên xwe yên mircanî nexşandine,
bişkojên nîv-vebûyî yên bêhnxeş

li kenarên baxçeyî bi coş dihejin
wek zeriye ku piştî balavê
dîsa rûyê xwe reng dane.

Xwedê mirada min hasil kiriye
û dihêle ku heyva geş
wek gewerekê şewqa xwe bide dinyayê.
Werin em niha meyê
ji tasên kûr binoşin!
Xwe giran neke! Vexwe û mest bibe!
Ev bihar ne wek yê berê ye!

STRANA AWAZÊN HEVBEŞ Çang Heng 78 – 139, Çîn

Qederê em gihandin hev,
niha tu li gel min, li odeya bûkaniyê dijî.
Bi coşî yekem cotbûna me tê bîra min,
dilerizîm wek ku destê xwe
bikim nav ava kel.
Ez ne şareza me
lê teksîriyê nakim
da ku erkê xwe yê jinaniyê fêr bibim.
Li mala me ya hevbeş serwera kulîne me,
beşdarî merasiman dibim
û di cejna qurbankirinê ya payizê de arîkar im,
dixwazim hêsîla li ser textî bim,
banê xanî û beteniyê hevrişmî bim
da ku te ji ba û sarmayê biparêzim.
Nivînan dadiweşînim û firçê pak dikim,
gulavek nadir li xufikan dikim,
cotedergehan bi qerraseyek zêrîn qepat dikim.
Li jêr û jor çirayên gulgulî dibiriqin;
xwe vedişelînim, boyaxê ji rûyê xwe dişom
û bendewarî te dimînim;
pirtûka wênedar vedikim û datînim ser balîfkan.
Zeriya Spî pozisyonên cuda-cuda nîşanî min dide,
zêdeyî deh hezar pozisyonan
ku kêr mêr tu car diceribînin.
Pîrê Esmanan ew fêrî Qeyserê Zer kirin.
Nîne tu zewq di ser ya vê şevê re.

Ma dê çawa li pîriyê jî wê ji bîr bikim?

- hêsîl: berrîkên/mehfûrên ku ji qamîş hatine çêkirin
- betenî: batanye, nivînekî dişibe lihêfê ye

HER TIŞT DIGUHERE
Han Shan, sedsala 7ê, Çîn

Kulîlkên darxoxan dixwest
ku hemî havînê pişkivî bin
lê ba û heyv nasekinin.
Ji mirovên berê
tu kes sax nemaye.
Roj bi roj pelgên kulîlkan diweşin,
sal bi sal mirov diguherin.
Cihê ku îro toz lê radibe
carekê deryayê lê pêl didan.

- "darxoxaxn" hat sererastkirin "darxoxan" anku darên xoxan"

QERQEŞEYA VÊ DINYAYÊ TEK ÇARE YE
Li Yü 937 – 978

şeva borî baran bû û ba dihat,
perde û pencereyan
bi dengên payizî xije-xij dikir.

Find vemirî, demjimêrka avê sekinî
û hemî şevê min pala xwe dida balguhî;
li ser piyan bim yan jî paldayî,
nikarim aram bibim.

Heysûbeysa vê dinyayê
wek ava robaran diherike,
hemî jiyan xewnek hejhejok e.
Qerqêşeya dinyayê
tek rê û çare ye,
bi wê ve bimeşe, dest jê bernede!
Tehemila tu rêyên din nakî.

Palladas

Her roj spêdeyê em ji nû diwelidin
ji duhî ti bo îro namîne
ya heyî ew e ya îro dest pê kiriye
lew tu, pîremêro, pesna xwe bi salên xwe nede
ya borî ne ya te ye.

Gu Çeng, 1956 – 1993, Çîn

Gora min axînk nevên

Gora min
gul û kulîlk nevên,
axîn û nalînan naxwaze.
Min tenê divên
çend spîndar divên
ku wek birayan
bi dilxweşî rawestin
û mêrgek kesk
ya ku li ber bayî pêlan bide
û tav û ewrên
ku bê dawî bi hev biguherin.

KERAMET

James Berry 1924 –

Spasî bo guhî
ku mirov dikare pê bibihîze.

Spasî bo bînahiya çavan
ku mirov dikare pê bibîne.

Spasî bo destan
ku mirov dikare pê dest lê bide.

Spasî bo heyva sîs ku geş dibe,
perdeya şevê radike
û gund û bajaran digihîne hev.

HEMÎ DISTRIN

Siegfried Sassoon 1886 – 1947

Hemîyan ji nişkê ve dest bi stranekê kir
û şadiyekê dilê min dagirt,
şadiyek ku firindeyên rekehkirî
hest pê dîkin, li azadiyê, li firrên kûvî,
li nav baxçeyên spî û zeviyên keskî tarî:
pêşve – dûrî dîtina çavan.

Dengê her yekê ji nişkê ve bilind bû:
û bedewî wek roja li ber avabûnê zêde bû;
dilê min di nav rondîkan de dilerizî
û tirsê xwe veda... oy, ji xwe her yek
firinde bû û stran bêpeyv bû
û stran tu car xilas nabe.

MEHA ÇARÊ
Vladimir Holan 1905 – 1980

Mija nîsanê. Tîrêjek tavê
wek gopalê koran newêrek
gav big av li rêka xwe dihezîqe
lê niha ji hefteyekê berê jixwebawertir.
Destên sar, dilên germ.

Te jî hay ji tiştêkî heye... Lê ne zêdetir.
Ger talûke bi ser te de bêt, bêparastin î.
Ger bextê te xweş be, bêhêz î.

JI ŞAGIRDIYÊ BÛN HOSTE
Qeşe Gibbon 1896 – 1987

Jiyan wek xewnekê ye:
nizanim ka wê çawa dest pê kir,
zanîna min jî têra nake
bibînim ka dê çi bibe.

Ji nav tarîtiya şevê firindeyek
ji nişkê ve bi lez
di odeya ronkirî re firî –
û li vê derê namîne.

Dîsa ew
li tarîtiyê vedigere.
Wiha dibêjin pîrezana,
ez jî heman tiştî dibêjim.

Lê em qîma xwe bi hindê nânin,
ne ez, ne jî ew,
em ji her pêrgîhatiyê dipirsin,
li tiştêk nû digerin, çi be jî.

Ji her kesê dibînim re dibêjim:
“Ev qas fêm dikim
lê dixwazim guh bidim te
eger tiştêk zêdetir bizanî.”

Odeyek tarî, ronkirî,
firinde, fir
ne bes in bo mirovê
ku ji vir bi rê bikeve.

Ne bes in bo mirovî
firindeyê ku carekê
ji tarîtiyê difire ronahiyê
û vê derê namîne.

“Ger hê tişteki bizanî,
ey giyanê hişmend, geroko,
ji min re jî bibêje
berî ku dawiya dema min bêt.”

- pîrezana: zanayên pîr (wek pîremêr: mêrên pîr, pîrejin: jinên pîr)
- ”tonahiyê” hat sererastkirin ”ronahiyê”

SIBÊ, NA
Bei Dao 1949 –

Ev ne xatirxwestin e
ji ber ku me tu car hev nedîtiye jî
tevî ku sîberên me carekê
li ser rê li hev ketin jî
wek tawanbarek bi tenê li reva xwe.

Sibê, na
sibe ne piştî şevê ye,
yê ku hêvî bike tawanbar e,
bila şev be dawiya wî
yê ku aîdî şevê ye.

BO XORTÊ TIRIMPÊLAJO
Kwang Kyn 1941 –, Koreya Başûr

Tu êdî bi tirimpêla xwe digerî
û gelek kes hesûdiyê bi te dibin.
Dema ku te xwe fêrî ajotinê dikir,
dîmenên li ber te bêsînor bûn,
te bawer dikir ku tirimpêla te difire her derê.
Her şarezayiyek nû baş e,
min digot.
Niha êdî pê lê didewisînî û dixijînî,
êdî te hay ji kirasên nû yên daran
li guherîna demsalan nîne,
ne dikandaran, ne fêkiyan
masiyên li ser maseyên firotinê,
ne jina ku dibeze û ne jî
zarokê nexweş yê di buxçika
li piştî wê de dibînî.

Divê te hay ji polîsê trafîkê.
ji çirayên sor hebe,
çavên te req li rê bin,

bi temamî ber bi bayê ve
bînahî wisa zelal dibe
û lez dilî digire
û digel ku benzîn
her girantir dibe
û dûxan çavên te kor dikin,
tu her ajotina xwe didomînî
û qet nafikirî ku bimeşî
û hemî salên ku
kesên xort û ciwan bi asayî
dimeşin û dibezin
yan li otobûsê û metroyê siwar dibin,
tu li ser şêst kîlometreyan difirî.
Dema dibînim ku di ber min re diborî,
diramim ku tu hê zû
ji mirovan dûr ketî
û bo halê te dilgiran im.

Paulos Silentarios, ??? - 575, Imperetoriya Bîzansî

Du helbest

Bêkêr e tu kes bitirse
ji tîrên evînê êdî:
Erosê telew meya xwe vala kir min
Bêkêr e tu kes bitirse
ji çengên wî êdî
bi stemkarî wî da ser sînga min
û li ser e û nafire
perên baskên xwe hemû werandine
* * *

Ji xwe bike cilan, cana min,
bila em rûs bin
çiyê tu nake
di navbera me
etekê te jî
mîna keheha Semîras e!
Ji xwe bike
bila sîng bigihê sîngê
lêv bigihin lêvan
paşî
bêdeng
tehemila
gazinên evînê min nîne

Li berava Bretagne

Paul Celan 1920 - 1970, Romanya, Fransa (bi Almanî dinivîsî)

Hatiye hemûya me dît
da xatirê bixwaze ji min û te:
deryaya bo me şev avêtin beravê,
xîzê digel me di nav wan re firrî,
û li jor sor mîna jengê gezikistana
li nav wê dinya li me qewimî.

Axel Fredenholm

Elinda sibê

Elinda spêdeyê
Binêre, elinda spêdeyê
kirasê xwe li çiyayan dike
û bedewî bi sîngek vekirî dileze
tava zelal hemêz bike.
Sirişt eywanên xwe yên delal vedike
û her tiştê dirûv, deng û giyan hebe
pesna jiyane û hêza wê dide
û bextiyarî her derê dadigire.
Lê awirên xatirxwestina rojê tijî rondik in
ji ber wan yên ne tu tişt dîtî
û ne jî ti fêr bûn,
ji ber hemî wan xwelîserên kerr û kor
yên ji tu tiştê bedew û pîroz hez nekirin.
* * *

Dema roj ava dibe û tarîti diniximîne
meydanên gewr û xaniyên mêwan rapêçandî,
em guhên xwe rabeî pistîna ahengdar
ya kaniyek razber dikin.
Wa distire bi salan dil
li ser xweşiyên û reşiyên biharên borî,
li ser her tiştî yê me wêriye, yê em jê êşîne
yê em lê gerîne û me serpêhatî jê wergirtine.
Û dîmenên delal ji salên raborî
dîsan tîn bîra me
û dengbêj û şairên zemanan dîsan
vedihûnin wan stiranan yên hema ji bîr bûbûn.
* * *

Hene hin kêlîk ku nayên jibîrkin,
û dengên awaza wan her dimîne
dema bi îlhama hesretê di me re diherikin
wek muzîka bedew ya bêdawî.
Lê hê îro jî bihar diyariyan bo me diîne
û Yezdan dadigire siriştê bi muzîkê
û bi gelek cûn şênahî û bişkoj
govanên romantîkaya afirmandiyê ne.
Bila bişir û girnij ramale
ewrê tarî ji rûyê te.

Ne tenê axîn û oxîn rast in,
cejn û şahî jî.

* * *

Bi xemsarî çavên xwe dimiçînî.
Guh nadî peyvên şiyane bidin.
Piyaleya jiyanê mişt dikî
bi meya pûnijên tarî.
Armanca ramanên te çi ye?
Ma te ji bîr kiriye - ma ne carekê ciwan bûyî?
Ji sirişt ve em naşibin hev lê şînî
û şadî me bi hev re parve kiriye.
Dibêjî ku li ser te giran sekinîn
xewn û xeyalên xortaniyê.
Dema êdî bi belayê dihesî,
ji nû dixwazî bi mêranî bo azadiyê bixebitî.

Min vexwe

Katri Vala 1901 - 1944, Fînlanda

Perdaqek im di dest te
zelal û nazik.
Lêvên te pê ve ne.
Ma di ser çi ziwastanê re hatî
ku wa tîn î?
Min vexwe! Min vexwe!
Min ji mêrgên jiyanê civandin
têna tavê û xunava kulîlkan,
şerava fêkiyên beyar,
pêla li peravê dida,
gulên stêran,
şahî, şînî,
tenêtî, mirin

Min vexwe!
Destê mîrê jiyane
dê dîsan
min dagire.

- ziwastan: devera ziwa, hişkistan, beyaristan, dêmistan, sehra, çolistan, berrî

Dem lal e

Giuseppe Ungaretti 1888 - 1970, Îtalya

Dem lal e di nav rûlên naqeliqin re...
Ji belemgehke dûr belemek bi serê xwe digerî...
belemvan betilî, naşî... Esman
bûne kendên dûdar...
Bo yê xwe bi rihên bîranînan ve girtî
ketin belkî felat bû...
Wî nedizanî
ku eynî şaşî ne dinya û dil,
ku di efsûneya pêlên xwe de
her dengê dinyawî dê daşkê.

Agir Géza Képes 1909 - 1989, Mecaristan

Saetê xwe li çarê da,
roj êdî li ber avabûnê bû:
ji pencereyan gurmijek sorî sifrî vedijenî.
Dixuya lezûbeza herî zêde
veçopiriye:
westayî tramê xwe radiçûrand,

û otobusê xwe radixwişand pêşve
 bi sisto-mistoyî û hejhejokî
 mîna gamêşokên avî.
 (Dengê wan nedihat
 ferqkirin.) Mirovan xwe radikişand
 wek mêrîkên hêdîmeş.
 Keşiyên sor, xalxalokên hûrik,
 dikoşîn jêlilî çemê Tûna.
 Ji nişkê rojê tava xwe derda
 û agirek bêtixûb li erdê hilkir,
 çirûsk jê vejenîn ber esmanan.
 Û taviî hinda bûn ji ber çavan mirov
 û dinya, tişt, herrik, dar -
 û ez bûm kor, kerr,
 min tenê ew dîtî, tenê çirûsk.
 Agir - bo kê? Nexu ez dizanim!
 Yê bêguneh divê her ezyetan bikişînin
 ji ber gunehên erjeng yê serdemê.

- mêrîk: mûrî, mûristan, gêrik
- nexu: nexwe, jixwe, manê, nê

Ji biharê ta payizê
Jerzy Harasymowicz 1933 - 1999, Polonya

Biharê
 rûdinim helbestekê binivîsim.
 Bo peyvekê lê zêde kim
 dest bi pûnijînê dikim.
 Taviî perr
 ji dest min difirrin
 payizê
 radigihînin.

Kî helbestvan e
Tadeusz Różewicz 1920 -, Polonya

Yê helbestan dinivîse helbestvan e
û yê helbestan nanivîse
yê xwe ji zincîran xilas dike helbestvan e
û yê xwe zincîr dike
yê bawer dike helbestvan e
û yê bawer neke
yê derew kiriye helbestvan e
û yê derew jê re hatiye kirin
yê ji destê xelkê xwariye helbestvan e
û yê dest birriye
yê dev heye helbestvan e
û yê rastî daqurtandiye
yê ketiye
û yê rabûye ser xwe
yê derdikeve helbestvan e
û yê dernekeve.

Stiranek bo biharê
helbestek eskîmoyan / înuîtan

Bi qeyikê çûm
û gihîştîm
bejayiyê.
Bi gumtilek berfê ketim
yê ku aha dest bi helînê kiribû.
Û min hay jê bû
ku êdî bihar e:
em ji zivistanê rizgar bûbûn!
Û ez tirsîm
ku ez dê zêde qels bim,
zêde qels
lew dê xwe li ber wê bedewiyê negirim!

Kêlîka venagerre
Paul Verlaine 1844 - 1896, Fransa

Heyv şewqê
dide daristanê;
her çeq, her dar
dengî vedide;
dinya sihrî ye...
Dema evînê ye.
Ji neynika avê
li nîveka şevê
bih diteyise;
çeq zeft dîkin
giriye bayî...
xewên şiyar dibin.
Wa nerm
belav dibe bêdengî;
wa geş
berfirehiya esmanan
ronahiyê dirêje...
Ew kêlîk venagere.

Dinya êvaran delal e
Pär Lagerkvist 1891 - 1974, Swêd

Dinya êvaran delal e.
Hemî eşqa esmanan hingê
berhev e bo niximandina ronahiyê,
veşartina mal û milkan.
Destê dilovaniyê li ser hemiyê ye,
Xwedê bi xwe kinaran tarî dîke

Nelly Sachs

1891 - 1970, Almanya

Zimanên têrxwê yên deryayê
dialîsin mircanên nesaxiya me -
Sorgulek li qeraxa esman,
nîne toz
tenê şev
dadikeve welidîna te -
Li vir di nav xîz de
razeşana wê ya reş
li demê alandî
dirêj dibe mîna pirçê
di mirinê de jî.

Biwerin, pel

Emily Brontë

1818 - 1848, Brîtanya

Biwerin, pel, bimirin, kulîlk!
Bila dirêj bin şev, kurt bin roj!
Her pelê dadikeve bo min
peyvek nerm e: bihede!
Û dema baxçeyê min dibişkive
bi kulîlkên xwîsar û qeşayê,
amade me bo şevê;
bila ruxandinkariya rojê zû neyê!

Jêkirin

William Carlos Williams 1883 - 1963, DYA

Li wir bûn ew sorgul, li ber baranê.
Li wir bihêle, min jê hêvî kir, wan jê neke.
Li wir jî xwe ranagirin, got.
Lê ew pir delal in,
tam li wir.
Wey wey, bedew bûn carekê em hemû, got,
ew jê kirin û dan
dest min.

Û aniha êvar e
Salvatore Quasimodo
1901 - 1968, Îtalya

Her yek bi tenê li dilê dinyayê
bi tîrojê şeqkirî:
û aniha êvar e.

Wek stranên şîniyan yên berê
T'ao Yüan-Ming, 365 - 427, Çîn

Li ciyê jiyan hebe, mirin jî heye;
mirina zû ne ji leza felekê ye.
Duh êvarê ew sax bû digel me,
îro mirî ye di deftera miriyan.
Can jê veqetiye. Dê kû de biçê
dema ciyê bedena çilmisî darek xulole be?
Zarokek delal bi giryokî li bavê xwe digere,
dost bi xwe digirîn dema me aşt dikin
lê wî bi xwe êdî hay jî nîne ji xweşîyan, nexweşîyan,
ne ji qenciyan, ne ji xirabiyan.
Piştî hezar payiz, deh hezar sal borîbin
ma dê kes bizane þerefa wî yan şerma wî?
Tek mixabin ew e ku li vê dinyayê
wî tu car têr mey venexwar.

Nobedar
Alun Lewis 1915 - 1944, Brîtanya

Min dest bi mirinê kiriye
 çiku taliyê tê gihîştîme
 ku nikarim bi ti awayî ji şevê birevim.
 Tu xewn,
 qet tu wêneyên bi leza xewnan
 li çavên min yên belçermikane nade.
 Hişk hilawîstî me bi banê berdayî yê şevê ve
 û bêxew nobedarê xewistanê me.
 Min hêlane
 bedenên spehî yên keç û kuran
 kûr li hambêziyek henûn
 û hêlane kuçeyên keşxe yên xewê
 yên evîndar pêxwas lê dimeşin
 ber bi vê dawîn qiraxa ramanê ya sar nobedariya wê dikim.
 Min dest bi mirinê kiriye,
 bêpêjniya bêhedan ya top û tifengan
 xortanî, pîrî, bênvedanek reş e
 di gula kerbê de, di gulbûka pelên xwe girtî de,
 di şevê de.

Xumamî
Manuel Altolaguirre 1905 - 1959, Spanya

Were, dixwazim xwe rûs bikim!
 Ronahî nemaye, û ez
 bi cilên xwe ve kerixîme.
 Min rûs bike, da ku ew bawer bikin
 ku mirime. Hemû şevê
 rûs nivistim
 dema wan nobe li xew(n)a min digirt.
 Çiku spêdeyê zû
 ezê ji rûsatiya xwe derkevim
 û çim ser çemî û xwe şom.
 Şikilê min bide cilan,
 dê her li bîra wan be.
 Were mirin, ez zarrok im
 û dixwazim xwe rûs bikim
 çiku ronahî nemaye û ez
 bi cilên xwe ve kerixîme.

Rafael Alberti Merello 1901 - 1999, Spanya

Di

Şervan miriye

Şervan miriye. Se
harbûyî lê direye.
Şervan miriye. Çem
ji dûr hat lê bipirse.
Şervan miriye. Daristan
ji piştê radibe her spêdeyê û digirî.
Şervan miriye. Zarok,
sivik wek hewa, hat basa gundê xwe jê re bike.
şervan miriye. Tu kesî
navê wî nedizanî. Û wan
navê gundê ketî kendê
dayê.
Mirov, raweste! Ba, bisekine!
Ma li vir kes nîne min bi bîr bîne?
Şervan im, hestî
bo goştbûna niştiman im.
Min niştiman nîne.
Hûn ku derê bixwazim li wir hestiyên biçînin.

- kend: cihên kûr

Wey berava ji jiyane şîrîntir

Titus Petronius Arbiter 27 - 66, Împeratoriya Romê

Wey berava ji jiyane şîrîntir, ey derya! Ez yê bisiûd
dê tavilê dîsan li derdorî mala xwe bigerim!
Wey zelaliya rojê! li van deveran berê herdem
bi melevaniyan dişepîm ji zeriye avî direvîm!
Li wê dera han e çavê kanîkê, diavêje vir pêlik kevzan,
cihê baweriyek xurt digire hesta bêgotin li vir.
Jiyane jiyame, û felek bi zore jî nikare
ti car bistîne wê ya demê daye jî.

Li gel te pîr dibim
Po Chü-I 772 - 846, Çîn

Ez li gel te pîr dibim
û ji xwe dipirsim, gelo pîrî çawan e.
Çav dizûrin dema êvaran xwe pal didim,
û spêdeyê jî navêm serê xwe şe kim.
Dem hatiye xwe bispêrim gopal dema derdikevim -
jixwe ger roj bi roj li hundir rûnenim.
we radikin û berev esmanan dişihin,
bayê têrxem ji xwe re axînan dikişîne.
Dema tabûta reş carekê bêt girtin,
ta hezar salan spêdeyek nû nayê,
ta hezar salan spêdeyek nû nayê.
Qencyê û hişmendiye bo min feyde nekir.
Û dema yên gihandim vir veşerin malê,
xizm û dost dê hest bi piçên xemê bikin
lê hin yên dî êdî distirin jî.
Ma çi dî li ser mirin û nemanê dikare bêt gotin
ji bilî: bihêle kelexê te li gel girikan bibe yek.
Ax!

Giya
Po Chü-I

Bêtxûb giyayê deştê.
Sal bi sal ew dibeye,
û dîsan dibişkive;
pûşî bişewitînê jî, ew namire:
dema bayê biharê lê dide, ew dîsan şên dibe;
ew bor rêya kevn digire, dimeşe dûratiyan,
bi keskiya xwe ya xurt kavlên bajarên berdayî diniximîne;
ew dîndeyên paşayan dibe goran
mişe, mişt,
tijî hesreta veqetînê.

Stiranokek şevê

Alkman sedsala 7an bz, Yewnanistan

Ketine xewê gupikên çiyayan û geliyên hênik,
gir û kend bi henûnê û hêwirê nixamtî ne.
Kirmikên erda reş di nav axê re nivistî ne,
xezal di xewek giran in, hing hedirê ne,
binperde dike komên masiyan pêl.
Dinivin refên firindeyan
ser li ber stara çengan.

Sê kurtehelbest

Alkaios sedsala 4an bz, Yewnanistan

Zeus dibare, zivistan ji esman, av diqerisin.
Rê nede bayê tund: agir hilke,
têkil ke meyê bi merdî,
serê xwe bide balîfkê nerm.

* * *

Min bihîst bihar têt, guldar e.
Lezê bikin û bilezînin,
meyek wek hingiv şîrîn bînin.

* * *

Demek durist bûyî dildar, Damoanaktîdas:
zewq li bin dara zeytûnê dema deriyên biharê vekirî ne
û bêna ambrosyayê hildifûre.

Baran
Aale Tynni 1913 - 1997, Fînlanda

Baranê avêtine kajê
torên teyisok.
De bêje min, bêje
ka hez dikî.
Qerenfil li ber ba
bi şadî diçemin.
De bêje ku li te
şîrîn im.
Bibîne, hingê dê
di min de sosretiyek çêbibe:
ez ê wa xurt bibim
wek dara xort,
ezê wiha dilxweş bibim
wek qerenfilan
de tenê bêje min, bêje
ku hez dikî.
1946

Anna Axmatova 1889 - 1966, Rûsya

Payizek berê-nedîtî ava kir bircek bilind
û ewran destûr nebû wê bircê tarî bikin.
Û xelk diheyirî: manê êdî destpêka îlonê bû,
ka rojên sar, baran û hewayê nixte?
Ava coyên şêlî wek mircanan dibiriqî
û gezgezînk wek sorgulan bêndar bûn lê tundtir.
Hilmandin qurs bû, wer bêqam.
Ew ta dawiya jiyanê man li bîrê.
Tav mîna serhildêrek bi ser bajar hîlbûyî bû
û payiza biharane wiha miştî zewqek berdest
ku dixuya qey demjimêrkek berfê ya nazik wê kêlîkê bipîşkive gulan
dema bi nermî te berev eywana min gav diavêtin.

- manê: jixwe, nexu, nexwe, nê (tirkî: artik)

Havînê

L. Onerva 1882 - 1972, Fînlenda

Tenê carekê di jiyânê de sorgula agirîn vedibe,
tenê şevêkê geş e û spêdeyê çilmisiye.
Awirên wê germ û gazîker in,
navekên wê gurbûyî wek agir in.
Pelên wê lêvên sorî xwînawî ne,
bêna wan sermestker e wek biharan giyayên deştî.
Jê bike agirgulê û vexwe şerbeta wê,
kêlîkekê bijî, bîskekê zewqê bike, bikeve.
1904

Bo yên xurt

Edith Södergran 1892 - 1923, Fînlenda

Birevin tenêtiyê! Mêr bin!
Bi hindê razî nebin ku hûn bejnbost bin.
Bi hindê razî nebin ku hûn girtiyên didanên diçîrikîn bin.
Razî nebin bi hindê ku hûn bazên bi bendan bestandî bin.
Fêr bibin wek darçaman li nav şeqên teht û helanan şên bibin.
Fêrî fermanbariya qanûnê nenivîsandî yên stêran bibin.
Gêlî qenc û qehremanan, bejn û balên bedew, bibin stûn bo seraya rastiye.
Fêr bibin rabin wek pêlan li ber bahozê.
Destên xwe dirêjî dostan bikin, dê dinya biguhere.
Rojên payizan yên xemê dê bo herherî hinda bibin.
1919

Paşî

Aila Meriluoto 1924 -, Fînlanda

Gihame dawîya rêya xwe,
rêyekê ji hezarên min
- û dinya tijî wan e.
Êvarek hînîk e,
rojek boriye,
li pişt daristanan hinda bûye.
Tu tişt nikare bimire,
ne gul, ne ba,
ne evîn dikare bimire.
Tenê rê bi dawî tên
û gul li pey dimînin
û ba li deverên dî dide.
Û evîn, kêlîk,
tenê ji çavan radiguheze
û meşa borî wê li gel xwe dibe.
Û givaştina destan,
ya duhî rastî bû, îro
mîna xewnan sist bûye.
Tu tişt nemir,
ne tu, ne ez,
ne kêlîka evînê.
Tenê rêyekê meşîm,
ez meşîm û tu.
Bişîrek xemgîn ma.
1946

Êvara dawiyê

P. Mustapää 1899 - 1973, Fînlanda

Em herdu bi tenê li rex dikê dansê rûniştî bûn.

Û tu sîs û spehî bûyîanek bi bişirê barkirî tê."

Ezê ewran biperixînim.

Ezê çavan bi tavê girêdim, dilan bi evînê, siyan bi avê û çeçan bi ba.

Ezê aşopên zarokan bigihînim sîrîna kuliyan.

Ezê firfirokan bi ba re bişînim

û guldankan av dim.

Ezê bêm û danim ber ga û hespan giyayê ter yê hemêzkinê.

Ezê bidim mehîna tî xunava hîzî.

Ezê verevînim mêşan ji dor kerê pîr.

Ezê bêm û tovê qerenfîlan biavêjim kelehan.

Ezê bistirînim helbestekê li ber pencereyê,

kajekê bidim qirrereşkê

û bêjim maran: "Ax çend xweş in beq!"

Ezê mirovan li hev aşt bikim,

ezê wan bikim nasî hev.

Ez ê bi rê bimeşim,

ronahiyê vexwim

û evînê bikim.